peyama Kurd

Rojnameya Gîştî ya Hefteyî | Hejmar 30 / Sal 1 | 01.04.2005

Kurdish weekly newspaper | Kurdische Wochenzeitung



Prova fermana Kurdan!

Artêşa Tirk û payebilindên wê, dixwazin bi gurkirina nijadperestiyê bingeha derxistina fermana Kurdan amade bikin. Ew di daxuyaniyên xwe de heqaretê li Kurdan dikin û ji bo çavtirsandina wan dîroka derbasbûyî tînin bîra wan

Şerafettîn Elçî, A. Zekî Okçuoglu, Umit Firat, Halis Deger u Mehmet Sanri armanca vê bûyerê di Peyama Kurd de şîrove dikin...


Sal 1994

Gelê Kurd îsal li her çar aliyên Kurdistanê Newroz bi coş û tama azadiyê pîroz kir û ji bo vê yekê gelek sedemên girîng hebûn. Ne bi tenê Newroz, lê belê gav bi gav avabûna Kurdistanek serbixwe jî dihat pîroz kirin. Mafên ku Kurdên Başûrê Kurdistanê piştî hilweşîna rejîma Seddam bidestxistin, tehdît û helwestên Amerîka yên li dijî Îran û Sûriyê û neçariya Dewleta Tirk a li hemberî geşbûna stêrka Kurdan jî sedemek kêfxweşiyê bû. Li Amed, Hewlêr, Mehabad û Qamişlo bi hezaran Kurd li kolanan bûn.

Rûpel 2

Ez Kurd im, teref im û dixwazim



Amed - Li Amedê nêzîkî 100 ronakbîr, siyasetmedar û nivîskarên Kurd kampanyayeke îmzekirinê bi navê „Ez Kurd im, teref im û dixwazim“ vekirine. Kampanya îmzekirinê, di çarçoveya endametiya Tirkiyê ya ji bo Yekîtiya Ewrûpayê de, balê dikşîne ser daxwazên Kurdan yên siyasî, çandî û civakî.

Rûpel 4

Gelo A. Aygan dikare hesabê kiryarên JITEMê bide?

Piştî ku mirov hevpeyvînên di rojnameya Özgür Politika û Expressen de bi piyonê JITEMê Aygan re dixwine, careke din îspat dibe ku ev mêrkuj bi dehan û belkî bi sedan welatparêzên Kurd xwe di bin zimanê xwe de vedişêre.

Di derbarê vê mijarê de Peyama Kurd serî li sazî û rêxistinên Kurd da ku mijarê rohnî bikin.

Partiya Demokrat ya Kurdistan- Bakur (PDK-Bakur), Partiya Rizgariya Kurdistan (PRK), Partiya Îslamiya Kurdistan (PÎK), Rêxistina Sosyalista Demokrata Kurdistan (RSDK) û Federasyona Komeleyên Kurdistan li Swêd (FKKS) fikrên xwe gihandin Peyama Kurd û em wan pêşkêşî xwendevanan dikin.

Rûpel 3

Endamên Koma Rewşen:
„Prensîba me ya sereke zimanê Kurdî ye“



P.E.N a Kurd komcivîna xwe li Amedê çêkir Rûpel 14

Dr. Felat Dilgeş
Kitêba Barzanî Rûpel 5

Cemal Batun
Hevwelatiya bi qestî!... Rûpel 7

Serhan Îsa
Hûrekurte xwendinek ji 12 Avdarê re Rûpel 10

Dersimi jî Munzur ser barajan nêwazenî Rûpel 17

Adar, aşmê şehîdanî Kurdistan Rûpel 17

Cankurd
Nivîskarê, ku jiyan avêtiye paş xwe „Hunter S. Thompson“ Rûpel 15

Li dijî KOMKARê êrîşên hov Rûpel 6

KOMKAR

D 1.50 EUR, A 1.70 EUR, B 1.70 EUR, NL 1.70 EUR, CH 2.60 SFR
LUX 1.70 EUR, I 1.70 EUR, S 19.00 SKR, DK 14.00 DKR,
N 16.00 NOK, GB 1.10 £, GR 1.70 EUR

4 196577 401503 30

Dr. Alan Merwanî	Dr. Husên Tahîrî	Ömer Özmen	Selim Çürükkaya
Al çîrok e, armanc teslîmsitendin e Rûpel 4	**PKK/Kongra Gel: Tevliheviyek siyasî û îdeolojîk** Rûpel 8	**Provokasyona Ala hevbeş** Rûpel 6	**Abdulkadîr kam o?** Rûpel 16

www.kurdi.org

Prova fermana Kurdan'

Ne tenê li Kurdistanê, lê belê li metropolên Tirkiyê jî Kurdan bi helwesta xwe peyama xwe gihandin dewletên dagirker. Li bajarê Mêrsînê şahiya pîrozkirinê bû hedefa lîstokên hinek hêzên tarî û di encam de bû sedema bilindkirina pêla nijadperestiya Tirkan. Li gorî nerîna hinek çavdêran, di dema belavkirina xelkê kombûyî de aleke Tirkan ji aliyê 2 zarokan ve hatiye avêtin, li gora hinekan jî al hatiye şewitandin û binpêkirin. Lê belê kerameta mezin di daxuyaniyên piştî bûyerê de ye. Jixwe armanc û daxwaza dewletê di daxuyaniyên rayedaran de eşkere dibe. Piştî bûyerê bi du rojan lê belê berî herkesî Serleşkeriya Giştî ya Tirkiyê daxuyaniya xwe da û Kurd bi qetlîaman tehdît kirin. Serleşkeriya Giştî, Kurd weke "qaşo hemwelatî" binavkirin û ev gotina "dîrokî" kir "yên ku bixwazin hezkirina Hêzên Artêşa Tirk ya ji bo welat û alê biceribînin, bela li rûpelên dîrokê binerin".

Piştî daxuyaniya Serleşkeriya Giştî, temamiya rayedar û nerayedarên dewletê ketin pêşbaziya "xwedîderketina" li alê û dîroka derbasbûyî anîn bîra Kurdan. Hêrsa veşartî teqiya û rastî eşkere bû. Peyama Kurd di derbarê vê bûyerê û gurbûna nijadperestiya Tirkan de serî li nerîna rewşenbîrên Kurd û rayedarê DEHAPê yê Mêrsînê da. Li gora hinekan ev bûyer di bingeha xwe de lîstokek li dijî hikûmetê ye, lê li gora hinekên din jî hedef ne hikûmet e.

Siyasetmedarê Kurd **Şerafettîn Elçî** dibêje ku berê jî Kurdan dizanîbûn ew "xwedêgiravî hemwelatî ne" lê ev gotin cara yekemîn ji devê Serokerkanê Dewletê hat bihîstin û heger dubendî di nava Tirkiyê de çêbibe, berpirsiyarê wê dewlet bixwe ye. Elçî wiha berdewam dike, *"dema ku mirov hemwelatiyê dewletekê be, mirov hurmeta ala wê dewletê digre, lê pêwîste ew al bibe temsîla temamiya gelên wê dewletê. Di vê bûyera dawî de, ala xwe kirin wasîteya êrîşa li hemberî Kurdan. Ev tiştekî pir çewt e, xelet e. Bûyera ku çêbûye provokasyon e. Ev ne meseleya du zaroka ye. Heger mesele du zarok bin, wê demê dadgeh hene, dikarin sucê wan diyar bikin û cezeyê pêwîst bidin wan. Lê mesele ne ew e. Îro pirsa Kurdan bi pêş dikeve û stêra wan li Rojhilata Navîn geş dibe. Ev geşbûna Kurdan, şovenê Tirk aciz dike. Îcar wan kesan bûyera alê ji xwe re kirin mahne ji bo ku dakevin meydanan û bi daxuyaniyên xwe çavê Kurdan bitirsînin. Bi vê helwestê wan zirar û ziyaneke mezin dane xwe. Diyar kirin ku ew al ya beşekî ji wê civakê ye û li hemberî beşê din tê bikar anîn. Serleşkeriya Giştî ya Tirkiyê, bi daxuyaniya xwe "yekîtiya netewî" ya vî welatî bi temamî xerab kir. Berê jî Kurdan dizanîbûn ku ew û hemwelatiyên din ne weke hev in û ew weke "xwedêgiravî hemwelatî" tênê dîtin, lê kesekî ev yek weke Serleşkeriya Giştî vekirî nedigot. Di daxuyaniya Serleşkeriyê de diyar dibe ku hinek hemwelatî "binav " in û hinek jî "eslî" ne. Heger piştî van gotinan dubendî têkeve nava civakê, qebehet û qusûr ne ya Kurda ye, ya rayedar û birêvebirên dewletê bixwe ye".*



Hiqûqnas û rewşenbîrê Kurd **A. Zekî Okçuoglu** bi çavekî cûda li bûyerê dinere û vê qiyameta ku tê rakirin weke hewldanên dûrxistina Kurdan a ji deryayê (behrê) şîrove dike. Li gora Okçuoglu, li metropolên mîna Mêrsîn û Edenê zêdebûna hejmara Kurdan, tirsek mezin dixe dilê Dewleta Tirk. Şîroveya Okçuoglu bi vî awahî ye *"Tirk miletekî nijadperest in û xwe li ser xwînxwariyê ava kirine. Tirkiyê li ser xwînxwariya gelên Anatoliya, Kurdistan, Mezopotamya, Balkan û Erebîstanê hatiye avakirin. Pirsgirêkên wan û neteweyên din hîna çareser nebûne. Vaye pirsgirêka Ermeniyan ji nû ve tê rojevê. Kurd hîna di rewşa xwe ya berê de ne, berî 50 salî rewşa Kurdan çi be, niha jî ew e û kûrtir jî bûye. Di aliyê sosyolojî û çandî de gelek pirsgirêkên giran derketine. Pirsgirêkek din jî ew e ku Kurd pir zêde dibin, bi taybetî li aliyê Anatoliyayê gund û bajarên wan tije Kurd bûne. Bi tenê li Stenbolê bi milyonan Kurd hene, ji sedî 60-70 ji şêniyê Mêrsînê bûne Kurd. Li Edenê, Antalya û Izmîrê jî ev yek wiha ye. Li gelek bajaran hejmara Kurd û Tirkan bûye yek. Tirk bi her metodî dikarin bi Kurdan, lê belê ew nikarin pêşiya zêdebûna wan bigrin. Tiştekî balkêş jî ew e ku Kurd bi saya Kerkûkê û petrola wê dikevin rojeva dinyayê û li Mêrsînê jî xwe digihînin behrê. Dixwazin weke salên 1955an bikin, hinekî zilm û zora xwe li ser Kurdan zêde bikin ji bo ku Kurd ji Mêrsîn û Edenê birevin. PKK bixwe jî di nava vê lîstokê de ye û divê mirov hêviya tiştekî jê neke. Ew rêxistinek JÎTEMê ye. Siyaseta Kurdan niha ew e ku xwe bi Tirkan bidin qebûl kirin. Yên li derveyî PKK jî ne dûrî vê konseptê ne. Aciziya wan ew e ku ew li derveyî konseptê dimînin, lê ew ne dûrî "Komara Demokratîk" in. Di nava Kurdan de ne bi tenê yek Apo heye, sê çar Apo hene û derdora Kurdan girtine. Yekîtiya Ewrûpa jî dixwaze radeya pirsa Kurdan daxîne radeya pirsa Ermenî û Romên li Tirkiyê. Hejmara Ermen û Romên li Tirkiyê kêm e û pirsgirêka wan û Kurdan jî ne weke hev e. Lê Ewrûpa li hemberî van bûyerên dawî bêdeng maye. Tiştê ku niha li Tirkiyê dibe, berê ji aliyê Hîtler ve li dijî Yahûdiyan hat kirin û piştre jî ew hatin qetil kirin. Tirkiyê dixwaze wî tiştî li hemberî Kurdan bike. Lê Tirk zû dikevin dahfikan jî. Dibe ku ev gav ji bo Tirkiyê bibe dahfikek. Rojavayiyan nijada Tirk li hemberî Rûsya çêkirin, ew nîjadek çêkiriye û ne xwedî bingeh e. Ala Tirkan jî ala xwînxwariyê ye, ala nîjadperestiyê ye. Îro jî hinek Kurd radibin dibêjin al nirxekî me yê hevbeş e. Tu caran sembolek nijadperestiya Tirkan nabe nirxekî hevbeş. Di navbera me û Tirkan de tiştekî hevbeş tune ye. Em ji mecbûrî bi hev re dijîn. Xwezî bi wê roja ku em ji destê van xwînxwaran xelas bibin".*

Li gora Serokê DEHAPê yê bajarê Mêrsînê **Halîs Deger,** hinek derdor ji xebatên aştî û biratiya gelan ne razî ne û bi bûyerên wiha çêkirî dixwazin careke din tovên dijminatiyê di nava gelan de biçînin. Deger nerînên xwe ji rojnameya me re bi vî awahî diyar kirin *"weke tê zanîn di dema dawî de tekoşîna azadiya Kurdan gavên pir mezin avêtin. Bi taybetî Newroza îsal li her deverê ji aliyê girseyeke mezin ve hat pîroz kirin. Kombûna girseya gel, tirsa dilê hinekan zêde kir. Li Tirkiyê hinek derdorên nijadperest jî hene ku dixwazin herdu gelan berdin hev û tovên dijminatiyê di nava wan de biçînin. Ev derdor di hilbijartinên dawî de bi ser neketin. Niha dixwazin carek din xwe têxin rojevê û sîstem jî piştgiriya wan dike. Dixwazin carek din Tirkiyê têxin nava aloziyek civakî. Her wiha Amerîka û Yekîtiya Ewrûpa jî ji hikûmeta heyî ne razî ne û dixwazin wê bidin aliyekî. Dema ku mirov van sedeman tevan tînê cem hev, bûyera alê baştir tê fêm kirin. Raya giştî ya Mêrsînê li dijî van bûyeran hişyar e û heta niha tu pirsgirêk derneketine. Kesekî nexwestiye beşdarî van çalakiyên provakatîf bibe. Lê belê bi giştî li Tirkiyê ev yek tê kirin û jixwe armanca wan jî ew e. Êrne armanca me bi tenê aştî û biratî ye, emê li ser vê daxwaza xwe jî bi îsrar bin. Heta niha li vir 6 zarok hatine girtin. Temenê wan dî navbera 12 û 18 salan de ye. Baroyê 2 parêzer ji bo parastina wan wezîfedar kirine. Li gora îfadeyên wan, mirovekî bi taxim û krawat ku temenê wî di navbera 25-26 salî de bûye, al dane destê wan û ji wan xwestiye ku bişewitînin. Em niha weke partî dîtin û girtina wî mirovî dixwazin. Zarok jî li şûna ku li dadgehên zarokan werin dadkirin, ew birine pêşberî dadgerekî û di dema binçavkirinê de jî li şûna ku wan di nava zarokan de bigrin ew birine beşê Tekoşîna Li Dijî Terorê. Komeleya Mafên Mirovan vê bûyerê ji nêzîk ve dişopîne".*

Edîtorê Kovara Serbestî Mehmet Sanri di derbarê bûyera alê de wiha axifî "diyar e ku ev ne reaksiyona miletekî ji xwe bawer e. Manipulasyonek mezin li piştvê kampanyayê heye. Serokerkanê vî welatî bixwe jî ne xwediyê aqilekî selîm û stratejiyek selîm e. Ev bê bawerî him di siyaseta Tirkiyê de heye û him jî li gel miletê Tirk heye. Ev argûmentên ku tênebikar anîn, êdî kevin bûn e. Neteweperestî û nijadperestî di siyaseta Tirkiyê de her demê hatine bikaranîn. Lê belê êdî li dinyayê bi argûmentên modern siyaset tê kirin. Tu bingehek medenî ji bo vê terora alê tune ye. Di aliyê siyasî de, dibe ku ew dixwazin hêza xwe nîşanî xelkê bidin, lê belê her tişt li ber çava ye.

Li gora rewşenbîrê Kurd **Umit Firat,** pêwîstiya dewletê bi rabûna ser piya û vejandina hestên nîjadperestiyê hebû û ev bûyer bi zanebûn hatiye pîlan kirin. Firat, ji Peyama Kurd re bûyer wiha şîrove kir, *"Hûn dizanin di navbera hikûmeta fermî û ya ne fermî de nexweşî hene. Ew dixwazin hikûmeta fermî hilweşînin û pêwîstiya wan bi bûyerek wiha hebû. Kesên ku siyaseta Tirkiyê ji nêzîk ve dişopînin dizanin ku di her dema guhertinekê de, tevlîheviyek tê derxistin. Ji 17ê kanûnê û vir ve, pêvajoyek nû destpêbûye û hinek tişt hîna di nava xumamê de ne. Di nava vê xumamê de leşkeran xwest hêza xwe ji bo hinek kesên di hikûmetê de bidin nîşandan û biser jî ketin. Ev ne encama çalakiyek ku ji xweber çêbûye. Ev çalakî bi pîlan hatiye durust kirin. Ev ne çalakiya du zaroka ye, ev ji berê de hatiye amade kirin. Êdî Kurdîtiya Kurdan qebûl dikin û wan weke dijmin îlan dikin. Berî deh salan ev yek nedipejirandin. Hebûna Kurdan qebûl nedikirin. Berî deh salan wan Apo weke "dola Ermeniyan" bi nav dikir û li gora wan ew ji aliyê hinek hêzên derve ve li hemberî wan dihat derxistin, lê ew niha Apo weke Kurd qebûl dikin. Ew temamê Kurdan Kurd qebûl dikin û li gora xwe hinek tedbîran werdigrin".*

Impressum

Xwedîyê Rojnamêyê
Peyama Kurd Verlag
Peyama Kurd
Thomas-Mann-Str. 22, 53111 Bonn / Germany
Fon: +49 (0228) 18 00 654
+49 (0228) 18 00 655
Faks: +49 (0228) 18 00 656
www.peyama-kurd.com
info@peyama-kurd.com

Berpirsyar:
Kurmancîya Jorîn:
Fadil Özçelik (Editorê Berpirs),
Sîwan Heci Berko (Diaspora)
Pirsgirêk (Berhevdan-Hacaftin)
Kurdî (Zazakî):
Seydxan Kurd (Editor)
Kurmancîya Jorîn,
Dana Ali, Venus Faiq, Sîwan Aziz, Nezar Car, Cotyar Darîroş, Mansur Sîdqî, Mustafa Chiaktay

Peyama Kurd ji nafê xwe dibêje, ku bivsên jê re tê şandin, kurt bike. Ew ji aliyê nêzîman û rastnivîsê ve di serastkirina berheman de azad e. Peyama Kurd berhema ku jê re tê şandin û berê li cîyekî din natibe belavkirin, namêşîne.

Gelo A. Aygan dikare hesabê kiryarên JITEMê bide?

PDK-Bakur

Helwesta Federasyona Komelên Kurdistanê li Swêdê di ciyê xwe de ye û karekî piroz e.

Wek her kesekî gunehbar divê Abdulkadir Aygan jî bê darizandin. Lê li gor me ev têr nake. Ji aliyekî divê em karibin wî di dadgehên navnetewî de darizînin û ji bo berpirsiyarî û gunehbariyên xwe yên şexsî ceza xwe bigre. Ji aliyê din, divê em jibîrnekin ku di van kuştin û qetilkirina Kurdan de Aygan ne bi serê xwe ye. Ew û bi sedan îtîrafçiyên wek wî ji terefê dewleta Tirk ve wek maşe hatin bikaranîn. Ji ber vê rastiyê. divê di pêvajoya dadgehkirina wî de em karibin bi şêweyekî bandorê li prosesê bikin ku Aygan rastî û belgeyên heyî derxîne holê û bi vê rê rola esasî ya dewleta Tirk ronî bibe û rayedarên dewleta Tirk jî di qada siyasî ya navnetewî de bên teşhîrkirin û di dadgehekê de jî bên darizandin. Li gor me, divê sazî û rêxistinên Kurdistanî bi riya Aygan, yanî bi derfeta vê bûyerê dozê bikin û rê li darizandin û dadgehkirina rayedarên dewleta Tirk vekin. Ji vê fersendê îstîfade bikin daku mêrkujiya dewleta Tirk ya plankirî li dijî rewşenbîr û siyasetvanên Kurd aşkere bibe. Divê gunehkarên eslî derkevin holê û incex wî çaxî rastî û mêrkujên pişt perdê karin bên eşkerekirin ku li gor raya me ew jî dewleta Tirk û berpirsiyarên wê demê ne. Pêwist e rêxistinên Kurdî li ser vî esasî raya xwe bikin yek. Bi vê destpêkê emê bikarin rê li ber ronîkirina gellek bûyerên din jî vekin û di qada navnetewî de mêrkujî û sûcdariya dewleta Tirk rûreş û şermezar bikin.

Rola ku Federasyon dixwaze bilîze roleke girîng e. Pêwist e komele û dezgehên me yên sivîl û demokratîk li welat û derveyê welat ji bo van pirsan însiyatîf bigrin û van karan li benda partî û rêxistinên siyasî nehêlin. Partiyê Kurd jî divê alîkarê van çalakiyên pîroz bin.

PRK/rizgarî Temsîla Ewropa

Divê, daxwaza dadkirina Abdulqadir Aygan'ê, ku berê di nav JÎTEM'ê de kar kirîye û herwiha tilîya wî di nav gelek "faîlên meçhûl" de heye, bi hemû alî û faktorên xwe were nirxandin.

Sereta, di nav JÎTEM'ê de cîh girtina Aygan û zanyarîyên wî yên li ser cînayetan divê, bi cidî bê girtin û pêwîste bi bal bê nirxandin. Ev bûyer, ji alîyê Komara Tirkîyeyê ve li dij gelê Kurd hatîye organîze kirin. Eva, sûcên "li dij mirovahî yê"/"sûcê şer" yên rêxistinekê cînayetê ya siyasî ye. Ji bo wê jî nabe ku mirov qet ji ber çav dûr bihêle.

Ev rêxistina "nehênî" JÎTEM, li Kurdistan berpirsê gelek cînayetên "faîlê mechûl"e. Wek rêxistinên din yên nehênî yên şer, yên K.T gîhana delîl, belge û zanyarîyên wî, şikil, bi çi awayî û çi kar dike, bi kuve girêdayîye û berpirsên JÎTEM'ê kîye/kîne zehmete. Giştê van zanyarîyana di bin parêzgerîya K.T de ye. Yek ji wan rêyên, ku mirov bikare bigihê zanyarî û delîlên kiryarên JÎTEM'ê, beyanên hinek kesên ku heta demekê têde kar kirine ne. Beyanatên A. Aygan yên li ser kiryarên JÎTEM'ê, di nav K.T'ê de bi çi awayî hatîye damezirandin û berpirsên wî yên sîyasî, kiryarên wî yên ku tên zanîn û nayên zanîn, bi belgeyan îsbata van gelek giringe. Ji bo, ku K.T. û rêxistina wê JÎTEM û kiryarên wê, ji her alîyên xwe ve bê eşkere kirin, -ku maxdûr û armanca wê jî em Kurdistanîne- xisûsîyeta, ku divê em li ser bisekinin, eve; em wisa nekin, ku Aygan û (kesên mina wî) yên, ku dev ji daxwaza axiftin û şahidîya berdin. Li vir ya giring ewe, ku K.T'ê û, JÎTEM, bi her alîyên xwe ve bêne eşkere kirin. Ji bo vê jî, di eşkerekirina JÎTEM'ê û têkilîyên wê de, şahidîya A. Aygan gelek giringe, ji bo wê jî, divê Federasyona Komelayên Kurdistan ya li Siwêd di qada dewleta Siwêd de daxwaza paraztina Aygan bike. Ya duhem jî, îfade, belge û zanyarîyên Aygan ya li ser JÎTEM'ê, dê ji alîyê dadgeha Siwêd ve bi çi awayî bê tesbît kirin û parastin? gelek muhîme. Ya sêhem jî, divê em wisa bikin, ku dadên navnetewî, Y.M, Y.E û dezgehên resmî û sivîl yên mafê mirovan jî bigihên Aygan, zanyarî û belgeyan. Ya dawî, bi dadkirina Aygan re, di navbeyana cûre û pîvanên cezayê şahidî, zanyarî û belgeyên ku ew dide de, di dîyarkirina faîl û berpirsan û cezakirina wan de divê, orantî bête dîtin..

Çareserîya pirsa A. Aygan û yên ku di nav sîstema qoricîyan de, yan jî di nav PKK de cîh girtibûn û li dij Kurdistanîyan tevlê karên "nemirovane û sûcên şer" bibûn, wek heve. Pirsa A. Aygan jî divê wisa bête şîrove kirin. Bi van hemîyan re, ceza ku bersiva sûc e, divê em cezayê wek pergalekî heyf/dêl nefikirin. Divê, anagora şekil û taybetîyên cezayê, rewşa faîlan, ya di dema sûc û piştî wê de, bi çi awayî û dewra wî çi bûye? bê pîvandin û her taybetîyek bi sîstemek adilane bê nirxandin.

FKKS (Federasyona Komelên Kurdistanê li Swêdê)

Em wek Federasyona Komeleyên Kurdîstanê di civîna komîteya gistî ya me de, biryar girt ku dest bi xebatê bikin û ji bo mahkemekirina AYGAN xebatekê, processekê bidin destpê kirin. Lêkolînêkê bikin, da ku em dikarin çi bikin.

Me digel polîsê ku di maseya sûcdarên şer de vazîfedar e, têkilî danîn. Li gor agahdarîya wî, daîreya mihaciran dê daxwazekê weha bike. Ger em jî bixwazin tistekî weha bikin, divê muracatî hikûmeta Swêd bikin, divê biryar ji vê derê derkeve.Herweha divê di vê muracaata xwe de em cîh bidin, -îfadeya sahîdên ku, bixwe îşkence ditîne yan jî merivên wan hatiye îşkence kirin û kuştin.

Me hewl da ku agahdarî berhev bikin. Hefteya pêşiya me digel van agahdarîyan bi nameyekê, ji hikûmeta Swêdê daxwaz bikin ku Aygan li Swêdê û li dadgeha Ewrûpayê bête mahkemekirin

PÎK (Partiya Îslamiya Kurdistan)

Birayên Hêja,

Nameya we gihîst destê me, mixabin ji ber hinek sedeman bersiv derengî ket. ji ber dereng mayinê em lêborînê dixwazin.

Berî her tiştî em Federasyona Komeleyên Kurdistanê li Swêd pîroz dikin ji ber ku xebatek awa giring daye ser milên xwe û pêşengî ji Kurdên Ewrûpayê re dike. Raste, Qatîlên ku xwîna Kurdan rijandibin, divê bê ceza nemînin. Di vê xebatê de divê Partî û Rêxistinên Kurdistanî helwesta xwe rawa bidin û ji bo tiştên netewî xwe bikin yek û sazîyek netewî ji bo parastina mafên Gelê Kurd li Ewrûpa ava bikin, da ku ev sazî karibe di pêşerojê de di dadgeha Yekîtîya Ewrûpa de li dijî dewletên dagirker û kolonyalîstên ku Kurdistan di nav xwede par vekirine mafên Kurda biparêze.

Ji bo vê yekê Qatîlên wek Abdulkadir Aygan ê ku bên dadgehkirin pirin. Ji ber vê yekê jî ava kirina sazîyek taybetî pêwiste, da ku karibe malbatên Kurd ên ku ji hêla dagirkeran ve zilm û zordestî dîtine, mafên wan biparêze, di dadgehên YE'de nûnertîya malbatan bike û rê nişanî wan bike. Civata Kurdên li Ewrûpa ji bo vê sedemê divê li hemi deveran pêwiste li dijî wan helwesta xwe rava bide.

Em Partîya Islamîya Kurdistan ji bo dadgehkirina Qatîlên Kurdan, Abdulkadir Aygan û ên wekî wî di her mercî de pistgirîya Federasyona Komeleyên Kurdistanê li Swêdê dikin û em bi wan re ne. Ji bo vê xebatê tiştên dikevin ser milên me çibin em amade ne

Bi Slavên Germ û Biratî

Hikmet Serbilind

Komela Dijberên Sûcên Şer Li Kurdistanê

Darizandina A.Aygan bi her hêlê ve gelek girîng e

Daxwaza darizandina Abdulkadîr Aygan, li Swêdê di cî da ye. Û ez gelek girîng jî dibînim. Lewra darizandina wî, bi hêlekê ve cezakirina wî ye, di hêla din da eşkerekirina qetlîamên ku bi destê tevgerên paramîlîter yên di nav dewleta Tirk da ne, ye. Dokuman û agadarîyên ku A. Aygan dê di darizandina xwe da bide, ne tenê ji bona darizandina wî, paşê jî ji bona darizandina sûcdarên Tirk gelek pêwîst in. Nîzik an jî di demek dûr da, her çi çax dibe bila, rojekê sûcdarên ku li Kurdistanê Sûcên Li Dijî Mirovahîyê kirine, ango qatîlên ku Kurdên bêsûc û bêguneh kuştine dê bêne darizandin, bes divê gelê Kurd şopandina vê dozê bernede. Her wisa, darizandina A. Aygan û agadarîyên ku îro dê di darizandina xwe da bide, wê demê dê baş bêne famkirin.

Em wekî Komela Dijberên Sûcên Şer Li Kurdistanê piştgirîya daxwaza darizandina A. Aygan dikin. Eger vatinîyek hebe bi kêvxweşî emê bînin cî. Ji bona me, helbet cezakirina sûcdaran gelek girîng e, him divê hemberî li tawana wana hebe, him jî ji bona ujdanê rayagiştî divê sûcdar bêne darizandin û cezakirin. Di vê meseleyê da darizandina ji kesên tetikvan zêdetir, divê yên ku emir û direktîf dane bêne darizandin. Ew jî wekî ku rayagiştî ji nîzik ve dizane, birêvebirên dewletê ne, him di di nav kadiroyên sîwîl û him jî di nav yên eskerî da berpirsîyarên qetlîamên li Kurdistanê hene. Hêlek girîng ya darizandina A. Aygan jî eşkerekirina navên vana û sîstema ku vana bikaranîye.

Mahmut Kilinç

RSDK Rêxistina Sosyalîsta Demokratîka Kurdistan

Di warê têkoşîna dadkariya navnetweyî de li hember Abdulkadir Aygan doz vekirin û wî dadgeh kirin wê ji bona Kurdan gavek girîng be. Gerek heta niha Kurdan rêyên weha zûtir bixebitandana. Lê, mixabin ya Kurdan di vî warî de hêz bi xwe re nedîtin. Yan jî di vî warî de heta niha gavek serketî nehat havêtin. Dixwaze karbidestên dewletê bin yan jî Kurdên xayin û noker bin; ew kesên ku li hember neteweya Kurd şer kiribe û kuştin kiribe gereke wek "gunehkarên Şer" bên dadgeh kirin. Kurd îro vê hêzê û destketinê bixwe re nabînin. Lê ev nayê wateya ku wê di pêşde jî gavên weha neyên havêtin.

Em wek rêxistin, ji alîyê kîjan rêxistina sîyasî ve , yan avayîya demokratîk ve, yan jî komele yan însîyatîfî ve gavên weha bên havêtin, yan jî pêşkêşî jê re bê kirin piştgirî lê dikin û çi ji destên me bê em li gor hêza xwe alîkarîya wan dikin. Ev dozek neteweyî ye, lê doza merivatîyê ye jî. Ger di şer de wek alîyek, gava Kurd jî li dijê pîvanên navneteweyê yên şer û rêyên nemerivane bikar bînin; li gor bawerîya me gerek ew jî bên dadgeh kirin. Di şer de ne tenê kiryarên nemerivane yên dijmin, lê kiryarên nemerivane yên me jî gerek bên dadgeh kirin û gunehkar kirin. Her kesê ku gunehên weha bike gerek bê dadgeh kirin. Ew sîyaseta ku " gule hedefê nasnake" demek ji alîyê PKK ê ve dixwest bê meşrû kirin bi çi buhayî li civata me mal bû, gund şewitandin, kuştinên zarûk, jin û kalûpîran çend rûxandin di civata me de çêkir em îro asantir dikarin bibînin. Ji bona serxwebûnê, , maf, dad û dadkarî şer kirin, têkoşînek bi rûmet û pîroz e; lê di rêya têkoşînek weha pîroz de, bê rê merivan kuştin, li gor xwesteka xwe tevgerîyan, mafê bingehîn ku mafê jîyanê ye maf û dadîya kesan binnig kirin ve, ev têkoşîn nayê dayin. Dadek têkoşîna rizgarkirina neteweyî jî heye û gerek hebe jî.

Ger Federasyona Kurd yan jî avayîyek din ya Kurd bixwaze bibe şopgerê vê dozê, tê wateya ku gavek baş davêje. Gerek ew bên pîroz kirin û piştgêrîya wan bê kirin. Kî kiryarek weha bi rûmet pêşî bavêje wê piştgêrî ji Kurdan bigire û di warê navneteweyî de wê rûmetek bilind bigire. Emê wek rêxistin tim piştgirê têkoşînên weha bin.

www.arsiv.org

Al çîrok e, armanc teslîmsitendin e

Dr. Alan Merwanî

Ma li dinê tu miletekî bê al heye? Na! Hûn miletan deynin aliyekî, îro alên rêxistinên netewî û navnetewî, alên şirketan hene. Di serî de al, her milet xwedan hin nîşan û sembolên cihê ne. Ji bo her miletî hin nîşan û sembolên pîroz hene. Herkes dixwaze li van nîşan û sembolên xwe yên pîroz xwedî derkeve û ji wan re siyanet were girtin. Ala her miletî ji bo wî pîroz, ji bo wî bi qedir, bi rûmet û bi siyanet e. Çimkî al, di dinya me ya pirrgelî de, nîşana herî bingehîn a miletan e. Her milet bi alakê xwe sembolîze dike.

Helbet miletê Kurd jî xwedan alakê, xwedan hin sembol û nîşanan e. Kurdên ku îro di dora çil- pêncî milyonî de ne û li ser axa bav û kalên xwe dijîn, ne bê al û bê nîşan in. Her çiqas di qada navnetewî de, dewleteke Kurdan a naskirî tunebe jî, herkes dizane ku alake Kurdistanê jî heye û şikir îro ev al, li ser axa perçekî welatê me bi serbilindî berbiba dibe. Ya ku xewa hinekan diherimîne û acisiyeke mezin dide wan ev e.

Di Newroza 2005an de, bi provaksiyonekê ji alî du zarûkan ve avêtina erdê ya ala Tirkan û piştre rakirina qiyametê, perçek ji stratejiya dewleta Tirk a teslîmsitendina miletê Kurd e. Dewlet, bi leyistikên weha, hêdî hêdî bernama xwe ya Tirkkirina Kurdan dibe serî û di vê yekê de bi ser jî dikeve. Çimkî projekeye dewleta Tirk a bingehîn heye, ew jî Tirkkirina Kurdan e. Li gor vê projê, di serî de al û ziman, wê Kurd ji hemû heyin û nîrxên xwe yên netewî werin dûrkirin û di şûna wan de bi yên Tirk bên barkirin. Niha zimanê me, ku hîmê herî pîroz ê hebûna me ye û ruhê netewî dikare tenê bi wî bê parastin, ji me hatiye stendin û bi Tirkî hatiye guhertin. Em hevdu nexapînin, îro ji bo Bakur, xetera herî mezin a li pês miletê Kurd, gav bi gav hundabûna zimanê Kurdî ye. Em nikarin zimanê xwe derbasî zarûkên xwe bikin. Miletekî ku nikare zimanê xwe ji zarûkên xwe re mîras bihêle, an ew mirî ye, an jî li ber mirinê ye. Li dinê, riya herî bingehîn a zimanê xwe ji zarûkên xwe re hiştinê, bi zimanê dê perwerdehî ye. Xên ji Başûr, li hemû perçên Kurdistanê yên din, em ji vê yekê bêpar in.

Dewleta Tirk, di siyaseta ji navê rakirin û dorpêçana Kurdî de bi ser ketiye. Niha jî dixawaze, gav bi gav hemû nîşan û sembolên xwe bi Kurdan bide qebûlkirin û Kurdan ji nîşan û sembolên wan ên miletî û welatî dûr bixe, his û mêjiyê wan bişo. Piştî ziman dor li ser ala Tirkî ye. Kîngê ku zimanê me bû zimanê Tirkî û ala me jî bû ala Tirk, hingê em Tirk in û axa me, welatê me jî ji xwe ji Tirkan re ye.

Li Mersînê bi ala Tirk leyistina du zarûkan tenê çîrok e, armanc ruhê Kurdan teslîmsitendin û Tirkkirina Kurdan e. Ji bo zarûkekî donzdeh salî bi vî awayî rabûna ser lingan û li çaraliyên Kurdistanê û Tirkiyê meşîn û xwepêşandanên nîjadperestî li dar xistin, ala Kurdistanê şewitandin û ala Tirkan di nav çavê Kurdan re kirin, perçek ji stratejiya teslîmsitendina ruhê Kurdbûnê ye.

Di van salên dawî de, teslîmbûn û ruhê xwe firotina hin Kurdên îtirafkar, wêrekiya dewleta Tirk zêdetir kiriye. Sosreta giran ew e ku dewlet vê siyaseta xwe ya qirêjî bi destê van Kurdên xesandî dibe serî û bi saya wan dixwaze ku ala Tirkan bi zorê bi Kurdan bide qebûlkirin. Çimkî Kurdê bê al, Kurdê mirî ye. Kurdê ku dev ji hemû nîrx, nîşan û sembolên Kurdbûnê yên pîroz berdaye û bêbavî qebûl kiriye, tu tiştekî wî bi Kurdbûnê re nîne. Kurdê bê al, Kurdê bêbav e; di deftera Kurdbûnê de, ji bêbaviyê pîstir, qirêjtir û xerabtir tiştek tune. Zilamê bêbav, bêbext e jî.

Eger Kurd hebin, ala wan jî heye û ala Tirkan nabe ala Kurdan. Çawa ku navê wê li ser e, „ala Tirk“, ala Tirkan e; tenê ya Tirkan, wekî ku dibêjin „Tirkiye ya Tirkan e.“ Cihêtiyek me û wan jî ev e: Em dibêjin „ala Kurdistanê“ û wê wek ala hemû Kurdistaniyan dibînin. Belê Tirk dibêjin „ala Tirk“ û gotina „ala Tirkiyê“ jî qebûl nakin. Bi ser de, eger Tirk miletek zordar û nexweş nebûna, wê nexwestina ku bi zorê ala xwe bi Kurdan bidin qebûlkirin.

Li hemeber vê pêla neyartî û nîjadperestiyê li ala xwe xwedî derketin; li hebûna xwe, li welatê xwe, li namûsa xwe xwedî derketin e. Hêvî û daxwaza min ji Kurdên Basûr ev e ku ew li seranserê axa azad û pîroz, ala kesk û sor û zer daleqînin. Qet nebe bi vî awayî dilê me hênik bikin, kêfa me bînin...

Bibe aboneya/ê Peyama Kurd

Nav / Paşnav: .....

Navnîşan: .....

USA, Kanada û Austuralya
6 mehan: 70, € - Salekê: 120, €

Welatên Yekîtiya Ewropa
6 mehan: 60,00 €
Salekê: 90,00 €

Almanya:
6 mehan: 50,00 €
Salekê: 70,00 €

Commerzbank Bonn
V. Efe/Peyama Kurd
Konto: 1007947
BLZ: 38040007

Konto:
V. Efe/Peyama Kurd
IBAN: DE38 3804 0007 0100 7947 00
BIC: COBADEFFXXX

Ji bo welatên din têkiliyê bi rojnameyê re deynin.
Peyama Kurd, Thomas-Mann-Str. 22, 53111 Bonn, Germany
Tel.: +49 (228) 18 00 654 - 18 00 655, Faks: +49 (228) 18 00 656
www.peyama-kurd.com, eMail: info@peyama-kurd.com

Şêx Mihemmed Xalid Barzanî çû ser heqiya xwe!



Di 24.03.2005an de serokê mezin ê eşîra Barzan, welatperwerê Kurd Şêx Mihemmed Xalid Barzanî, birayê Mella Mistefa Barzanî çû ser heqiya xwe

Di 24.03.2005an de serokê mezin ê eşîra Barzan, welatperwerê Kurd Şêx Mihemmed Xalid Barzanî, birayê Mella Mistefa Barzanî çû ser heqiya xwe.

Di bin Serokatiya Mesûd Barzanî de heyetek mezin a ji berpirsên PDK (Partîya Demokrat a Kurdistanê), endamên hikûmeta herêmî ya Hewlêrê, serokeşîretên cuda, kesên navdar û berpirsiyarên Kurd li gundê Barzan beşdarî merasîma definkirina Şêx Mihemmed Xalid Barzanî bûn.

Bila serê malbat, eşîr û serê gelê Kurd sax be!

Li Iraqê Kurd tu xetên sor nas nakin



Cîgirê Serokwezîrê Iraqê Dr. Berhem Salih di daxuyaniyek xwe ya taybet de eşkere kir ku "heger Şiî xeta sor ji bo me deynin, em vedigerin parlamentoya xwe û çareyekê ji xwe re dikin"

Cîgirê Serokwezîrê Iraqê Dr. Berhem Salih di daxuyaniyek xwe ya taybet de eşkere kir ku "heger Şiî xeta sor ji bo me deynin, em vedigerin parlamentoya xwe û çareyekê ji xwe re dikin"

Dr. Salih ragihand ku di giftugoyên ji bo damezirandina hikûmetê di navbera Lîsteya Kurdistanê û Îttifaqa Şiîyan de pêşketinek berbiçav heye, lê diyar kir ku ger Wezareta Petrolê ji bo Şiîyan xeta sor be ew bi tundî red dikin. Salih bi berdewamî got: "Heger Şiî ji bo me xeta sor deynin, em vedigerin parlamentoya xwe û çareyekê ji xwe re dikin."

Di 27ê mehê de li Havîngeha Selehedin Salih di bersîva xwe ya ji bo Wezareta Petrolê bi berdewamî got: " Yekemîn, ev e ku em vê gotinê bi tu cureyî napejirînin, duyemîn tişt heger em li ser Iraqê biaxifin divê Iraq a hemûyan be, heger ji bo Wezîrê Petrolê alternatîfeke me ya baş hebe divê bibe wezîr. Nabe hîç rêgirek li pêşiya wê hebe ku Kurd li Iraqê bê rewa bin."

Ez Kurd im, teref im û dixwazim

Amadekarên vê kampanyayê, hêvî dikin ku milyonel îmze kom bikin. Li ser navê grûba birêvebir Umit Tektaş armanca vê çalakiyê ji Peyama Kurd re diyar kir. Li gora Tektaş, Dewleta Tirk di pêvajoya danûstendinên bi Yekîtiya Ewrûpayê re gavên pir girîng avêtine, lê ew gav ji bo misogerkirina maf û daxwazên Kurdan ne bes in. Umît Tektaş dibêje „ji bo mafên netewî, birêvebiriyeke serbixwe û bikaranîna zimanê Kurdî divê hikûmeta Tirkiyê guhertinên bingehîn têxe rojeva xwe. Lê xuyaye ku desthilatiya Tirk naxwaze di van waran de gavan bavêje. Helbet maf, bi tekoşîn û berxwedanê tênebidestxistin. Em jî dixwazin dengê xwe bilind bikin û xwedî li nasnama xwe derkevin“. Umît Tektaş diyar dike ku ew ê di dawiya kampanyayê de daxwazên xwe bi rengekî bigihînin Parlamentoya Yekîtiya Ewrûpa, Komîsyona YE, Parlamentoya Enqerê û dezgehên pêwendîdar. Di nava daxwazên wan de, misogerkirina wekheviya Kurd û Tirkan jî cî digre. Umît Tektaş dibêje „divê wekheviya Kurd û Tirkan di Zagona Bingehîn de were misogerkirin. Pêwîste zimanê Kurdî li herêmên Kurdan bibe zimanê fermî û li herêmên din jî bibe diwemîn zimanê fermî. Lazime partî, komele û odeyên pisporiyê bi navên Kurdî bên damezirandin û di xebat û çalakiyên xwe de bikaribin zimanê Kurdî bikar bînin. Divê navên çiya, gund, gom, berî, banî û wd. Neyên guhertin, yên hatine guhertin jî careke din werin serrastkirin“. Li gora Tektaş, pêkanîna krîterên Kopenhagê têra çareserkirina pirsa Kurdan nakin û her wiha bidestxistina mafên kesane jî beşek ji pirsgirêkê ne, lê ne hemû ye. Di dawiya daxuyaniya xwe de Tektaş doza alîkarî û piştgiriya Kurdên li Ewrûpa dike û dixwaze ku her Kurdek ji bo kampanyayeke wiha, nerînên xwe yên kesane bide aliyekî û piştgiriya daxwazên raya giştî bike.

www.kurdi.org

Kitêba Barzanî



Dr. Felat Dilgeş

Kitêba Mesûd Barzanî ya bi navê „Barzanî û Tevgera Azadiya Netewî ya Kurd," bi zimanê Tirkî ji alî weşanê Dozê ve, wek du derpêç (cîld) derket. Cîldî pêsî cara yekem di sala 2003an de, ango di salvegera Sedemîn a hatina dinê ya Serokê Netewî yê Gelê Kurd Mustefa Barzanî de hat çapkirin. Belê îsal weşanxanê, bi cîldê duduyan re, cîldê pêşî jî cardin çap kir. Bi çapa duwemîn re hin şaşiyên wergerandinê jî hatine rastkirin.

Mesûd Barzanî bi Şerê Cîhanê yê Pêşî û Peymana Sevrê dest bi xebata xwe dike. Piştî ku bi beregehe fireh dîmenekî Kurdistanê yê wê demê û rewşa siyasî ya gelê Kurd radixe ber çavan, dest davêje tevgera Barzaniyan a pêşî û destpêka rûdana vê tevgerê. Tevgera Barzaniyan a azadiyê, cara yekem di pêşkisiya Şêx Evdilselam Barzanî de, di sala 1907an de li hember dewleta Osmanî dest pê dike. Tevgera Şêx Evilselam, ji alî Osaniyan vê tê şikandin û Şêx vedikişe Teyarê, ba Mor Sîmûnê Asûrî. Bi vekişîna Şêx re Tirk dikevin gundan, piştî talanê, jin û zarûkan dîl digirin. Hingê Mustefa Barzanî jî, di gel ku hê sê salî ye, bi diya xwe re dikeve zîndana Mûsûlê. Şêx Evdilselam di sala 1908an de vedigere Barzanê, tafilê hêzên xwe dide hev, êrîşî Tirkan dike û Ordiya Osmaniyan tarûmar dike. Hingê Osmanî daxwaza hevdîtinê û lihevhatinê dikin. Bi vî awayî peymanek lihevhatinê tê destnîsankirin. Di sala 1913an de Tirk ordiya xwe didin hev û bi hêzeke hê mezin êrîş dikin ser Şêx Evdilselam. Şêx derbasî Kurdisatana Îranê dibe, dewleta Osmanî ji bo girtin an kustina Şêx perrûyek mezin datîne. Şêx, ji bo ku piştgiriya Rûsan bistîne, bi Smayîl Axayê Şikakî re li Tîflîsê bi Rûsan re hevdîtinekê çêdike. Di vegerê de, li gundê Gengeçîn, bi bêbextiya Sofî Evdila, Şêx û sê peyayên xwe tên girtin. Di roja 14.12.1914an de, Şêx Evdilselam li Mûsûlê tê îdamkirin. Pistî kustina Şêx Evdilselam, Şêx Ahmed serokatiya Barzaniyan hildigire ser milê xwe.

Bi awayê ku em ji kitêba Mesûd Barzanî hîn dibin, Barzaniyê mezin, di jiyana xwe de şerê xwe yê pêşî, di sala 1920-21an de, ji bo xelaskirina Ermeniyan li hember Tirkan dide. Di vî şerê bi ordiya Tirk re, hêzên Barzaniyan 200 kes in. Barzanî, malbata Andranîk Paşayê Ermenî tê de, gellek malên Ermenî ji hovîtiya Tirkan xelas dikin, wan bi saxî digihînin Sûriyê û di vî şerî de 14 kes jî sehîd dikevin.



Piştî parvebûna Kurdisatê, li Başûr, şerê Barzaniyan ê li hember Îngilîzan di sala 1931an de dest pê dike. Di roja 09.12.1931an de, ordiya Îraqê ya ku di bin fermandariya leşkerên Îngilîz de tev digere, bi dîzî dor li herêma Barzan digire û dixwaze wan teslîm bistîne. Barzanî, serê sibê zû, bi saya sivanekî hay ji dorpêçanê çêdibin. Pistî ku zûka di bin serokatiya Sêx Ahmed de dicivin û bi hev dişêwirin, li hember êrîşê biryara berxwedanê distînin. Bi avêtina rojê re hêza dijmin êrîş tîne ser Barzaniyan. Şerekî giran dertê, ji hêzên Barzaniyan ên ku di dora 80 kesî de ne, gellek mêr bê çek û destvala ne.

Di encama şer de êrîşkar 126 mirîyî li pey xwe dihêlin û bi şûn ve vedikisin. Ji Barzaniyan tenê pênc kes şehîd ketine. Barzanî di vî serî de gellek çek û muhîmat bi dest dixin. Fermandarê ordiya dijmin bi zorê canê xwe xelas dike.

Di sala 1932an de, ordiya dijmin, bi bomberankirina balafiran bi ser hêzên Barzaniyan ve tê, di serî de gundê Barzan, gundên der û dorê bi şev û bi roj gund tên bombekirin. Di 3yê Nîsanê de, li herêma Dola Vajî, di navbera hêzên Kurd û dijmin de şerekî giran dertê. Fermandarê pêşmergên Kurd Mustefa Barzanî ye. Di vî şerî 253 leskerên dijmin tên kuştin û gellek jî bi birîndarî esîr dikevin destê Kurdan. Hêzên Kurd Biryargeha dijmin zevt dikin. Generalê Îngîlîz Robînson jî di ser de birîndar dibe; belê ji ber ku Barzanî wî nas nakin, wî dîl nagirin. Di vî şerî de 12 pêsmerge sehîd dikevin.

Mustefa Barzanî bi şerê Dola Vajî mêrxasî û fermandariya xwe nîsanî dost dijmin dide. Hingê Îngilîz fêm dikin ku Serok Barzanî û hêza pê re, wê bi tu awayî koletiyê qebûl nekin û tu kes nikare jiyanek koledarî bispêre wan. Di meha 10an a 1932an de Barzanî, di serî de jin û zarû, bi armanca penaberî derbasî Tirkiyê bûn. Tirk dest datînin ser çekên wan û wan li çaraliyên welat belav dikin. Di ketina Bakur da, Barzaniyan çekên xwe yên baş vesartibûn û yên bêkir dabûn Tirkan. Çaxa ku di sala 1933an de Tirkan bi bêbextî Şêx Ahmed Barzanî teslîmî hikûmeta Îraqê kir, hingê Barzaniyan biryara vegera xwe dan û çardin çekên xwe dan milê xwe. Di salên 1943 û 1945an de, di navbera Barzaniyan û ordiya Îraqê de şerên mezin derketin, belê Barzaniyan serkeftinên mezin bi dest xistin.

Di meha 10an a 1945an de Barzanî derbasî Kurdisatana Îranê bûn. Di roja 22.01.1946an de li Mahabatê Komara Kurd hat îlankirin. Barzaniyan parastina Komarê girtin ser xwe. Di roja 29.04.1946an de Ordiya Îranê êrîş anî ser Komara Kurd. Di 3yê Gulanê de pêşmergên Kurd û ordiya Îranê ketin şer. Îranîyan, li gel ordiya xwe ya modern û tank û topan, balafirên xwe yên şer jî xebitandin. Şerek giran çêbû, ji Îraniyan 80 kes mirin. Ordiya Îranê cesedên xwe li qada ser hişt vekişiya. Barzaniyan 120 serbaz û leşker esîr sitandin. Pêşmergên Kurd esîrên Îranî anîn Mahabadê û ew di nav bajêr re derbas kirin. Gelê Mahabatê kuçe û kolan tije kiribûn, li dîlên ordiya Îranê temaşe dikirin. Jin û zarûkan, ji şivakên malan ji Barzaniyan re li çepikan dixistin.

Piştî hilweşîna Komara Mahabatê, Barzaniyan bi rojan bi ordiyên Îran, Îrak û Tirkan re şer kir û di Çemê Arasê de derbasî Rûsyayê bûn. Di roja 09.06.1947an de, serekî ku sê roj û sê sevan ajot, di navbera pêşmergên Kurd û Îraniyan de derket. Îraniyan dixwest ku koka Barzaniyan bînin û nehêlin ku yek bi saxî bigihîje Rûsyayê. Di şer de Barzaniyan li ordiyeke pirr mezin şikand, bi sedan leşkerên Îranê hatin kuştin û Barzaniyan 271 lesker jî dîl sitandin. Barzaniyan balafireke Îranê jî anîn xwarê. Ji 500 pêşmergên Kurd çar kes sehîd ketin û 14 kes birîndar bûn. Pêsmergên Barzanî, di roja 18.06.1947an de Çemê Arasê derbas kirin û gihîştin axa Sovyetê. Wek Selahedînê Eyûbî, Barzaniyan jî di tu şerekî de xesar nedan esîran. Ev adet, ev taybetî, ev şeref û ev comerdiya miletê Kurd hê jî dajo.

Ez ne bawer im li dinê tu hêzek bi qasî pêşmergên Kurd û fermandarê mezin Barzanî di şer de li hember dijmin bi ser ketibe û wek wan destanên mêrxasiyê nivîsandibe. Bi saya vê berxwedanê, bi saya vê hêzê, bi saya vê tekoşînê gelê Kurd ruhê mirin û koletiyê ji ser xwe avêt û cardin vejiya. Vê îrada ji pola serê Kurdan bilind kir û hê jî bilind dike.

Eger dewleta Brîtanya û hersê dewletên dagirker, bi tank, top û balafirên xwe nehatina şer Kurdan, eger wek dema Selahedîn ser bi şûr bûya, bawer bin wê Kurdan bi fermandariya Barzaniyê mezin tevahiya Kurdistanê bi yek carekê xelas bikira û niha Kurd bi tevahî azad bûn. Belê Xwedê ji bêîmkanî û bêkesî û bêkeysiyê re nehêle.

Ji bo baş fêmkirina doz û dîroka Kurdan û Kurdistanê ya nêzik, xwendina kitêba Barzanî ferz e; nebe na ye.

Sosyolog û nivîskarê bi navûdeng İsmail Beşikçi:

„Dest ji Kerkûkê û federalîzmê bernedin"



Li gora nûçeya rojnameya Kurdistanî Nwe, Beşikçi nerîna xwe ya di derbarê Başûrê Kurdistanê de aniye ziman û ji Kurdan daxwaz kiriye ku ew dest ji Kerkûkê û daxwaza sîstemeke federal bernedin.

Rojnameya Kurdistanî Nwe ya ku li Başûrê Kurdistanê derdikeve, hevdîtina di navbera Navenda Lêkolînên Stratejîk ya Kurdistanê û Sosoyolog Îsmaîl Beşikçî de kiriye nûçe û nerînên Beşîkçî yên di derbarê rewşa Kurdistanê de derxistine pêş.

Beşîkçî daye zanîn ku ew bi qezencên Kurdan kêfxweş dibe û dibêje „pêwîste Kurd li ser federalîzmê bi îsrar bin û gava xwe bi paş de neavêjin".

Îsmaîl Beşîkçî di derbarê Kerkûkê de jî wiha gotiye „ Ewên ku li hemberî erebkirina Kerkûkê bêdeng diman, niha ji bo vegera koçberên Kerkûkî jî qiyametê radikin".

Beşîkçî balê dikşîne ser şîroveyên ku dibêjin „Kurd dixwazin bi demografiya Kerkûkê bilîzin" û dibêje „di sala 1970î de dest bi derbederkirina Kurdan kirin û ew bi zorê ji cî û warên wan derxistin, di salên 80î de jî ev yek berdewam kirin. Bi heman şêweyî jî Ereb anîn û li bajarê Kerkûkê bi cî kirin". Nivîskarê navdar dibêje „divê neyê jibîrkirin ku wê ev dewleta nûjen ya ku tê damezirandin, tucaran ne weke ya dema Seddam Hisên be".

www.arsiv.org

Li dijî KOMKARê êrîşên hov

Di navbera hefteyekê de li Britaniya û li Swêdê du êrîşên hov li dijî KOMKARê pêk hatin. Li gor daxuyaniya KOMKARê di şeva 21ê Adarê de "hêzên tarî" avêtin ser lokalê û talan kirin. Pirtûkxaneya komelê, resmên şehîdan û ala rengîn ji hev belav kirin. Her wiha êrîşek din di 26ê Adarê de li Swêdê hat kirin û komele hat wêran kirin.

Wek ku tê zanîn di 16ê Sibatê li Hambûrgê jî êrîşek bi bombeya molotof kokteyl li dar hatibû xistin.

Peyama Kurd van êrîşên hovane bi tundî şermezar dike û piştgiriya xwe pêşkêşî KOMKARê dike. Peyama Kurd her êrîşek li dijî Kurd û dezgehên Kurdî wek êrîşek li dijî xwe hatiyekirin dinirxîne..

Rêxistina Efûya Navnetewî, balê dikşîne ser kuştina Kurdên sivîl

Rêxistina Efûya Navnetewî Amnesty International bala rayedarên Tirkiyê dikşîne ser zêdebûna kuştina Kurdên sivîl li Kurdistanê û xemgîniya xwe tîne ziman. Rêxistin dide zanîn ku li Tirkiyê hîna jî îşkence û zor li mirovan dibe.

Rêxistina Efûya Navnetewî, raporek li ser binpêkirinên mafên mirovan yên ku li Ewrûpa û Asya Navîn dibin belav kir û Tirkiyê hişyar kir ku di vî warî de tiştê ji wê tê xwestin bi cî bîne.

Di raporê de tê gotin, li Tirkiyê bi taybetî Kurdên sivîl ji aliyê hêzên dewletê ve tên kuştin û di derbarê kujeran de lêpirsîn nayê kirin. Ji bo vê yekê, li Qoserê kuştina Ugurê 12 salî û bavê wî û li Şemzînanê jî kuştina Fevzî Can ya ji aliyê hêzên dewletê ve weke mînak têne nîşandan.

Di rapora Amnesty de li ser îşkencê jî tê rawestan û tê gotin ku îşkenceya bi cop û muameleyên xirab dewam dikin. Amnesty dide zanîn ku di derheqê van pêkanînan de kêm caran lêpirsîn hatine vekirin, bi zaqonan cezayê kesên îşkencekar tê daxistin û di Zagona Ceza ya Tirkiyê de, gelek tawanên îşkencê, bi sedema ku dem di ser wan re derbas bûye, nayên şopandin.

Rêxistin dide zanîn ku di encama gotinên îtîrafkarê JÎTEMê Abdulkadîr Aygan de li gundê Kortukê yê girêdayî Silopiyê cesedê xortekî bi navê Murat Aslan hatiye dîtin, lê belê hîna jî lêpirsîneke berfireh nehatiye kirin.

Amnesty, bi heman rengî gora giştî ya ku li Pasûrê jî hatibû dîtin destnîşan dike û dibêje ku hîna di derbarê wê bûyerê de jî lêkolîneke berfereh nehatiye kirin.

Di rapora Rêxistina Efûya Navnetewî de zagona nû ya çapemeniyê, doza ji bo girtina Egîtîm Senê, astengiyên li ber bikaranîna zimanê dayikê û şîdeta li dijî jînan jî hatine rexne kirin.

Du endamên berê yên PKK/Kongra-Gel hatin girtin



Rizgarî.com/PK - Li gora agahdariyên ku gihîştine rojnameya me, Hasan Atmaca û Dursun Ali Küçük ku berê ciyekî girîng di nava PKK de digirtin, ji rêxistinê cuda bûne û her yek li welatekî cuda ji aliyê hêzên ewlekariya wan welatan ve hatine girtin.

Di derbarê girtina Hasan Atmaca de nivîskar Selîm Çurukkaya daxuyaniyek daye malpera Rizgarî Online û diyar kiriye ku Hasan Atmaca ji zû ve li dijî nerînên serokê PKK (Rêberê Koma Komalên Kurdistanê) A. Ocalan derketiye, ew ji ber vê yekê demekê li Başûrê Kurdistanê ji aliyê PKK ve hatiye girtin û piştre jî ew ji rêxistinê cûda bûye û di dema hatina Almanya de li Balafirgeha Frankfurtê hatiye girtin. Çurukkaya dide zanîn ku gelek mirov di derbarê girtina Atmaca de agahdar in lê belê kesek dengê xwe dernaxîne û ew bang li hemû welatparêz, demokrat û parêzerên mafên mirovan dike ku xwedî li Hasan Atmaca derkevin. Çurukkaya di daxuyaniya xwe de balê dikşîne ser berxwedana ku Hasan Atmaca di zîndanên Amedê û dadgehên dagirker de kiriye û dibêje „ma qîmetê Hasan Atmaca bi qasî yê Nurîye Kesbîr û Remzî Kartal jî tune ye gelo?.

Ji bo Dursun Ali Kuçuk jî xanima wî Songul Kuçuk daxuyaniyek belav kiriye û daye zanîn ku zilamê wê ji kampên PKK yên li çiyayê Qendîlê reviya ye û ew li Gurcistanê hatiye girtin. Xanim Kuçuk di nava gumanê de ye ku Hikûmeta Gurcistanê zilamê wê radestî Tirkiyê bike û ji bo vê yekê alîkariyê ji Rêxistian Efûyê dixwaze. Songul Kuçuk dide zanîn ku zilamê wê li Tirkiyê di sala 1977an de ji ber sedemên siyasî hatiye girtin û 16 salan di zîndanê de maye.



Provokasyona Ala hevbeş

Ömer ÖZMEN

Bêguman al; sembola netewa ne. Li gorî nirx û pîvanên medenîyetê, divê meriv, ji ala her netewê re hurmetdarbe. Binpêkirin û perçekirina alê, ne çalakiyek sîyasî ye.Ne jî, ehlaqî ye. Ji xeynî kîn û nefretê jî, tu encam jê nayê bidestxistin. Lê mixabin, desthilatdarên dewleta Tirk, gelek caran vê sembola milletê xwe, wek pergalên provokasyonan, li dijî muxalefeta çep û ya Kurda bikaranîne. Ji ala tu milletî re jî hurmet nekirine.

Ji alîyê din, her roj, rêxistinên îslamîperest, faşîst û komînist yên bi dewleta kûr ve girêdayî, li meydanan âlên Israîl,Yewnan û Amerîkayê dişewitînin. Berpirsiyarên dewletê û çapemeniya Tirk, tucarî van çalakîyana şermezar nekirine. Heta bi sempatîk pêşwazî dikin. Ev helwesta desthilatdarên Tirk, ne tenê muxalefetê provoqe dikin, di heman demê de ala milletê Tirk jî bê rûmet dikin. Di cîhanê de tu dewletek, bi qasî desthilatdarên Tirk, bi ala xwe nelistiye.

Di nav 50 salên dawî de, meriv dikare ji van çalakiyên provokatîf, gelek mînakan rêz bike.

Di 5-6 ê Îlona 1959 an de, sîxurekî MIT`a Tirkiyê, Li Selanîkê bombe davêje avahîya ku Mistefa Kemal tê de ji dayîkê bûye. Piştî vê bûyerê, nîjadperest û faşîstên Tirk, li Stenbolê êriş dibin ser gelên Rum û Cihûyan. Di encama van êrişên hoviyane de, bi hezaran kesên Rum û Cihû, ji Anatolîyê koç dikin..Mal û milkên wan tên talankirin.

Pîştî derbeya leşkerî, ya 12 Adarê, di sala 1973 an de, li ber derîyê Dibistana Mamostatiya Düziçi ya Edenê, çend al hatibûn perçekirin. Perçeyê wan, li çar alîyên dibistana mamostan hatibûn reşandin. Li ser sûra dibistanê jî, wêneyê dasok û çakûç nivîsandibun. Çapemeniya Tirk, wê demê cardin dest bi tehrîkan kir. Li ser gellek kesên demokrat û xwendevanên Kurd, êriş hatin pêkanîn. Nivîskarê vê nivîse jî di nav de, çend xwendevanên Kurd û demokrat, ji dibistanê hatin dûrxistin. Di encama lêpirsîn û lêkolînê de, bi alîkariya gelên herêmê yên demokrat, faîlê bûyerê derketin holê. Hemî endamên MHP ê bûn. Çalakvanan sucê xwe îtiraf kirin. Ji wana, 4 kes hatin mehkûmkirin.

Di domahîya şerê Kurdîstanê de, li gelek deveran bûyerên bi vî awayî, ji terefên hêzên tarî ve hatin organîzekirin. Desthilatdarên Tirk, vê sembola milletê xwe, di girtîgeha Dîyarbekrê de, li dijî welatparêzên Kurd, wek dezgeha êşkencê bikaranîbûn.

Tê zanîn, di dema serokwezîriya Tansu Çiller de, rojnamên Ewrûpî, li ser ala Tirk, karîkatur neqişandibûn . Di karîkaturan de, enjektora eroînê, bi ala Tirk ve hatibû pêçandin. Wê demê jî, kesên di xizmeta dewleta kûr de kar dikirin, li Ewrûpayê, tevî eroînê hatîbûn girtin. (Oral Çelik, Yaşar Öz, Abdullah Çatli êwd.)

Dema meriv van Çalakiyên dewleta kûr bîne bîra xwe, li ser şîrovekirina provokasyona Mêrsîn ê zehmetî nakêşîne. Senaryo hemî wekhev in. Li Mêrsînê, pîrozbahîya Newrozê, ji alîyê DEHAP iyên Apocî ve hatîye organîzekirin. Di destê gelemperiya beşdarvanan de sûretê Apo heye. Ji naveroka Newrozê zêdetir, rizgarkirina Apo tînin zimên.

Apo jî, li Imralîyê dibêje "ez dema hatim girtin, min ala Tirk, a bi hîv û stêrk, maç kir û da ser serê xwe."Rayedarên DEHAP ê jî dibêjin: "ev al, ne tenê ya Tirka ye, ya Kurda ye jî. Parêzvaniya Komara Tirkîyê ya Unîter jî, dane ser milên xwe. Di nav tevgera Kurd de, rêxistinek ji dervayê DEHAP a Apocî jî, hîn xwedî însîyatîfê nîne ku, li ser girseyî ya beşdarvanê pîrozbahiyê tesîrê bike.Wê demê, meriv difikire. Gelo ew kîjan hêze ku, ji bo çi, ala Apocîyan û dewleta Tirk ya hevbeş binpêdikin ?

Bersiva vê pirsê, di encama provokasyonê de derket holê. Bi deh hezaran faşîst û nîjadperest hatin civandin û êriş birin ser koçberên Kurdên belengaz, mal û dikanên wan carek dî talan kirin. Cambazên Apocî û rayedarên dewleta Tirk, wek qedandina sehna şanoyê, bangî hev dikin. "EV PROVOKASYONE!"

www.arsiv.kurd

Başûrê Kurdistanê baxçê mayîna ye

Midûrê têkiliyan yê Hereketa Mayinan ya Netewî li Îraqê Ralph Hassall da zanîn ku di temamiya Îraqê de, cihê herî zêde bi mayin Başûrê Kurdistanê ye.



PK - Midûrê têkiliyan yê Hereketa Mayinan ya Netewî li Îraqê Ralph Hassall da zanîn ku wan li Îrak û Başûrê Kurdistanê 10 hezar û 232 navçeyên bi talûke dîtine û wan heta niha bi hezaran ton cebilxane û amûrên şer kom kirine. Hassall dibêje ku di temamiya Îraqê de, cihê herî zêde bi mayin Başûrê Kurdistanê ye.

Ralph Hassall dide zanîn ku xebatkarên wan di dema dawî de dibin hedefa êrîşên terorîstan jî û xebata wan ya derxistina mayinan tê astengkirin.

Hereketa Mayinan li gel 3 hezar xebatkar li Îraq û Başûrê Kurdistanê mayinan derdixin û wan heta niha bi sedan şiklêm mayin û teqteqokan derxistine.

Hassal di berdewamiya daxuyaniya xwe de dibêje ,'Me heta niha bi piranî li Dihok, Hewlêr,Silêmaniyê, Basra, Missan û Qadissiyê 10 hezar û 232 navçeyên bi talûke dîtine. Ji van deveran li 3 hezar û 500 cihê cuda mayin hatine dîtin û her wiha gelek awayên mayınan, teqteqok, fûze, roket serikên sîlehan û fîşek jî hatine derxistin. Me heta niha li Îraqê 600 hezar ton jibermayên şer kom kirine. Me hinek ji van amûran ji bin erdê derxistine û hinek jî ji ser erdê kom kirine".

Li gora pisporê mayinan Hassall, wê xebata derxistina mayinan li Başûrê Kurdistanê hîna bi salan dirêj bike. Tê gotin ku li Başûrê Kurdistanê ji her 5 mirovan yekî zirar ji mayinan dîtiye.

Li herêmê her meh 20 teqînên mayin û bombeyan çêdibin û dibin sedema mirin û birîndarbûna 500 kesî. Îraq di aliyê mayin û bombeyan de yek ji 4 welatên herî bi talûke ye. Tê ragihandin ku rewşa Afxanistan, Angola û Kamboçya jî weke ya Îraqê ye.

Hevwelatiya bi qestî!...

Cemal BATUN



Ez nizanim, ev gotin ji alî kîjan berpirsiyarên Turkan di van rojên dawî de hate bikaranîn, lê min di hin rojnameyên wan ên rojane û di nivîsên hin ji rojnamevanên wan ên mezin de dît û xwend. Ev gotin - "hevwelatiya bi qestî" ango bi Turkî, wekî ku wan bikar aniye "sözde vatandaşlık" ji bo Kurdên ku itaet/xwegiredanbûn a xwe diyarî Dewleta Turkiye nakin hatiye bikaranînn. Ew jî bi gotina van nivîskar û rojnameyan, dibe ku ji bo tevayiya tevgera Kurd a neteweyî derbas bibe...

Ez li ser vê peyvê bi taybetî rawestiyam, li ser vê peyvê bi taybetî ponijîm. Min nîşankirina vê peyvê ne tenê ji bo tevgera neteweyî/civatî ya Kurd, lê ji bo tevayiya 20 milyon Kurdan ku li Bakurê Kurdistanê dijîn jî, gelek rast dît!

Rast e, weha ye...20 milyon Kurd, li Turkiyeyê hevwelatiyên bi qestî ne!

Ger ne weha bû ya...Dewleta Turkiye, civata Turkiye, rêxistin û avahiyên civatî û pişeyî, ragihandin û rojnamevan, kesên ku xwe wekî demokrat li Turkiye binav dikin, dê hinek-hinek jî bû ya rêzê ji bo hebûn û sembolên netweyîbûna Kurdan bigirin...

Li gor van hemû dezgeh û hebûnên min li jor binavkirî, li Turkiye:

Kurd nî nin!...
Zimanê Kurdî nî ne!...
Ala Kurd/Kurdistanê nî ne!...
Nirxên civatî û neteweyî yên Kurdan nî nin!...

Navên heywanan ku taybet in bi nîşana ku li Kurdistanê dijin (Kurdistanica) nînin...Roviyê Kurdistanê, pisîkên Kurdistanê, hêşînahî yan gul ên Kurdistanê nî nin!..

Navê Welat, Xebat, Bawer, Xusro nî nin!

Gundên Kertwênê, Baqisyan, Xan a Dorikan, Hêştrekê, Girêmîran, Halaxê nî nin!...

Newroz nî ne!

Tevgera Kurd a civatî nî ne!

PDK/Bakur, PSK, Kawa, Rizgarî nî nin!

Hîs ên kurdayetiyê nî nin! Hîs ên zarok û xortên Kurdan nî nin!

Kurdistan nî ne!

Ev lîste bi sedan kiryarên din ku hemberê nirxên Kurd û kurdayetiyê li Turkiye tê bikaranîn dikare bête dirêjkirin. Li aliyê din, 20 milyon mirov li Bakurê Kurdistanê xwediyê van sembolên jorîn ku hatine qedexekirin in.

Rast e! 20 milyon Kurd, li Turkiye hevwelatiyên qestî ne!

Ev rastî ji alî sazûmanên Turkan û Turkiye ve hatiye paşçav kirin. Nehatiye qebulkirin. Lê Turkiye îro welatek berendamê Yekîtiya Ewrûpa ye...Gelo Yekîtiya Ewrûpa jî van rastiyan nizane?...Belê, belê dizane...Lê dîsan jî her dem, her roj divê em bînin bîra wan.. Ev jî erk a me ye...Na xwe em dê her û her hevwelatiyên qestî bimînin!

cbatun@yahoo.se

STAR
GASTRONOMIE HANDEL
Tevi 300 çeleb male xwe di xizmeta we deye!
DÖNER PRODUKTION
LEBENSMITTEL
VERPACKUNG
GETRÄNKE
GERÄTE
•HÄHN PUTEN DÖNER
•PUTEN DÖNER
•MIX (HÄHN PUTEN)
•KALB (GEPACKT)
• Penir • Thunfisch • Champignons • Schinken
• Salami • Paprika Streifen • geschälte Tomaten
• Pizza Sauce • Peperoni • Pizza Box • Pommes
• Alufolie • Essig • Salz
ABHOLMARKTPREIS
Öffnungzeit: 08:30 - 18:00 Uhr

	€
Pizza Käse-Gouda (%48):	3,09
Thunfisch-Dose(2,65 gr.) LA PERLA:	4,49
Puma Feta Rot (20kg.- Netto 16 kg.):	39,99
Essig (10lt.-%5):	4,99
Salz (10kg.-Eimer):	5,50
Mayo Hamker-(10kg-Eimer):	11,99
Ketchup Hamker- (10kg.-Eimer):	11,49
Pommes (10 kg. Karton-4x 2,5 kg.):	6,99
Schinken (kg. Preis):	1,89
Putenschinken (kg. Preis):	4,49
Salami (kg. Preis):	4,19

	€ Stück
Pizza Box: 20x20x3:	0,071
Pizza Box: 24x24x3:	0,083
Pizza Box: 28x28x3:	0,10
Pizza Box: 26x26x4,5:	0,10
Pizza Box: 28x28x4,5:	0,111
Hamburger Box:	0,03
Menüteller:	0,10
Alufolie (1500x30 cm):	4,75

Not: Yen ku male xwe bi xwe biven di %7 erzani heye!
•FIRMA STAR KALITE YE!
•FIRMA STAR ERZANIYE!
•FIRMA STAR QASI TELEFONEKE NEZI WE YE!
Adrese: Windelsbleicher Str. 180
33659 Bielefeld
Tel.: 0521/ 5227366-77
Fax: 0521/ 5227388
Mobil: 01797805900

Salvegera şehadeta serokkomarê Kurd Qazî Mihemed



Pêşewa Qazî Mihemed 31.03.1947

„Mirina di riya gel û azadîyê de ji me re şîrîn e û em bi can û dil vê şerefê dipejirînin. Baweriya we hebe di çaxê daleqandinê de axînek jî ji min nayê....".

Şehîdê mezinê riya azadiyê Pêşewa Qazî Mihemed yek ji wan rêberaye ku di xweşî û nexweşîyên jiyana gelê xwe de, ji wan cuda nebû û heta canê xwe jî fîdayê bextewerî û serbilindiya gelê Kurdistanê kir. Ji bona wê jî nav û hurmeta wî ya dîrokî ji nava dil û mejiyê gelê Kurdistanê qet dernakeve.

www.kurd.org

PKK/Kongra Gel: Tevliheviyek siyasî û îdeolojîk

Dr. Husên Tahîrî



Bi pêşkêşkirina konsêpta konfederalîzmê wek çarseriyek siyasî û civakî ya Pirsa Kurdî li Rojhilata Navîn re, serokê PKK/Kongra Gel, Ebdela Ocalan, ji zindana xwe ya li Imraliyê carek din guftûgoyek siyasî ya din vekir. Ocalan diyar kir:

Konfederalîzm hêza xwe ji samanên çandî yên dewlemendên Mezopotamyayê distîne. Ew xwe dispêre strukturên civakî yên civaka sirûştî, ji sîstema êlan ta konfederayona eşîran, ku di dîroka şaristaniyê de nexwestiye bibin beşek ji navendkirina civaka dewletê. [1]

Ramana konfederalîzmê bi sedên salan li cem serokên eşîrên Kurdî û herweha li Ewropaya Rojava peyda dibû, û eşîrên Kurd bi rastî jî konfederalîzm pêk dianîn. Lê dîsa jî Ocalan xwe wek kesê ku konfederalîzm afirandiye, dibîne. Wî diyar kir: *"Ez bawer dikim ku min felsefe û sîstemek jiyanê yên nû dan gelê xwe."* [2] Wî doza pêkanînek lezgîn a vê ramanê kir, mîna ku konsêptek dîrokî ya nû be, ku di praktîkê de bi hesanî dikare pêk bê. Ocalan konfederalîzmê mîna *"mîsyonek lezgîn, zor pêwîst û dîrokî, ku nikare bête bipaşxistin"* [3] bi nav dike. *Wî herweha ji bo konseptek weha alek bi stêreke sor di hundirê rokek zer de li ser zemînek kesek pêşniyaz kir.* [4] Yekser piştî ku Ocalan ramana xwe ragihand, alîgerên PKK/Kongra Gel pir bilez ev al amade û pêşkêş kir.

Konsêpta Ocalan ya konfederalîzmê ew e, ger li Tirkiyê pêk were, ku li Kurdistanê dê sê yasa serdest bin: Yasaya Yekîtiya Ewropayê, yasaya dewleta unîter (Tirkî) û yasaya konfederalîzma demokratîk. Wî got, ger dewletên unîter (Tirkî, Surî, Iraq, Îran) yasaya konfederal a gelê Kurd bipejirînin, gelê Kurd jî dê yên wan qebûl bike. *Wî got ku dê bi vî awayî lihevhatin pêk were.* [5] Dewletên ku fermana ser Kurdistanê di destên wan de ye, ne amade bûn ku mafên çandî yan jî autonomiyê ji bo Kurdan qebûl bikin, tew îcar konfederalîzm! Şerê ji bo konfederalîzmê dê ewqas enercî û goriyan bistîne, mîna şerê ji bo Dewleta Kurdistanê ya serbixwe.

Pirsa bingehîn ne praktîkbûn an nepraktîkbûna ramana konfederalîzmê ye; pirs ew e, bê ev raman dê çiqasî avjeniyê bike, berî ku ramanek din ciyê wê bigire? Serokatiya PKK/Kongra Gel alîgerên xwe û gelê Kurd bi kû de dibin?

PKK dora bîst salan xwedî ramana dewletek Kurdî ya marksî-lênînî bû. Piştî girtina serokê wê, tevaya ramanê têkçû. Ji bo serokatiya PKK/Kongra Gel dewletek Kurdî bû pirsek ne giring û ne hezkirî. Ta bi ramanên autonomî û federalîzmê jî bûn konseptên kevn û ne li gorî demê. "Komara Demokratîk" û "Demokratî ji bo Rojhilata Navîn" ketin şûna dewleta Kurdî ya serbixwe. PKK, ku carekê ji ber piştgiriya mezin ji aliyê Kurdên li perçeyên din ên Kurdistanê ve mezintirîn partiya siyasî ya Kurdî bû, pir ji hêza xwe winda kir, çimkî *"Komara Demokratîk"*, ku serokatiya PKK dixwest, bala wan Kurdan nekişand.

Belavkirina demoqratiyê li Tirkî, Rojhilata Navîn û cîhanê ramanek pir baş e. Lê pêşî divê ew konsêpta demoqratiyê di nav rêxistin û civaka xwe de pêk bînin, berî ku ew vê yekê ji bo beşên cîhanê yên din re baş bibînin. Tenê bîne ber çavên xwe bê cîhanê dê çi kiriba, ger George Bush Junior ji Rojhilata Navîn re demoqratî xwestiba, û Dewletên Yekbûyî ne welatekî demoqrat ba.

Niha pirsek di bala gelek Kurdan de ye: Ji Partiya Karkerên Kurdistan (PKK) ta Kongireya Azadî û Demoqratiyê (KADEK) ta Kongreya Gel ta dûra çi? Ji dewletek Kurdî ya serbixwe ta neqebûlkirina autonomî û federalîzmê ta "Komara Demoqratîk" ta "Demoqratî li Rojhilata Navîn" ta "Konfederalîzmê" ta dûra çi?

Ji bo milet û rêxistinan guhertin û pêşketin giring in. Lê prensîp nikarin rojnane bêne guhertin. Van guhertinan ji PKK û rêxistinên bi dû wê de gelek ziyan anîn. Wan hişt ku gelek ji alîgerên wê li Bakurê Kurdistanê dev jê berdin. Wan perçebûnek xist nav PKK/Kongra Gel. Wan di nav kadro û endamên PKK/Kongra Gel ên mayî de tevliheviyek siyasî û îdeolojiya mezin çêkir.

Serokatiya PKK/Kongra Gel divê li pozîsyona xwe binere û bifikire bê ew ber bi kû ve diçe. Ya rast, konfederalîzm ne "mîsyonek lezgîn" an "zor pêwîst" e, wek ku Ocalan diyar kir; amadekirina aliyekî stratêjî ji rêxistinê re, ku bikaribe dirêj bike, ji bo serokatiya PKK/Kongra Gel mîsyonek lezgîn û zor pêwîst e, berî ew rastî dawiyê bê.

Tiştê ku di vê demê de pêwîstiya PKK/Kongra Gel ji hertiştî bêtir pê heye, nermbûneke ku bikaribe bi partiyên siyasî û rêxistinên Kurdî yên din re bike-ve têkiliyê û ligel guftûgoyan pêk bîne, da ku ji bo pêşeroja Kurdan stratêjiyek giştî bête peydakirin; stratêjiyek ku dê ji aliyê hemû beşên Kurdistanê ve bête qebulkirin.

Jêrenot:
1: Alev Karakartal, "Confederation isn't the solution", Bianet.org, 26.03.2005, KurdishMedia.com.
2,3,4 û 5: Heman çavkanî

Wergera ji ingilîzî: Sîrwan Hecî Berko

** Ev nivîsar ji Kurdishmedia.com hatiye wergirtin. Dr. Husên Tahîrî ji Urmiyê (Kurdistana Îranê) ye. Ew li Australyayê dijî û wî di zanîngehên wê de xwendiye û di beşê zanyariyên siyasî de doktora bi dest xistiye.*

Îhsan Nûrî Paşa hatibû Avûstûrya

Seyîdxan Kurij

Meha Adarê salvegera 29. ya mirina serleşkerê serhildana Agiriyê Îhsan Nurî paşa ye. Min di derheqa şehîd Îhsan Nurî de pir tişt xwendiye, lê di tu derê de rast nehatime ku behsa hatina Îhsan Nurî ya Avusturyayê hatibe kirin. Ji ber wê min dixwest ez vê agahdariyê ji bo raya giştî eşkire bikim.

Gava min bi çend hevalan re li bajarê Duisburgê dest bi weşana radyoyê bi zimanê Kurdî (Kurmanci, Kirdkî) kir, di heman demê de me wek grûbekê li ser Kurd û Kurdistanê panel, semîner û şevên kulturi jî amade kirin. Di wê demê de min rehmetî Hemreş Reşo naskir. Çimkî me çend caran rewşenbîr û siyasetmedarê Kurd rehmetî Hemreş Reşo wek axaftar vewxendina semînerên li ser rewşa Kurdistanê kiribû. Bi vî hawî di navbera me da pêwendîyên dostanî pêk hatin. Heta roja mirina wî ez carna diçûm mala wî û me li ser temayên curbecur sohbet dikir. Min bi rehmeti re di derheqa xebata wî ya Ewrûpayê û li ser hin biryarên pêwist hevpeyvînek dirêj jî çêkir, lê ew hevpeyvîn hîn nehatiye weşandin.

Rewşenbîr û siyasetmedarê Kurd Hemreş Reşo di hevpeyvîna me de ragihand ku di salên 1970an de Îhsan Nurî Paşa hatiye Avûstûryayê. Rehmetî Hemreş Reşo di vê derheqê da ûsa got: „Îhsan Nurî Paşa, piştî şikestina serhildana Agirî li Tehranê hatibû bi cîh kirin. Ew li wir di bin kontrola dewleta wî nikaribû telefonî me bike. Li ser wê Îhsan Nurî Paşa mecbûr ma dîsa vegere Iranê. Demeke şûnve jî li Tehranê bi encama qezayekê (an ji suikasteke) de di 25.03.1976 an de çû ser heqiya xwe."

Bi kurtî jîyana Îhsan Nurî Paşa

Îhsan Nurî di sala 1893an de li Betlisê hatiye dinyayê, kurê Elî Qulî ye. Îhsan Nurî di sala 1910an de di artêşa dewleta Osmanî de serleşker(Tegmen) e. Ew di herba cîhanê ya yekemîn de di eniyên curbecur de wek serleşkerekî Osmanî şer dike. Piştî şer tê Istanbûlê û li wir wek piraniya rewşenbirên Kurd dibe endamê Kürt Tealî cemiyetî û di kovara "JÎN" de dinivîse. Rêvebirên dewletê naxwazin ew li Îstanbulê bimîne, çimkî ew li vir di nav çalakiyên Kurdan de cîh digre. Dixwazin wî bişînin Bakû yê, ew diçe Bakûyê û li wir bi kominîstan re pêwendî datîne. Îhsan Nurî Paşa di sala 1920 an de diçe Sasonê û di Kurdistanê de dest bi xebata netewî dike. Leşkeriya Tirk bi kirinên wî agahdar dibe û wî dide mehkemê. Ji ber ku bes delîl tune ew serbest tê berdan.

PiştreÎhsan Nurî Paşa bi rêistina „ AZADÎ" re pêwendî datîne. Li ser xeletxwendina şîfreyek mebusê Betlîsê û rêberê „AZADÎ" Yusuf Ziya, Îhsan Nurî Paşa bi hevalên xwe yên leşkeran re bi hevre di 1924an de li Beytülşebabê eriş dibin ser baregehek leşkeriya Tirk.

Ji ber kû ew çalakî bê plan û bêwexte, têk diçe. Serleşkerên Kurd Elî Rizayê Betlisî tê girtin,



Îranê de mecbûrî rûniştinê bû. Ango bê destûra Dewleta Îranê nikarîbû cîhe xwe biguherîne, an jî seyahetê bike. Gava ew li Tehranê bû di navbera me da pêwendî hebû. Me ji hevûdû re name nivîsand. Carekê ewî ji bo min nameyek nivîsî ku ewê bê Avusturyayê. Îhsan Nurî Paşa nexweş bû û piştî nameya behskirî ew ji bo tedaviyê hat Avusturyayê. Lê xebatkarên rêxistina parastina Îran (SAVAK) jî bi wî re hatibûn Avusturyayê. Ew di bin çavderiya SAVAKê de hatibû. Ewî li Avusturyayê jî nikarîbû serbest hereket bike. Dîsa jî wî çend caran firset dît, telefonî min kir, em peyivîn. Ewî dixwest xwe ji destê Savakê rizgar bike û were Almanya, li vir îltîca bike, li Almanyayê bimîne. Me pir hewl da ku em Îhsan Nurî Paşa ji Avusturyayê bînin Almanya, lê mixabin Savak pê hisiya, ji ber wê jî pêwendiyên me qut bûn. Telefona wî tunebû, wî ji derve telefonî me dikir, lê piştî ku Savak pê hisiya êdî Hurşîtê Hertosî derbazî Zaxo dibe, Tevfik Cemilê Mêrdinî, Rasîme Wanî û Îhsan Nurî li ser Sûriyê derbasî Iraqê dibin. Ew demekê li Iraq û Îranê li cem Kurdan dimînin. Gava XOYBÛN tê damezirandin ew dibe endamê Xoybûnê. Xoybûn Îhsan Nurî Paşa wek berpirsiyarê leşkerî yê serhildana Agiriyê tayîn dike. Îhsan Nurî Paşa heta bi dawî serhildana Agiriyê îdare dike. Piştî têkçûna serhildana Agiriyê ew derbasî Îranê dibe û heta dawiya jîyana xwe li wir wek girtî dijî.

Di 18ê Adarê de Îhsan Nurî Paşa qeze derbas dike û di 25ê Adarê de li Tehranê di nexweşxaneyekê de jiyana xwe ji dest dide.

Ji Serleşkerên Serhildana Agirî çend kes ev in:

Ferzende, Elî Can, Seyîdxan, Efif, Memo, Hesoyê Yeli, Nadir, 3 zarokên Huseyin Paşa û Bro Heskê Tellî.

Bila serê gelê Kurd sax be. Ewê her di dilê Kurdan de bijî!

www.kurd.com

Endamên Koma Rewşen:

„Prensîba me ya sereke zimanê Kurdî ye“



Hevpeyvîn: Ronî Stêrk

Peyma Kurd: ***Belê Harûn Ataman, em ji te dest bi hevpeyvîna xwe bikin. Tu wek solîstê komê hinekî din derdikevî pêş û Kom li paş dimîne. Kom û Star, bila, pirsa me ya yekemîn ev be. Tu dikarî ji me re hinekî şirove bikî?***

Harûn Ataman: Di çanda muzika Kurdî de heya nuha cure cure tarz derketin hole, lê ew bingeha xwe ji dengbêjiyê distîne. Yên ku vê muzikê bi kar tînin kes in; yanî kes bi serê xwe ne. Gotin û muzîka xwe bi serê xwe û herweha ew bi tarzeke serbixwe ava dikin.Ev yek heya van salên dawî jî wusa bû. Belê ev demek e di nava Kurdan de hestê kom û kombûnê derket holê. Yanî ji pirr kesan û ramanan mejiyek avaker derket. Kom derket. Ji bona ku heta vê rojê sîstema startiyê hebû û gel tenê dengbêj/stranbêjek li ser dikê nas dikir, ew navdar dihesiband. Ew kes jî bi dengê xwe derdiket pêşiya gel. Ev yek îro jî berdewam e û heta ji bona Koma jî bikartînin. Kî distrê star ew e. Kî distrê serkêşê komê ew e. Kî distrê yê hemû mezin û navdar ew e. Ev mantiqekî gelek şaş e.

Lê ev pirsgirêk ne tenê taybetmendiya gelê Kurd e. Gelo di muzîkê de ev pirsgirêk li herderê dinyê dernakeve pêşiya hunermendan?

Bingeha vê pirsgirêkê Rojhilata Navîn e. Yanî ev mejiyê starbûnê yan jî îlahkirina kesan ji Rojhilata Navînê tê. Jixwe bi vî rengî kesayetiya me û hunera me jî pêşve çûye. Yani bi rengê starbûnê, bi rengê kesbûnê. Helbet di dîroka kurdan de hinek mînak hene ku wek kom hatine avakirin û herweha hatine hesibandin jî, lê ez ne di wê baweriyê de me ku bi sedîsed û bi rengekî rast hatine binavkirin. Ji ber ku, wek min nuha jî got, solîstê komê gava ku distrê derdikeve pêşî û di nav komê de berî herkesî tê. Lê di nav koma me de (di Koma Rewşen de) tiştekî wisa tuneye û em vê yekê qebûl jî nakin. Em kom in û em bihevre yek in. Tu cûdayî di nav endamên komê de tune ye.

Koma Rewşen çawa û li ser kîjan bingehê avabû?

Koma Rewşen ji tunebûnê û ji bêderfetiye, ji nava înkara kesayetiya kurd û jan û kulan ava bû. Me xwest em ji nav van jan û kulan enerjiya gelê kurd û bi taybetî enerjiya kînetîka ciwanên kurd derxînin. Em car·carina rastî zehmetiyan hatin, lê navê Koma Rewşen ji astengiyan natirse û wek zarokekî zîrek di nav hewldana afirandinê de ye. Afirandina Komê: Mazlûm û Sînan ji koro ya zarokan ve dest bi muzîkê kirin. Hevalê Weysî berî min, di dawiya 1996an de û ez jî 1997an de ketim nav komê û em heta îro jî bi hev re ne...

Divê em ji astengiyên ku hûn bahsdikin çi fahm bikin. Astengiyên ku di afirandina muzîkê (teknîkî) de derdikevin pêşiya we, yan astengiyên ku di jiyanê de hûn bi wan re rûbirû dimînin?

Pirsgirêkên mezin ji merc û şertên jiyanê derdikevin. Helbet pirsgirêkên teknîkî jî di afirandina berhemên me de derdikevin pêşiya me; lê belê pirsgirêkên herî girîng pirsgirêkên civakî ne ku roleke gelek mezin dileyizin. Ez dikarim weha şîrove bikim: em kesayetiyek cuda ji civatê ne, lê belê di eynê wextê de em beşek jî ji laşê civatê ne. Em çiqas ji wê (civatê) û ji pirsgirêkê wê birevin tê wê wateyê ku em ji xwe direvin. Ev pirsgirêka ku ez behs dikim pirsgirêka Kurd e. Me ev yek ji xwe re kir wek prensîpa bingehîn a Koma Rewşen. Me dixwest em sitranan bêjin ên ku daxwaza çareseriya pirsgirêkên mirovahiyê, daxwaza çareseriya ku ji bo aştiyeke here dawiyê dike be. Sitranên me ji bona ku gelê Kurd ji van pirsgirêkên ku ev nêzî sed sale bi wan re rûbirû maye xelas bibe. Derdê me yê herî mezin daxwaziya azadiya ji bona nifşên nuh e. Xwestina vê azadiyê tu carî xelas nabe. Taybetmendiya muzîka me jî ev e. Çiqas pirsgirêkên azadî, civakî û însanî hebin, emê jî biçin ser wan û bistrên.

Koma Rewşen di nav Kurdan de cara ewilî (wek Grûp)tarza “ Rockê” ceriband. Koma Rewşen dixwaze di rockê de çi bike?

Di Muzîka Kurdî de mînakên Rockê pirr kêm in. Cara yekem Koma Wetan dest bi ceribandina vî beşî kir. Ez ne şaşbim di sala 1974an de albumek çê kiribûn û bi dû re ji ber çavan wunda bûn. Ji bilî wan tenê Koma Rewşen tarza Rockê di nav kurdan de bikar anî. Ev ceribandineke nuh e û ez nikarim(di Rockê de) tarza me bi nav bikim. Ji ber ku heta salên 1980an di nav Rockê de cure cure tarzên din ava bûn. Lê ji 1980an û vir de tu cureyên din ên nuh ava nebûn. Hinek sentez hene lê celb nîn in. Mesela 53 cureyên Rockê hene û her yekî jî navê xwe daniye. Sound û tarza wan ji hevdû cûda ne. Lê em di nav van tarzan de li xwe digerin. Em dikarin vêya bêjin, lê ev lixwegerîna me li gora hestê me ye. Mesela niha di albuma me ya yekemîn “ASÊ “ de saunda Rock derketiye . Lê ez nikarim bêjim bi sedî sed em filan tarza rockê temsîl dikin. Di vê albuma me ya ku em nuha amade dikin ewê celba muzîka me eşkeretir bibe.

Cara yekem hûn kengî têgihîştin ku, hûn xwe bi Rockê baştir îfade dikin?

(Harûn) 1998an bû. Gava ez nuh ketibûm nav komê. Berê jî hestên min (ên Rockê) hebûn, hîna di dema min a şagirtetiya di Lîse yê de hebû. Min li gîtarê dixist.

(Mazlûm) Gava Koma me ya berê belav bû em ketin nav lêgerînekê. Me nedigot emê bi tenê Rockê çêbikin, lê me dît ku di berhemên me de tarza me berbi Rockê ve diçe. Yanî jixwe ber derket holê ku em xwe bi Rockê çêtir îfade dikin.

(Weysî) Di jiyana min de ji muzîkê pêve tiştekî din tune ye. Lewra em herdem li ser muzîkê dipeyivîn û em ketibûn nav gerînekê... Ev yek li ba min berî ku ez têkevim nav komê jî hebû. Min her celeb terzên muzîkê guhdar dikir. Lê tu tişt tama Rockê nedida min. Û her ku ez zêdetir ketim nav Rockê hewqas bêtir min jê tam stend. Dîsan xwesteka me ye ji bona ciwana afirandina muzîkek nûjen jî ez xistim nav pêlên derya ya Rockê. Me xwest em ji xort û ciwanan re tiştekî balkeş biafirînin. Herweha basgîtar jî sedemek gelek girîng e, ji bona bersivandina pirsa çima Rock. Ez dixwazim vê jî bêjim. Helbet reaksiyonên guhdarvanan pirr girîng in, lê ez rockê çêdikim, ji ber ku ez ji dil û can û bi kêf çê dikim. Rock zimanê min e. Hestên min tîne ziman.

Hûn temsîlkarên ciwanên Kurdan e. We berhemên xwe ji bona ciwanan amadekir . Gava hûn derketin ser dikê û we berhemên xwe pêşkeş kir, reaksiyona ciwanan çawa bû? Ji ber ku di nav ciwanan de çînên cûre cûr hene û herweha daxwazên wan jî cûda ne.

Di destpêkê de hinek reaksiyonên negatîv çêbûn, lê kêm bûn û ne yên zanistî bûn jî, lewra tu bandorek nerênî (negativ) neleystin. Piranîya rexneyan pozîtîv bûn û ev jî em di nav heyretekê hiştin, ji ber ku me hewqes reaksiyonên posîtîv hêvî nedikir. Bê guman em nikarin hemû ciwanên Kurdan himbêz bikin, lê em bi zimanê xwe (Kurdî) deng û awaza wan in. Daxwaza guherînekê di nav ciwanên kurdan de divê. Ciwanên Kurdan divê di civata navnetewî de danûstendinê bikin û xwe bidin nasandin.Xebata me jî ev e. Em dengê ciwanên Kurda ne.

Gelo Pirensîbên we hene?

Berî hertiştî Zimanê Kurdî. Ev pirensîba me ya sereke ye. Em jê tu carî tawîz nadin. Ev nayê wê manê ku em li ber zimanên din rêz nagrin ew jî dibê hêstekî fasîzane. Lê em bi zimanê xwe distrên û pê jî serbilind in...Prensîbeke din Azadîxwazî ye, prensîbeke din jî xwedî derketina xwezayê ye. Xwezaya însan (girî, ken, evîn) û xwezaya derûdorê jî yek ji tiştên ku em tawîz nadin in, ji ber ku ev yek bingeha aifirandina berhemên me ye.

Harûn, hûn li Edenê dimînin. Edena Bajarekî balkêş e. Ji ber ku ev bajar, wek Yilmaz Guney gelek navdarên Kurda afirandiye. Tê li ser Edenê çi bibêje.

Edena bajarekî taybet e, ji ber ku di navbera Kurdistanê û bajarên Tirkan de mîna wezîfa pirê dilîze û bajarekî kargeriyê ye.Yanî gelê me yên ku gundên wan şewitî, yên ku pirsgirêkên herî mezin dîtin destpêka yekemîn di nava revê de xwe gîhandin vêderê. Edene bajarekî germ e, hestên însên jî dikele. Ger tu binêrî, hunermendên ku Rocka Tirkî çêdikin, pirên wan ji Edenê ne. Mesela Ji bona Yilmaz Guney ez dikarim bêjim; ger wê demê şert û mercên wî hebûna ewê (ji sedî sed) filîmên xwerû bi Kurdî biafirandana. Lê mixabin di wê demê de derfetên wî tune bûn. Şoreşgerekî pirr mezin e. Lê ême em pirr bi şans in. Em di nav şer de gîhaştin, rewşa zimanê Kurdî ji wê demê pêşvetir e û hwd.

Armanca Koma Rewşen ya di pêşerojê de çi ye? Hûn dixwazin çi bikin?

Di serê me de heya 20 salên din jî projeyên me hene. Helbet di jiyanê de tu tişt ne mûtlaq e, lê projên me hene, em hîna ji muzîkê têr nebûn in. Heta em karibin emê bixebitin. Pirojeyên me yên navnetewî hene. Em dixwazin bighêjin netewên din û em bibin dengê Kurdan. Em li ser dixebitin û hewldidin.

Spas ji we re û di karê we de serkeftin...

Em jî spasiya te dikin.

RoniSterk@web.de



www.kurdistan.org

Ezdîtî bawarya heqyê, re'mê û Xwedênasyê ye

-beşê V-



Eskerê Boyik

Ronakbirê Ermenya yê sedsala 19 an Xaçatûr Abovyan sala 1845 an diçe nava Kurdan û du gotarên dîrokî derheqa wan da dinivîse: navê yekê KURD e, ya din ÊZDÎ. Sala 1848 a li bajarê Tilvîsê þojnema KAVKAZ da berê gotara Kurd, çend meh şûnda jî ya ÊZDÎ bi zimanê rûsî tên weşandin. Gotara ÊZDÎ da ew tê ser vê fikirê: „ Ev hemû me tînin li ser wê fikirê, wekî ev cimet (êzdî, E.B) dêwperest hatye navkirin tek rûyê wê yekê da, ku cimetên cînar li wana kirine e'ynat…Ew cime'tên cînar bi fanatîzma xwe e'yanin, k'emala qanûnê wane (êzdîyan. E.B) dînî fem nakin, loma jî nikarin bigihîjne wê felsefa moralyê…"(7)

„Eger em …bi heqî û dûrbînî bifikirin, wî çaxî emê ecêvmayî bimînin, ku ew çawane, wekî cimeteke waye nexwendî ya koçar (êzdî. E.B.) karibûye bigihîje fe'mdarya vî teherîye kûre zanyarî."(8)

Dagerkirên civak û olî, ku bêtifaqyê bikin li nav gelê kurd, welatê wan bin hukumê xwe da xweyîkin, ziman, çand û rohê miletyê di nav wan da bidin kuştin, çeka dîndijminatyê ya xetar çqas kêfa wan hatye bi destê fanatîk, cahil û xweyînên xwexatyê dijî kurdên êzdî dane kêranîn. Bi wan şer-şiltaxan mejûyê hinek kurdan bi afyona olê jerdadayî kirin e, alyê din jî xelqê bê sûc-guneh qir kirin e, mal-hal keda wan talan kirin e, şewitandin e, zimanê wan birîn e, welatê wan kirin e gola xûnê, cîyê zulm û zorê. Û bi wî cûreyî him Kurdistan, him jî bawarya ewdên Kurd hêdîhêdî dager kirine.

Lê êzdi çima heta niha jî nikarin rastya xwe biparêzin? Çima ji xebera xirav disilikin, dixeyîdin? Çima rastya dînê xwe nîşanî cihanê nadin?

Ya ewlin ewe kesî guh nadye dengê êzdiyan. Heta vê sedsala dewî jî, kê ji êzdîyan dengê xwe kirye bi devê şûr jê ra axivîne. Pelên dîrokê nîşan didin, ku kêmin ew mîrên êzdîyan, Extyarên Mergê û oldarên mezin ku bi mirina xwe ya xezayî wefet bûbin. êzdî jî mecbûr mane rastya xwe kesî ra nebêjin, xwe ker bikin.

Ya dudan çawa dîrokzanê Kurd Şekir Fetah* dibêje : „ Ev navê (navê dêw, xebera xirav) li dewyê xistine ser êzdiyan da ku wana pê bişkênin- çunku bawarya wan ji ya îslamê cihêye-mîna ku mele Yehya ê Mizûrî we kiriye, dema ku xweast tola xwe li malbeta mîrê êzdîyan veke, wilo xelk tê gehandin ku êzdî zendîq û kafirin, lewma bi navê ola îslamê fermana wan rakir."(9)

Ya sisyan qewata êzdyan, ne ya zanyarî, ne jî ya fîzîkî têrê nekirye ku bikaribin dijî qewat û fikirên dagerkir û desthilatdaran derên. Dewletên qewat, xweyê leşkerên giran, hîmê aborîyî mezin, û sîyasya deshilatdar, bêhesav zanyarên bawarmend, mejûyên bi aqil, Bi hezara dêr û mizgevtên di nav zêr û cewahera da pêçayî, bi mîlyonan fanatîkên nezan…êzdî ji civakeke nexwendî, feqîr, zêrandî, pelçiqandî, bê maf û bê pişt, Lalişeke wêrankirye, belengaz…Di vî halî da wê çawa dengê êzdiyan bihata bihîstin…

Niha sifet û rastya wê sîyasîyê rind tê xanê. Meremê hîmlî tenê tunekirina êzdîtyê nî bûye (şer ne seva dîn û bawaryê bûye). Merem asîmlekirin, tunekirina gelê Kurd, Kurdistanê bûye. Eger ew şer dijî êzdîtyê bûye, niha, dema sedî nodê Kurdan musulman in, çima dîsa dewletên ola wan musulmanî ye Kurda nayên remê, çima tu lîdêrekî weleten îslamê, tu hukumatek, dewletek, navda oldarên îslamê, zanyar û bawarmendên wan ne ku piştgirya Kurdan nakin lê neyartyê kurda ra dikin, xwestina wan ji holê rakirina gelê Kurd e. Çi ye sebeb? Ne Kurd jî musulmanî in?... Kurd tek seva mafê xwe yê îsanî şer dikin. Wanra yek nîne musulman çi milete, bi çi zimanî diaxive? Çima naxwezin dewletek musulmanî ya Kurda jî çê bive?

Min ji devê gelek meznên Kurdên êzdî bihîstye, dibêjin: Desthilatdarên Îreq, Tirkyayê, Sûryayê jî niha me (êzdyan) ra dibêjin, hûn êzdî miletekî belengazîn, hûn Kurd nînin, karê we bi Kurdan neketye, hûn nekevne nav vê dozê, dewa me bi wera nîne, Kurda ra ne…

Sedsalek-dudu berê dew bi êzdîtyê ra bû, niha jî dema taqet êdî êzdîtyê da nemaye û ruhê kurdîtyê di nav Kurda da hişyar û bi hêz bûye êdî berê xwe dane ne olê, lê kurdîtyê…

Dijwer nîne êdî bê dîtin, ku heta roja îroyîn jî cihanê da gelek hêz û girûp, usa jî dewletên xwe XWEDÊNAS divînin, di bin perda xwedênasî-heqîya dîndaryê ya sexte da qetil û qanên nemerivayê ye zulm dikin, bi wan „bawarî" û „alan" bi xûna evdên dilsax e bawarmend meremên xwe yên dagerkirinê, talankirinê, hêsîrkirin û qûlkirina miletan, pêk tînin…Gelê kurd qurbanekî sextekarya hukumdarên ROJHILATÊ ya bi dewranan e…

Hûrekurte xwendinek ji 12 Avdarê re

Serhan Isa

Bê guman em dê li ser 31 rojên meha avdarê bi xweşî, nexweşî, pirbûyer, û rola wêna di dîroka kurdî a kevin û nuh de nerawestin, çimkî ev karekî pir dirêj û profîsyonêl jê re divê.

12 ê avdarê weku bûyerek ji nişka ve (ji layê Kurdan ve) ew bi xwe lêxistineke kîberîkî û tirsnak bû ji layê Rêcîma Sûrî a Diktator ve, ku ev Kuştargeh weku pilan (projekt) di tarîodeyên hêzên xwe yên Istixbaratî û bi alaîkariya bermayên rêcîma Baisa Iraqê a têkçû ku li cem xwe veşartîne amadekirin.

Ji hilbijartina roja bûyerê (dem û cî Qamişlo) ku dê bûyereka werzeşî de di nava Tîpa Cîhad û a Fitiwê a Dêrazorê de bihate'li darxistin, diyar bû ku ew projikteyek jêre amadeyî hatibûn kirin.

Û rêcîma Sûrya yê tu carî bawer nedikir ku dê milet Kurd vê bersiva mêrane bide û hemî pilanên wêna riswa û şermezar bike.

Icar gelo 12 ê avdarê weku dawîtirîn bûyer di dîroka kurdî de, Serhildan

bû an jî bûyerek bihevçûnêbû?

Yê ku ji nêz ve rojnamegeriya kurdî û tevger û leptên tevgera siyasî a kurdî li Kurdistana Sûrî şopandi be ji 12.03.05 tanî roja îro dê bibîne ku ta di vir de jî nelihevkirinek di navbera hêzên siyasî xwe bi xwe de ji layekî ve, û di navbera çîna rewşenbîr, nivîskar û siyasetmedarên serbixwe xwe bi xwe de, û di navbera wana û tevgerê de jî ji layekî dîtir ve hatiya holê?!

Gelo sedemên vê nelivêhevkirinê çine?

Bi gumana min yên ku ne di xwestin û (naxwazin) ku navê Serhildanê li vê bûyerê bikin, ew ji layekî ve kêmûkasiyek di têgihştinên wana yên rewşenbîryane û siyasî de hebû. Di-xuye ku ewna cudabûna di navbera bûyerk bihevçûn û Serhildanekê de, ji êk û din nas nakin, û ev bobelateke mezin e dema asta têgihştina çîna siyasî û rewşenbîrî bi vê sewiyetê bê (mebesta min yên ku ne dixwestin ku bûyera 12 Avdarê weku Serhildan bi nav bikin).

Bûyerek bi hevçûnê çê dibe di navbera du kesan de an jî çend kesan de û carcaran fereh dibe û di orta du êlan de an jî du gundan de jî di qewime, sedemên qewimîna bûyerên wisa jî piraniya caran tiştin pir pûçik û lênehêjane.

Lê 12 ê avdarê bi her hal tu carî nayête pîvan bi tiştên wisa re. Ew bi hemî wateya xwe a bûyerî a siyasî a civakî a herêmî a netewî Serhildaneke herî mezin û pîroz bû.

Sedema dudiwan Tirs e. ango bi wateyeka dinê razîkirina aliyê din?!! Û em vê yekê baş dizanin û dîroka tevgera siyasî a kurdî li Sûryayê tije mînakên beloq e. Bê guman buhayên vê razîkirinê jî hene ew jî ku ew kesên xwediyên van helwestên newêrek û ne welatparêz bi vê yekê

hebûna xwe weku kesayetî di hundirê partiyên xwe de diparêzin û ji layekî dîtir ve hebûna partiyên xwe diparêzin, ango çîrok bi tevayî berjewndiyên pîsik, û demikîne; lê ziyana herî mezin bê guman di aliyê din deye, ew jî ku pirsa xwe weku netew û welat ditavêjin bazarê.

Û bi vî awayî çavên xwe ji her tiştî miç dikin û ji wana were kesek wan nabîne, guhdar nake an jî nabihîze.

Ragehandina Kurdî bi hemî cureyên xwe ve hewil dan ku bi erkên xwe weku alavên ragihandinê rabin, lê ha ji min were ku piraniya wana bi vê yekê weku roleka dîrokî neramiyan, û dengê Serhildanê weku Serhildan hem jî weku pirseke netewî li qada navnetewî bi wî rengê pêdivî nehate belavkirin, di vir de merov dikare çend pirsan ji xwe bike gelo çend gotar, lêkolîn û hevpeyivîn di alavên ragihandina biyan de) li ser Serhildanê hatin belavkirin?

Gelo yên ku girêdayê partiyan bûn (an jî tevgera Siyasî, eger em çendekan jê vê nirxandinê bidin alî) Serhildan bi çi rengî ragihandin?

Xala herî giring û pêwîst jî, ku tanî nuha hemî tiştên Serhildanê nehatin ragihandin (tiştên ku di sewrhildanê de qewimîn û rûdan) çi ji layê miletê Kurd ve û çi ji layê Rêcîma Sûrî a Diktator û faşist ve ragihandin MED ya Cîhanî, her yekî tiştek di got, bala xwe bidin dawîtirîn gazînameyên partiyên kurdî yê ku bi helkeftina sal vegera serhildanê hatine belav kirin, tanî nuha hîna lihevkirinek li ser jimara kuştî, birîndar û girtiyan tune ye.

Lê hêviya min weku kurdekî ew e ku rojekê nêzîk ne dûr Ragihandineka Kurdî bi şêweyekî sêsêmatîk bête damezirandin ku bibite deng Kurd li ser rûkê vê zemînê.

Ez weku kurdekî hem jî weku merovekî xudan serpêhatiyeke siyasî

Bawer nakim ku tevgera siyasî a Kurdî bi vê reş û temtêlê dê karibe bersiva xwe, milet û demê bide, bi rengekî ji rengan çi di warê perwerdeya siyasî, civakî û rewşenbîrî Tevger siyasî a Kurdî tê birayê biçûçik ji rêcîma Sûryayê re, tevgerek hêviyên guhartin û rêveberiyê tête pir kêm bûne. Û ew parçe kirasê mayî jî yê ku tazîbûna xwe pê dinixumand Serhildanê 12 Avdarê ew jî, ji ber wêna kir.

Dema agirê Serhildan kur bû, û piştî Serhildanê û tanî nuha jî hîna tevgera Kurdî li rêza paşê maye û ji xewa xwe a dîl, giran û tirsnak hişyar nebûye, rêber, êzing û birêvebirê Serhildanê Miletê Kurd bû.

Îcar evê tevgerê û ta radeyekê jimarek rewşenbrî û nivîskaran jî helwestek dan ku dibe ciyê pirseke mezin, dema ku gotin û dibêjin ku tevger û milet ji vê Serhildanê re ne amade bûn? Bê guman merovekî ku ji rewşa miletê Kurd li Kurdistan Sûrî û a tevgera siyasî agahdar be, dê bibîne ku ev helwestekî siyasî cûtî û pir xave; wekî ku me li jor jî destnîşankiriya raste (tevgera siyasî) ne amade bû ji ber tu carî ew ji bo tiştekî wisa û dibe hîna biçûktir û kêmziyantir jî amade ne bûye, û bi her hal ev kar ne li gor daxawaz û hêviyên wêna bû, çimkî ew bi yek carê hate hetikandin, lê miletê Kurd bi gumana min jê re amade bû, bi dehhezaran derketin kolanan, bi dehê Pakrewanan kirine qurbanî ji bo Serhildanê, bi sedê birîndaran û bi hezarê girtîyan pêşkêşî Serhildanê kirin.

Pirsa dinê a ku gerek merov ji xwe bike, gelo pêşniyaz, projekte û hêviyên xwedanên vê helwestê ji miletê kurd bi çi rengî bûn û amadekirina çawa dixwestin? di Kurdistana Sûrya yê de şerekî çekdarî merov nikare bike! û ne jî miletê kurd karekî wisa li ser xwe dipejirîne, ji ber tanî roja îro jî em doza xwe bi rengekî, birayetî, demukratîk û aşîtiyane dikin.

Lê bi her hal Serhildana 12 Avdarê bi qêrîna yekemîn re Erş li Şamê hejand, û rêcîma Sûrî û hemî hevaldost, hevalbend û dûvikên wêna hecinandin û hemî dîwarên tirsê yên ku rêcîma Faşist ji pola avakiribûn bi destê jina kurd berî mêrê kurd û bi destê zarokên kurdan berî kalemêran hate herivandin, û perdeya reş a ku rêcîmê dabû ber çavê xwe ji serûcavan anîne xwar.

www.kurd.org

Jinekolog, mêrekolog, dînekolog Prof. Doc. Dr .
Fatê Were Civatê



Şêxbat

Xaltîka Fatê, wey agir bi malê ketê rebbî. Hey porkurê, ev îro çend ro tu hema dev tavêjî jinên Ruhayê ma tu ji bavê xwe fedî nakî qey! Çima ma em jinên Ruhayê çawane? Çavê te barnabe nee! Ê keçko tu bêjî bedewbûn, li cem me heye. Tu bêjî qelewbûn, li cem me heye. Tu bêjî hewîtî, li cem me heye. Tu bêjî bejnûbal, ji 90 cantîmî heta bi du metroyî heye. Ê naxwe tu çi ji me dixwazî çavnebarê!? Te go tu nimûnê dixwazî? Aaa, ahaaa ma Fatoşa me çawa ye? Xuşka serokê Konfederalîzma me ye, nûr ji ruwê wê dibare, têra xwe bi goşt e, kare deh malan rake û deyne, ma ev ne bes in!? Wele bi serê te, Fatima Muxribî avê li destê wê dike. Ma ne wilo ba, Leyla Nezan destê wê maçî dikir? Xelkê destê wê radimîsî hêêê! Çima destê wê radimîsin ma tu zanî? Ji ber go ji Ruhayê ye haa! Biner aqlê xwe bide serê xwe ne go ez bêm bi gijola porê te bigrim û li dû xwe bigerînim haaaa!

Fatima nûrjêbaryayî / Ruha

Hayloo, hayloo, hayloo, ev çi malxirabiye yahooo! Keçê Fatima jahrjêbaryayî, ma ez rabim vî navê Fatê ji ser xwe bavêjim ne heqê mine qey hêê! Ma lao qey nav li dinyayê qelyabûn go min rabû ev navê bêoxir li xwe kir yaoo! Fatima Muxribî, Fatima jina Eliyê şêr, Fatima Ocalan, dîsa Fatima Ocalan, Fatima Girik, Fatima jina qeraşê gund, Fatima Ereb, Fatima lêvdeqandî, errrrrreeekkkk! Ê lao welle xebera te ye! Tu bêjî bedew bedew, tu bêjî bejnûbal, nauzûbîlla du metro, tu bêjî tenik û zirav, maşelleh wek tayê rihanê, tu bêjî çav û poz û lêv û diran, xwedê bistirîne wek horiya bibuştê ye! Ê ji xwe wê Leylikê Leylanê destê wê mankênê maçîke te serê min xwarê! Leylokê li qilafetê xwe û li yê wê dinere, rebenê li ber wê dibe wek bûka mişk! Ê ji xwe xuşka netewiya konfederalîzmê ye, wek bilbilê çilziman e, baş zane tepkên sergîna çêke, ê ma ji wilo bêhtir wê rebena Fatîme xanim çi bike yaooo! Kî dibê Fatoşa te ne bedewe? Welle bi serê min û te Monîka Lewînskî, Sophia Loren, Turkan Şoray, Tansu Çiller li ber wê wek tenya binê beroşê ne. Îcar go ala Tirkan jî di destê wê de be, bê wê çi pêkeve peppûkê! Ka jinên wilo, xwedê wê bistirîne rebbîî!

❁❁❁ ❁❁❁ ❁❁❁

Xaltiya Fatê gene ben, Xançepeklî Mihê! Nasilsan iyimisan?Yaoo, bugin Diyarêbekir de Newroz qutlamalari oldî, ma dê weledê xwe avêt haaa! Ma kîmler yoxtî kîmler! Bakirxan, Leylokê, Îbram Acises, Pîro Haco, Gulîstan Werwer û vardî û hey vardî haa! Soninde bir welwele qoptî, herkes bîrbîrînî bastî we qiyamet gîbî bîr şey oldî. Yao sordim, ne oldî ne oldî, bîr qebrax dêdî welle Serokin ablasî Fatê xanim teşrîf ettî. Ben de sevindim dêdim herhalde bîzîm Fatê were civatê Ewrûpeden geldî. Baxtim herkes sireye gîrdî, dora tenûrê gîbî ristik oldî. Bende ristike gîrdîm. Gelen Fatênin elînî opî, gîden opî. Sire bene geldî, bîrez yaxlaştim baxtim etrafa çox kotî bir qoqî yayildî. Îçîm dişima çixtî. Wellehîlezîm ben elînî opmeden Newrozî terk ettim ve lingo bi qurbano dedim ve gittim Dîclenin suyun de kendîmî helal ettim. Sonre bu qoqîyî analîz ettim, baxtim bu qoqî "Demokratîk Cimhûrîyetin qoqîsîdir". Welle bi serê te, heft qalib sabûnle yixandin hala qoqîsî gîtmemîştir. Aceb sence çaresî nedir?

Xançepeklî Mihê / Amed

Yao Mihê, oxlim nezaman senden qûrtûlacagim jî bo xwedê? Sen başimin belasimisen yaooo! Oxlim başimi belaya mi soxmax îstîsen? Leylokê Fatênin elînî optî, ava zemzem gibi pak û mak oldî ma sene ne oxlim! Ê sen de elînî opeydin belkî Leylokênin sax qolî olirdin yaoo, sen de hîç îşînî bîlmîsen haa! Ê sen de Baqirxan gîbî dêseydin "Tirk bayraxî bîzîm de bayraximizdir" ma dinya bozilacaxtî! Senî boşine mî Xançepek berpirsiyarî yaptix oxlim? Ulusal ablanin elînî operken burninî çekmeseydin hey ehmeq! Ma bu firset bir dehe gelîrmî yaoo? Koskocaman Îbrehîm Xelîl diyarinden, Îmralînin dergahinden ve de Demoqratîk Tirk Cimhûrîyetinden melek û horîler gelî ve sen elînî opmîsen! Yao sen cahelsen cahel! Oxlim sende bu aqil oldixî sûrece bû kotî qoqîden qurtilemezsin. Ne heft qalib sabûn, çil tenûr nan de yesen bu Demoqratîk Tirk Cimhûriyet qoqîsinden qûrtilemezsin. Bu kotî qoqîden kurtilmenin bîr tek yolî vardir, ode şûdir: Arqanî Anqaraye dondirecaxsan, Anqarayi hedef alacaxsan ve gunde 40 sefer osuracaxsan. Yanî Tirko zehîrîne qarşî Kurdonin panzehîrînî qullanacaxsan, anladinmi oxlim Mihê!?

fate@peyama-kurd.com

Xaçerêz

Serejêr

1. Rayedar, xwedîgotin 2. Zanyariya bedena mirov / bi zimanê Ewrûpî Yekîtiya Ewrûpa 3. Qelp, sexte (paşûpê) / mirîşk, çîçik / yan, yan jî 4. Nûjenî, hewesa demî / istîfaname, devjêberdan 5. Na, nexêr (paşûpê) / du tîp / karîyer, pozbilindî (paşûpê) 6. Hoste, mamoste / bajarekî Japonyayê (paşûpê) 7. Hekwest, îrade, xwestek (paşûpê) / nûner, destgul 8. Pê re ye, li ser e (paşûpê) / navê masiyekî 9. Pûş û giyayên bêfêde, paqijkirin (paşûpê) / derence, bergeh / yan, yan jî. 10. Kokkirin, rastkirin, wekhevkirin.



Çeperast

1. Her hebe, noşîcan be / mirov, zilam, mêr 2. Navê welatekî asyayê 3. Navekî mêrên Ereba / navekî jinan 4. Du tîp / şerm, fedî / aletek muzikê 5. Dirinde, bejî, kovî / welatekî Afrîkayê 6. Lîstikek 16 kevirî (paşûpê) / bûyerek xwezayî, hewa / namûs, agir, xîret 7. Ji pareyên Îtalî re dihat gotin / bêhna xweş 8. Deng, stran / çêbû, xuliqî (paşûpê) / tu, çu, ne tiştek 9. Kesê ji teknîkê fêmdike 10. Hejmarek / serbestî, rizgarî 11. Asîman, ezman (paşûpê) / xwarinek 12. Danişe, fermana rûniştinê / helbestvan, hunermendê gel.

Bersivên hejmara berê

Çeperast
1. Îdeal / eman 2. Kurdistan 3. Tedî / ta / ra 4. Olê / sertor 5. Ml / benîşt 6. Oland / 7. Îna / aras 8. Samî / ademî 9. Ava / îrefac 10. Yasemîn 11. Înoham / sor 12. Şîlane / ene

Serejêr
1. Îktom / asayiş 2. Duello / avanî 3. Erdê / îmasol 4. Adî / banî / eha 5. Li / sena / îman 6. Stend / arîme 7. Etarî / aden 8. Ma / tşîref / se 9. Anrot / amazon 10. Ar / nsîc / re

Remldank



Beran (21.03-20.04)
Di nava xeyalan de nemînin. Hûn dixwazin xeyalên xwe jîndar bikin. Ne tenê li xwe, guhdariya hinekan din jî bikin.



Gamêş (21.04-20.05)
Li evîn û hezkirinê miqate bin. Hûnê rastî yekî/yekê bên. Hinekî rê bidin ber jiyana xwe.



Cêwî (21.05-21.06)
Hûn gelekî bi aram û qewîn in. Karên mêrane dikin. Qezenca peran girêdayî hewldana we ye.



Kevjal (22.06-22.07)
Serberdayî û terale negerin. Ji bo pêşeroja xwe bixebitin. Evîn û evîndarî heye, ne dûr e.



Şêr (23.07-22.08)
Hesûdî û dilreşiyê ji dilê xwe bavêjin. Dilê Jina/mêrê / xwe nehêlin, ji hev piştrast bin.



Simbil (23.08-22.09)
Bi xwe bawerbin, li hêviya hesî nemînin. Hinek dixwazin we ji rê derxin, haydar û miqate bin.



Mêzên (23.09-22.10)
Di karê pîşe û evînê de pêşketin heye. Fersendan bernedin. Bi aqil gavên xwe bavêjin.



Dûpişk (23.10-21.11)
Hûn guhdariya hevalên xwe dikin û ji wan re alîkar dibin. Hûn jî dixwazin bên hezkirin û pesinandin.



Kevan (22.11-21.12)
Meha Îlonê li we tê. Hûnê mirovên nuh binasin. Hûnê di pîşeyê xwe de bi pêş Kevin.



Kovî (22.12-19.01)
Bext û siûda we heye. Di zanîna armanca xwe debin. Rê li ber we heye. Pişta xwe nespêrin kesî.



Satil (20.01-18.02)
Wê rewşa aborî baş bibe. Hûn destvekirî û comerdiyê dikin, dixwazin alî dostên xwe bikin.



Masî (19.02-20.03)
Hûn derûdora xwe dêşînin. Dilê dost û hevalên xwe nehêlin, wan ji xwe bidûr nexin.

Zelal

ava sêvên xelatî



Navend:
Trink-Zel (Köln)
Tel.:0221 376 24 05

Bayiyên Zelal

AKCAN GmbH (HAMBURG)
Tel.: 040 723 402 96

LIZA GmbH (BERLIN)
Tel.: 030 390 380 30

ESD Softdrink GmbH (MANNHEIM)
Tel.: 0621 318 76 70

TRINK-ZEL II (DÜSSELDORF)
Tel.: 0211 49 62 150

CAN GETRÄNKE (ESSEN)
Tel.: 0201 289 74 17-18

TRINK-SEM (DORTMUND)
Tel.: 0231 981 86 23

HARRAN GmbH (FELLBACH)
Tel.: 0711 592 08 64

CHAPLIN GETRÄNKE (BREMEN)
Tel.: 0421 691 96 78

EURO-FRESH-FOOD GbR (ERFURT)
Tel.: 0361 26 27 516

TRINK-ZEL I (KÖLN)
Tel.: 0221 977 63 11

NERGIZ
Tel.: 02562 22 168

پاڵەوانێکی کورد لە چەند دێڕێکدا



سەلاح عەبدوڵلا ڕەمەزان و مامۆستاکەی Mr .Ji Joung ku

وەرزشوانی یاری کۆنفۆ "سەلاح عەبدوڵلا ڕەمەزان" لەدایکبووی شاری سلیمانی باشووری کوردستانە، هەر بەمندالّی ئارەزووی مەشقکردنی کۆنفۆی کردووە. بۆیەکەم جار ساڵی ١٩٨٨ لەژێر چاودێری مامۆستا "خالید ڕەئوف محمد" دەست بەمەشق کردن دەکات لەیاریگای سلیمانی. دوای ماوەیەکی کەم بەشداری لە پاڵەوانییەتی عێراق دەکات لەڕۆژی ١٩٨٨/٦/١٢ پلەی یەکەمی عێراق بەدست دەهێنی.

دوای ماوەیەکی تر، بە چاودێری مامۆستا خالید پشتێنی ڕش بەدەست هێنا لە یاری کۆنفۆدا. لە ساڵی ١٩٩٤دا، بەشداری لە پاڵەوانییەتی عیراق کردووە لەیاری تایکواندۆ، پلەی پاڵەوانی عێراقی و لە پاڵەوانیەتی نێودەوڵەتی عێراق، پلەی دووەمی عێراقی بەدەست هێناوە. هەروەها لە ساڵی ١٩٩٤ دەچێتە وڵاتی ئوردن درێژەی بەمەشق و ڕاهێنان داوە وەکو ڕاهێنەر لەیاری تایکواندۆ وکۆنگ فۆ.

"سەلاح عەبدوڵلا ڕەمەزان" لە وڵاتی ئوردن بەشداری کردوە لە خوولێکدا بۆ بەدەست هێنانی پشتێنی ڕەش لەیاری **kik Boxing** و توانیویەتی بەسەرکەوتویی پشتێنی ڕەش بەدەست بهێنێت. پاش ماوەیەک چۆتە لیبیا. لەڕێگەی لێژنەی ئۆلۆمپی لیبیاوە بووە بەسەرپەرشتیاری ڕاهێنەراکانی لیبیا لەیەکێتی کونگ فۆی و وشودا لەژێر چاودێری بەشیر قەرازاوی کە سەرۆکی یەکێتی کۆنگ فۆی وشوو بوو توانیویەتی بڕوانامەی ڕاهێنانی کۆنگ فۆ بەدەست بهێنێ. پاش ماوەیەکی تر چۆتە وڵاتی تونس بڕوانامەی ڕێزنانی لە لایەن مامۆستا هاراڵحبیب عبدالجلیل کە ڕاهێنەری تایکواندۆ بوو، بەدەست هێنا. لە ساڵی ٢٠٠٢دا، پلەی یەکەمی ئیسپانیا .بەدەست هێنا و لە لایەن ڕاهێنەر **Clemente Lindins** یاری کردوە هەروەها بەچاودێری ئەو بەشداری لە خوولی مەشقی پۆلیسی و پاسەوانی تایبەتی کردوە و بڕوانامەی بەدەست هێنا. هەروەها لەژێر چاودێری مامۆستایەکی بەناوی **Mr .Ji Joung ku** چوار پشتێنی ڕەشی لە لایەن یەکێتی کیکمت وانی جیهانییەوە بەدەست هێناوە. هەروەها لە ساڵی ٢٠٠٤دا، بە بەشداری لە پاڵەوانییەتی **Copa de Europa** ، پلەی سێیەمی بەدەست هێناوە.هەر لە هەمان پاڵەوانییەتیدا، یەکەمی ئەوروپای بەدەست هێناوە لە یاری کاتا، واتە جولە.

ئێستا خەریکی مەشقکردنە لەگەڵ یانەیەک بەناوی یانەی **Apolo** کەتایبەتە بە **kik Boxing** و ڕاهێنەرەکەی **Javier Muno** یە.

عەبە شەکەنەتان لە بیرە؟

زەردەشت

لە شەستەکانی سەدەی ڕابردوو، عەبە شەکەنە یەکێک بوو لەو ڕووخسارە بەناوبانگانەی شاری سلێمانی. لەگەڵ ئەوەی کە لە ڕووی دەروونی و ئاوەزەوە تەواو نەبوو، بەڵام بەوەشەوە شێوازێکی خۆی هەبوو بۆ گەیشتن بەو ئامانجانەی کە دەیەوێت. عەبە شەکەنە پیاوێکی بەخۆ بوو، دەم و چاوێکی تا ڕادەیەک خڕ و لوتێکی پانەوە بوو لەگەڵ دوو چاوی نیمچە خەواڵووی هەبوو. هەمیشە شرواڵ و مراخانی لەبەردا بوو. ئەم کابرایە وەک هەموو هاوشێوەکانی خۆی بەدەست مندااڵنی سلێمانییەوە زەلالەتی بوو. لەهەمان کاتیشدا خەڵکی گەڕەکەکانی سلێمانی زەلالەتیان بوو بە دەستییەوە. عەبە شەکەنە زۆر کات کە لە گەڕەکە جیاوازەکانی شاری سلێمانی دەگەڕا، داوای پارەی دەکرد، کاتێکیش پارەیان پێ نەدایە، ئەوا ڕاستەوخۆ دەگریا. گریان ئەم کابرایەش بەڵای خەڵکی سلێمانییەوە پێ و قومێکی زۆر خراپی بە دواوەوە بوو، چونکە لە هەچ گەڕەکێکدا بگریایە ئەوا ڕووداوێکی خراپ لەوێ ڕووی دەدا. هەربۆیە بەهەر شێوەیەک بووایە چی بویستایە پێیان دەدا و خۆیان لە بڵای گریانەکەی لادەدا. شایەنی ئاماژە پێکردنە کە دەنگی عەبە شەکەنە لە کاتی گریاندا تا بڵێی ناساز و ناخۆش بوو. ماوە ئەوەش بڵێین کە چەندەها ڕووداوی دڵتەزین و ناخۆش لەو شوێنانە ڕوویان داوە کە پارەیان بە کاکە عەبە خوالێخۆشبوو نەداوە. من بۆ خۆم گەواهی دوو کارەساتی ناخۆش بووم لە گەڕەکی دەرگەزێن لە سلێمانی و ئەوانەی کە هاوچەرخی ئەم زاتە بوون پێم وایە زۆر شتی لەم بارەوە لێدەگێڕنەوە. ماوە ئەوە بڵێین کە عەبە شەکەنە ئەو پارانەی کە لە خەڵکی داوادەکردن بۆ " پیرۆز"ی دایکی بوو. هەمیشەش دەیگووت ئەگەر پارە نەبەمەوە پیرۆز دەرم دەکا.

بەکوردی بدوێ، بەکوردی بخوێنە، بەکوردی بنووسە، بەکوردی بیربکەرەوە!

بەرهەمێکی تازەی هونەرمەند نەجمەی غولامی



هونەرمەندی ناوداری کورد کاک نەجمەی غولامی دواترین بەرهەمی **CD** بەهاوکاری ستۆدیۆی چوارچرا بڵاوکردەوە لە ژێرناوی (نیشتمان) لە ناوەڕۆکدا 9 بەرهەمی گۆرانی تازە بەخۆوەدەگرێت. نیشتمان ، جیران، سۆزی دڵ ،شوعلەی عیشق، شیرین دامەچۆ ،بەهاری دڵ شکاو، بشەم ،ئەسیر، خەونی خۆش،

ئەوەی خوازیاری ئەم بەرهەمەیە دەتوانێت بەم ژمارە تەلەفۆنە پەیوەندی بکات 004613134467 بەناوی پەیامی کورد پیرۆزبای لە عاشقانی دەنگی بەسۆزی کاک نەجمەی غولامی دەکەین بۆ ئەو بەرهەمە نوێیە.

پەیامی کورد ئامادەی بڵاوکردنەوەی ریکلامەی بازرگانی و بروسکەی پیرۆزبایی و پرسەنامەیە بەنرخێکی گونجاو





P.E.N a Kurd komcivîna xwe li Amedê çêkir

Peyama Kurd

Pirsgirêkên Kurdan yên siyasî ne bi tenê di nava partiyan de, lê belê di nava rewşenbîr û nivîskaran de jî dibin sedema perçebûnê. Ev demeke dirêj e ku di navbera rayedarên Navenda PENa Kurd ya li derveyî welat û ya Amedê de pevçûneke devkî dibe. Navenda PENa Kurd ya ku li Almanya dibin serokayetiya Dr.Zerdeşt Haco de tê birêvebirin, di kongreya xwe ya sala 1999an de biryar girt ku şûbeyên xwe li her çar beşên Kurdistanê veke û wan gava yekemîn li Amedê avêtin. Bi armanca hembêzkirina nivîskarên Kurd yên li welat di 7ê Sibata sala2004an de şûbeyeke PENê li Amedê hat vekirin. Li gora Zagona Bingehîn ya Tirkiyê komele, rêkxistin an jî saziyeke ku li derveyî sînorên Tirkiyê xebatê dike, nikare şax an jî bîroyeke xwe di nava sînorên Tirkiyê de veke. Ji ber vê yekê PENa Kurd li Amedê li gora zagona komeleyan weke komeleyekê hate birêkxistin. Piştre şûbeya Amedê xwest bêyî destûra PENa Kurd û ya Navnetewî dibin navê PENê de li Amedê bi awayekî serbixwe dest bi xebatê bike. Wê demê serokê şûbeya PENê ya Amedê Edîp Polat bû û wî ew şûbe weke Navenda PENa Kurdî îlan kir. Ev yek bû sedema nezarîbûna PENa navnetewî û Navenda PENa Kurdî ya li Almanya. Piştî Edîp Polat, ji bo kurtedemekê Sedat Yurttaş bû serokê şûbeya Amedê û wî da zanîn ku ewê navê PENa Kurdî bi kar neynin, lê belê pêwîste PENa Kurdî ya li Almanya bi çavê şûbeyeke xwe li wan nenere. Hêjayî gotinê ye ku di vê navberê de careke din serokê şûbeya Amedê hate guhertin û li şûna Sedat Yurttaş, vê carê Serkeft Botan hate hilbijartin. Lê belê pirsgirêkên di navbera PENa Kurdî û şûbeya Amedê de bi guhertina serokan nehatin çareser kirin. Li gorî gotinên serokê şûbeya Amedê yê niha Serkeft Botan, sedemê van pirsgirêkan Navenda PENa Kurdî ya Almanya ye. Li gora Serkeft Botan cihê PENa Kurdî ne Almanya lê belê Amed e û heger ev pirsgirêk çareser nebe ewê dosyeyekê bi îmzeya 30 nivîskarî ji bo doza endametiyê pêşkêşî PENa Navnetewî bikin. Çavdêrên serbixwe dibêjin ku birêvebiriya şûbeya Amedê di aliyê siyasî de nêzîkî PKK ne û ew dixwazin navenda PENa Kurd ji bo hinek armancên siyasî bi destê xwe ve bînin. Ji bo agahdariyên berfereh Peyama Kurd xwe gihande Serokê PENa Kurdî Dr. Zerdeşt Haco ku ji bo Konferansa Zimanê Kurdî li Amedê bû. Zerdeşt Haco bi riya telefonê ji me re da zanîn ku şûbeya Amedê bê xebera wan



name dişandin ji PENa Navnetewî re û dixwestin ku şûbeya Amedê weke Navenda PENa Kurdî were naskirin. Ev nameyên şûbeya Amedê ji aliyê sekreterê PENa Navnetewî ve ji bo Navenda PENa Kurdî ya li Almanya dihatin şandin û ew bi vî awahî agahdar dibûn ku şûbeya Amedê dixwaze dest li ser PENê deyne. Serokê PENa Kurdî Zerdeşt Haco dide xuyakirin ku pêwîstî bi çêkirina çend navendên PENê nîne û PEN ne bi tenê saziyeke wêjeyî lê ew her wiha saziyeke dîplomasiyê ye jî, lê belê hevkarên wan yên li Amedê naxwazin vê rastiyê bibînin. Haco, dibêje "çênabe ku 3-4 PEN hebin, em li gel hevkarên xwe yên li Amedê dibin çavdêriya nivîskarê Kurd Mehmet Uzun de rûniştine û me gotûbêja vê yekê kiriye. Em li hev hatine ku yek PENa Kurdî hebe û di kongreya Adara 2006an de biryar were girtin ka wê navenda PENê li ku be. Jixwe daxwaza dilê me teva ye û pêşniyara min bixwe bû ku em navenda PENê bibin Amedê. Lê belê li gora min niha derfetên vê yekê tune ne. Dewleta Tirk kîjan dema bixwaze dikare deriyê bîroya PENê bigre û xebata wê asteng bike. Biraderên me yên li Amedê nikarin xebata Kurdistanî bikin û ew li gora destûra PENa Navnetewî nikarin bibin endamê PENê jî. Di destûra PENê de dibêje "ew nivîskarên ku di nava civaka xwe de navdar in û xwediyê berhemên wêjeyî ne, dikarin bibin endam". Biraderên me yên li Amedê negihane vê astê û yên wisa di nava wan de pêde nabin. Ez naxwazim asta xebata wan daxînim, lê tiştê ku wan kiriye têrê nake ku ew bibin endamê PENa Navnetewî". Di nava axaftina xwe de Zerdeşt Haco got ku piraniya wan kesên ku doza PENa Kurdî dikin hîna ne endamên PENê ne. Di dawiya axaftina xwe de Haco, ji rojnameya me re da zanîn ku ewê heta kongreyê xwe yê 2006an li gel şûbeya Amedê bixebitin û heta wê demê Navenda PENa Kurdî li Almanya dimîne. Wê birêvebirên PENa Kurdî roja 25ê Adarê piştî Konferansa Zimanê Kurdî, ji Amedê derbasî Başûrê Kurdistanê bibin û li wir jî ji bo danîna bingeha şûbeyeke PENê bi nivîskarên Kurd re gotûbêjê bikin.

PENa Kurdî heta ku serbixwe be ewê bikaribe xizmeta danasîna gelê Kurd bike û xwedî li mafên temamê nivîskaran derkeve. Lê heger ew jî weke piraniya saziyên Kurdan têkeve bin sêwana partiyeke siyasî û bibe malê çend kesan, wê nikaribe berpirsyariya xwe bi cî bîne. Saziyên weke PENê malê civakê ne, pêwîste nebin malê partî û rêkxistinan.

Dengbêj Seydo çû ser dilovaniya xwe



Hilden-Almanya/ PK/AVESTA

Li Almanya bajarê Hildenê dengbêjê Kurd Dengbêj Seydo, di encama nexweşiya kansêrê de roja 23.03.05an çû ser dilovaniya xwe.

Bi çûyîna Dengbêj Seydo, dengbêjiya Kurd hostayekî mezin wenda kir.

Dengbêj Seydo di sala 1942an de li gundekî girêdayî Xinûsa Erzirumê ji dayîk bûbû û ji sala 1969 û vir de li Almanya dijiya...

Wê termê rahmetî li Kurdîstanê, bê veşartin. Bıla ruhê wi şad be, serê malbata wî û serê gelê me sax be.

Weşanxaneya Dozê sê pirtûkên nû derxist



Beşê duyem a pirtûka Birêz Mesût Barzanî di Sibatê de dîsa ji aliyê Weşanên Doz ji bo xwendevanan hat pêşkêş kirin. Ev beş nêzîkî 600 rûpelî ye û ji serhildana sala 1961ê dest pê dike. Bi pirtûka yekem jî dîroka Barzanî yê nemir ya heta serhildana 1961ê ji bo xwendevanan hatibû eşkere kirin.

Pirtûka Hasan Yildiz a bi navê "Yekitiya Ewrûpa, Tirkiye û Kurd" 184 rûpele û di Çileya Pêşîn a sala 2004an de ji aliyê Dozê hatiye weşandin.

Ev pirtûka Etem Xemgîn di Çileya Paşîn a sala 2005an de ji aliyê Weşanên Dozê hatiyê weşandin û du sed rûpelî bêtir e.





Hûn dikarin van pirtûkan ji **„Peyama Kurd"** bi dest xin.

email: *info@peyama-kurd.com*

Koma Kamkaran li Roma bû



Roma - Koma Kamkaran ya ku ji heft bira û xwişkekê pêk tê, bi alîkariya bavê xwe Hessen Kamkar dest bi muzîkê kirin û niha ew muzîka Kurdî bi gelên cîhanê didin guhdarî kirin. Ew geh li Ewrûpa ne û geh li Amerîka. Di rojên derbasbûyî de rawestgeha wan paytexta Îtalya Roma bû. Kamkaran li Roma derketin pêşberî Kurd û Îtaliyan û rojeke xweş li bîranînên wan zêde kirin. Li gel Kurd û Îtaliyan, Farisên ku li Roma dimînin jî di nava temaşevanên Kamkaran de bûn. Kamkaran nêzîkî 3 saetan li ser sehnê man û di beşê yekem de bi giranî stranên xwe yên bi zaravayê Soranî gotin. Di beşa diwem ya konsêrê de jî wan stranên Kurmancî û stranên xwe yên nû gotin.

Kamkaran zanîna xwe ya muzîkê di Akademiya Tehran-Senendejê de dane pêş û hinekan ji wan piştre li Îtalya û Amerîka jî perwerdeya xwe berdewam kirine. Ev 26 sal in ku ew bi awayekî profesyonel xebata muzîkê dikin.

Nivîskarê, ku jiyan avêtiye paş xwe Hunter S. Thompson

Cankurd

Mirina nivîskarê mezin Hunter S. Thompson, ku sala 1937ê li Louisville / Kentucky ji dayik bûye, wek jiyana wî bû, nedîd û lezok . Debançe kire serê xwe û teviya cîhanê, li gel navekî mezin, jiyanek xweşik û hemî xweşiyariyên ku ew têda dijiya, li şûn xwe di guvaştinek tiliya xwe da, li paş milêd xwe roja yekşemê 20.02.2005 hêştin. Jiyana wî yariyek kin bû, 67 salên tijî viyan û dilxwezî û xweşmendiyê bûn. Ew çû, lê girekî bilind ji berhemin mezin li paş xwe di gelek kovar, rojname pirtûk û malperan da, wek rêçek dirêj ji mirovatiyek lezok, ji me ra hêlan.

Hunter S. Thompson ne wek rojnamevanên dî bû. Bûyer li ba wî parek ji jînê bû, ew bi terzekî dî bû, ne wek yên hevdemê wî bûn, radiwestiya. Thompson bêjeya "GONZO" "GONZO" di cîhanê da belav kir, û wilo av livand, jîn xist rojnamevaniyê û terazûna dêmenê rojnamevaniya li dar li hev xist. Ket nav bûyeran, bû parek jîndar ji wan bûyeran, û her bi lez û bez di nav daristana rojnamevaniyê re, di nav pêlên zireyê peyvê re avjenîn kir.

Di romanek xwe da, ya ku sernavê wê "Tirs û genîbûn li Las Vegas" e, ew xwe tev li qerêjiya jîna wî bajarê qumar, kabê, keçik, narkotîk, pere û meyxweriyê dike û li ser wê tevlêkirina xwe dinivîse.

Hunter li ser serekê Amerîkî yê berê George Bush got, ku ew "Kêzika Gû ye", li ser serekê kevintir Ronald Reagan henekên xwe bi zewqa wî ya çandeyî kirin, û li ser serekê niha George W. Bush got, ku li hemberê wî Richard Nixon ê kevinperest "Lîberalekî alavbilind" e. Li ba Hunter S. Thompson ji van dijwartir bêje tune bûn, ku rewşa wan pê zelaltir bike. Ji ber zimandirêjiya xwe gelek hat bersûckirin, agirê pir rojnameyan bi ser xwe da rijand û carina çû ber dadgehê, ku bersivê bide; bo çi ew wilo tund û hêrişkare li hember navdarên welatê xwe Amerîka.



Hunter S. Thompson (1937–2005)

Hunter S. Thompson di roman û raporên xwe da pir bi zimanê "EZ" diket nav jînê û hewaldanê. Niviskarekî li ser nivîsand, ku ew wek trumbêlek bi lez li çola Nevada, wek Hûtekî Hay di zireyê da, an jî wek kesekî xwe li ser berfê xûş dike, bê rawestan, bê tirs û bê jarbûn, jîna Amerîkanan tev li hev dixist û agir berdida "Xewna Amerîkî".

Di sala 1962ê da "The Rum Diary" li ser komek rojnamevanên Puerto Rico li Latîn Amerika, wek pirtûk derket, sala 1998 wek romanekê belav bû, Hunter S. Thompson digot, ku wî destnivîsa wê pirtûkê lêkiribû.

Di sala 1967ê da Hunter S. Thompson xwest egera xweqirkirina giştî ya "Hell's Angels" bi şêweyekî çandeyî bo Amerîkanan bide têgihîştin.

Sala 1968 Hunter S. Thompson çû bajêrê Chicago, ku li ser rêveçûnên bajêr binivîse. Polîsan li wî da û lew re nivîsand:"Ez çûm wir wek rojnamevanekî û ez vegeriyam wek şorişgêrekî xwînsar."

Sala 1998 Terry Gilliam romana "Tirs û genîbûn li Las Vegas" kire film û Benicio del Toro sira Thompson di film da lîst. Gelek rexnevanan bi pesin li ser wê xebatê nivîsandin, lê hinekan jî bi xeyd û nevîn (kurh) qala nivîskar kirin.

Hunter S. Thompson di 18 saliya xwe da hat binçavkirin û du mehan di zindanê da ma. Ew derket û çû leşkeriya aşîmanî (Air Force), tenha bo rûçikmendiyê navê xwe li zanîngeha Columbia da qelemkirinê, li genîtirîn taxên New Yorkê Harlem danişt û romanên Faulkner, Conrad û Hemingway ji serî ta bi dawiyê bi tilînivîsê nivîsandin, da ji wan hunera romanê fêr bibe. Ew bû gotarnivîsê komika musîkî ya navdar „Rolling Stone", û li Latîn Amerika û Afrîka li çêrokên rojnamevaniyê geriya. Li Zaîr / Afrîka ji ber serxweşbûnê lîska bokserê mezin M. Ali Clay û Foreman ji dest çû, wî şeva xwe bi xewê li ber golek avjenînê qedand.

Hunter S. Thompson bi salan xwe ji ber rohniya civaka mexmelî bi dûr xist, ew di mala xwe da li nav zinarêd Colorado jiya, kêm kes dikarîn biçûna serlêdana wî, ji bilî Bob Dylan, Keith Richrds, Sean Penn û Johnny Depp, ku lîskvanên filman û hunermend in, têkiliya wî bi xelkê re hatibû birrîn. Li dora wî zeriyên ciwan ên Amerîka diciviyan û hinde caran debançeya xwe li wan çolan bi kar dihanî. Wî carekê bo kovara „TEMPO" gotibû: [Ez narkotîka „Speed" im , ku bûye mirov.]

Gelek berhemên wî ji bo zimanên Almanî û Firensî jî hatine wergerandin ...

Evîn û evîndarî

Lokman Polat

Min li ser mijara evîn û evîndarîyê gelek nivîs –meqale- şîrove, nirxandin, helbest, çîrok û kurteroman nivîsiye. Min ji bo ku li ser evîn û evîndaran gelek helbest û çîrok nivîsiye, min navê pirtûka xwe ya yekê kiribû "Evîn û Jîyan", navê pirtûka min ya ku romannivîser Mehmet Uzun ji bo wê pêşgotin nivîsîbû, "Evîndar" e û niha jî min pirtûkek ji bo çapê amade kiriye û navê wê jî "Çîrokên Evîndarîyê" ye.

Li ser evîn û evîndarîyê gelek tişt tê nivîsîn. Li cîhanê herî pir li ser vê mijarê tişt têne nivîsîn, lêbelê çiqas tişt bêne nivîsîn jî têr nake. Her roj tiştên nû têne nivîsîn. Ez jî hertim bi Kurdî dinivîsim û ez ê di vê nivîsa xwe de ji we re tiştên nû, tiştên baş û xweş yên derbarê evîn û evîndarîyê de binivîsim û pêşkêşê xwendevanên Kurd bikim.

Ez vê nivîsa xwe di roja 14 Sibatê de dinivîsim. Hûn zanin ev roj roja evîndaran e. Divê mirov vê roja evîndaran li evîndaran pîroz bike. Min ev roj ji gelek nas û dostên xwe yên evîndar û ne evîndar re mail şiyand û ji hinekan re telefon vekir û roja wan pîroz kir. Helbet min roja evîndara xwe jî bi dil û can pîroz kir.

Ez ê niha weke aforîzmayê hinek gotinên derbarê evîn û evîndariyê de pêşkêş bikim.

• Di evînê de sembol hene. Ji bo min sembola evînê li ezman stêr e, li erdê kulîlk e.

• Aşiqbûnî bêdengî ye.

• Mirov tim di xeyalên xwe de şikl û şemal, rû û çavên evîndara xwe dibîne.

• Evîndarê/a mirov tim di hiş û aqilê mirov de ye.

• Çavên keçên evîndar ji bo xortên evîndar sihrî ne.

• Yên ku dibin evîndarên rasteqîn miheqeq helbest dinivîsin. Yên ku helbest nenivîsin jî gotinên axaftina wan weke peyvên helbestkî ne.

• Cudabûyin nebe hereket nabe, tevger çênabe. Hezkirina pîroz û serhildana ji bo evînê nebe evîn û evîndarî nabe.

• Du kesên ku ji hevûdu hez dikin dikarin bi saetan li cem hev bimînin. Ew nabînin ku wext çawa derbas bû.

• Daxwaziya şadbûn û bextiyariya evîndaran ya ji bo hevûdu, wan bi hest û rih digehurînê. Ew hertiştên baş û xweş ji bo hevûdu daxwaz dikin.

• Yên ji hevûdu hez dikin, evîndarên hev ji bo hev sembola herî xweşik û nîşana herî pîroz in.

• Evîn di hest û ruhê evîndaran de îmgeyên pîroz diafirîne. Derya, çîya, gol, dar ji bo evîndaran dibin cihên sembolîk yên hevûdu dîtinê.

• Dibêjin evîndar herî pir ji hevûdu pirsa "Tu çi difikirî" dipirsin.

• Yê evîndar ji her tiştên evîndara/ê xwe hez dike, lê nade der.

• Keçên evîndar li hemberê evîndarê xwe nazik in, naz dikin.

• Mêrê evîndar pesnê evîndara xwe dide.

• Keçên evîndar tiştên evîndarê xwe bi dev naecibînin, bi dil diecibînin.

• Yên ku di hêla madî û manewî de bextiyar in, nikarin bibin evîndar.

Evîndarî dilêşî ye. Derd û kul e, qahir û keder e. Bêmiradî ye. Lewre jî evîndarî hêzîye. Yê ku bi hêz nebe nikare bibe evîndar.



www.arsiv.kurd

Çetinêya muhalîf bîyayişî

Mahmut Arîf Ayçîçek

Eg yew merdim mîyanî yew sîstem de xebat kerd û bacê mî yanî na sîstem de xeletî tespît kerd, yan zi fam kerd; o merdim re di faktor lazim benî.

1-Tecrube û zanaye bîyayiş

2-Metînê û cehd kerdiş

Nê di faktöran ra teber yewna çî zi est o zi no yo ke merdim bê ters û bê tehnê(etkî) fîkîrî xo vaco.

Eger yew merdim mîyanî sîstem de xeletî tespît kêrd, no tespîtkerdişî ey xo ser zaf muhîm o. Tespitkerdişî xeletîyan zaf hususiyet arz keno. Zaf zi zanayişo hususî wazeno. Lakîn no hususiyet zi rey- rey pere nêkeno. Nê semedan ra pere nêkeno. Kî wext ke xeletî dîy, kî gereka na xeletîye vajo, biyaro mîyanî cemaat, na xeletîye biyero vatiş, biyero xeberdayiş, biyero mişevirye kerdiş. Ha, o wext merdim goreyî zanayê xo raştiye ûno meydan, no qide merdim muhalîfiye keno heq.

Tarîh de muhalefet kerdiş eynî qedê no wextî ma ûmo kerdiş, kam ke muhalîfê kerda aqîbetî ey zi qedê nikayî biyo. Sarevînkerdiş, bêveng verdiş, yan zi tec rît kerdiş biyo. Eger yew muhalîf tersanî xo ver wazîfeyî xo êy muhalîfê nêard ca, o ca ra muhalîf nêhesibyeno.

Raştiye vatiş nasîb her şexsiyetî nêbena, no guri, gurê herkesî niyo. Yanî no guri, gurê her partî, her komel zi niyo. Famkerdişî mi zi nawa ; ez ewniyaya kam vûno ez muhalif a, heq muhalifê xo nêdûno, raşt û samîmî niyo. Muhalefat kerdişî înan zi de politîka kerdiş aysena, sey camiyerdan vînayê xo eşkira nêkenî.

Merdimo keleş penî vatişî ey de se beno, çi beno, nê hesab keno û goreyî nê qerarî xo dûno, vatişî xo ûno ca. Penî no karî ey de kistişî ey zi bibo, gueş pa nêkueno, çoy ra nêterseno, verî herkesî de, her ca de vate xo bê ters keno eşkira. Tarih de zaf şexsiyetî winaserîn ciwiyayî.

Kurdanî ma verciye semed bindêst duşmên ra xelisnayişî millet û welatî xo ya xo verda, cehd kerd, bî muhalîf. Kurdan no rayer de her qede rîzîko guret xo çim, ûmê kiştiş, hepiskerdiş, zulim dîy, seqet mênd, dewî înan ûmê vêşayiş, lakin muhalefet kerdiş ra pa nêmendî. La nika nê derûdorî xelet yew siyaset rûmnenî û na rey he yewne qede muhalefet kenî. Merdimo keleş gereka her hal de verba neheqiye vindiro. Ha verba duşmin de, ha verba merdimanî xo de ferq nêkeno. Qeletî, qeletiya, ha xerîb kerd, ha merdimî to kerd, bênate de ferq çîno.

Ti verba dewlet muhalîfê bik, wa dewlet felekan biyaro to sere, eziyet bûnc, lakîn zerreyî siyasetî xo de, sîstemê xo de xeletiyan nêvaji, sey xizmikar vindir, sey yesîr vindir. Ez no ra hal re heyret mûnena. No senî yew hal o no senî yew şexsiyet o no senî yew haliyetîruhiye yo. Ti him vûnî ke ez neheqiyê qowil nêkena û him zi neheqiye dûnî qowil kerdiş.

Eger zerrê sereyî yew insane de di vînaye estî, demeg hûma qerekterî ey insanî nênişto rue. Merdim him hol, him xirab, him zanaye, him hirik, Him camyerd, him bêbext, him muhalîf, him pabesteyi bo no yew ucube yo. Merdimanî înayinan de yew nêweşiya pîl esta.

Yew qalê ma Kurdan esta, vûnî; " Kue nişt, suli wirişt". Eger ma kueyî xo tespît nêkerd û heqî kueyî xo nêard ca û bê veng mendî; penî de şar sulî wirzeno pay, ma piyerin hetikneno, ma rezîl keno, ma keno bêbext. Însaniyete ra, keleşiye ra, camiyerdê ra eser nêverdeno.

KOMKAR bî hedefî erişan



Gorî eşkirakerdişî KOMKAR şewê 21 Adar de tayê kesanî tarî eşt komelê Komkar lokale Îngîltere ser û mal û çîyî komel ê bi qîmet talan kerd. Kitabxanê komel, resmî şehîdan û ala rengîn kerda parçe- parçe.

Hancî şewê 26î Adar de tayê kesan eriş berd komelê Komkar ê Swed ser. Îta de zi kîtabxanê komel, dezgê kar û xebat şayî we û komputerî komel kerdî parçê.

Cuwa ver 16î Sibat de zi yew bombaya molotof Kokteyl erziyaybî komelê Hamburg ser.

KOMKAR sebebî nê erişan îna eşkir kena: " Nê erişî înayin bi plan yenî kerdiş.

Gori rayê ma nê eriş verba demokrasî û merdimatiyê, nê êriş verba harekata kurd ê, nê eriş verba yewbiyayê hêzanî kurdan ê".

Kampanyaya îmza: Ez Kurd a, terefa û wazena..



Amed- Amed de yew qisim roşnvîr, nuştox û sîyasetkaranî Kurdan semed ke waştanî xo bidî YE zanayiş yew kampan yayê îmza kerd a. Înan 26î Adarê de Amed de kuçeyî Hûner ser de bi şîara „ Ez Kurd a, teref a û wazena" dest pi topkerdişî îmzayan kerd. Bi namê nê însiyatîfî Umît Tektaş qisêkerd. Umît Tektaş heqî Kurdan ê naturalo ke no welat de bê ters, bê tedayî û azad biciwî û bi Tirkana wahar heqanî sey ciye bî va û armancê na kampanya îna ard ziwan:

„Ma 83 şexsiyetanî Kurdan na kampanya semedî YE ya kerd a, ma îta de waştê Kurdan ardî ziwan. Ma wazenî na kampanya Tirkiye û ewropa de 6 aşm birûmn. Îmzayî ke ma dayî ariye, pa waşteyanî Kurdana ma 30 aşmê oktobre 2005 a ver bide dezgeyanî YE.

KÜRT-KAV bi coş Newroz Fîraz kerd

Îstanbul- Weqfa cigêrayişî kuturî Kurd (Kürt-Kav) 20 Adar de Bakirköy restaurantî Varans de bi yew werî şanda Newroz fîraz kerd.

Şewê fîrazkerdişî Newroz bi qisêkerdişî serekî Kürt-Kav .Celal Baykara ya dest ci kerd. Spîkerê şew Latîf Epözdemîrkerd. Koma Dîyar û hozana Kurd Çîçek ji bi dyîranî xo reng da na şenayî.

Abdulkadîr kam o?



Selim Çürükkaya

Di aşm verî ez şibiya Swed. Yew embazî mi va:

Ez to re yew xebera muhîm vûna, la nika çew ra mevac û qisêkerdişî xo rûmna:

Abdulkadir Aygan ho îta de o.

Abulkadir Aygan Urfayij o, hê vûnî ke o merdimî Abdulaho Urfayij o. O 1983 de Şam de keye A.Ö de mendiyen, 1985 de şi teslimî eskeranî Tirkan bi û 9 serî JITEM de xebitiya. Nika şima vûnî JITEM çine ya? Ez şima re vacî:

Ziwani Fransizan de „jö tem" yeno mehnayî „ez to re hes kena"

Welatî ma de JITEM yeno mehnayî ez „ez to kişena"

Eskerî Tirkan yew qefle qetilkaran ard piyehet, pê înan yew dezge na rue û namê nê dezgî na pa „JITEM".

Abdulkadîr Aygan zi myanî nê dezgî de xebitiya. Înan des henzar Kurdî kişt, des henzar kesî sivîl, des henzar kesî bê suc, bê gune.

Nika no Abdulkadîr remawo, amewo Swed. Ma Kird piyer şaş biy, ma nêzanî ma sebikeri?

Taye vûnî: Ma no ça diy, ma ca de bikişi

Taye vûnî: Ma nê veci mehkema

Taya vûnî: Ma Tirkan bidi mehkema, wa o biyero Tirkan ser îfade bido.

Ez vûna: Abdulkadîr zaf muhîm o. Şima zûnî Abdulkadîr ma kot destî Tirkan, Tirk hê ey şew û roj xebitnenî. Ma zi no Abdulkadirî înan bixebitn.

Ma ti ra pers bikeri, ma vaci:

Na JITEM çine ya? Şima çend ten JITEM de xebitiayn? Namê îna çineyb? Amed de, Xarpiyet de Ruha de, Merdin de, Sorek de, Çermik de, Muş de, Qerekose de kam bi? Înan ke emir deyn şima kam bî?

Walî bî? Qeymakam bî ? Wezîr bî ? Seresker bî ? Piyerê înan ma re vac.

Ûca ra pey ma pers bikeri, ma vaci:

Şima kam kişt; çiney ra kişt? Çi wext kişt, leşê înan eşt kam ca?

Ti cayî qebrê înan zûnî yan nêzûnî?

Eger Abdulkadîr cewabî nê persan da, o wext ma Kirdan ra yew heyet rueni, ma Ebukatan re pers bikeri, ma vaci:

Çi lazimo ma bikeri?

Eger ma nê gurê piyer kerdî, o wext ma eşkenî

sey Rencber Azîz vaci:

Ha ha nîna, ha nîna

Şima vînen sinîna



HAK-PAR Amed de Newroz fîraz kerd

Amed- Partîya Maf û Azadiyan (HAK-PAR) şubeyî Amed semedî fîrazkerdişî Newroza yew resepsiyon da.

Na şenayî bi adirî Newroza dest ci kerd, cuwa pey verî serekî partî A.Malîk Firat bi Kurdî û dima zi cagirotê serekî Bayram Bozyel qisêkerd.

Qisêkerdoxan tarixî Newroz, halî rojhelatabênatîn û Kurdistan ser vindertî û derheqî kar û xebata HAK-PAR ser agahdarî da mêmanan.

Qisêkerdişana pey muzîk dest ci kerd û mêmanan heta erê şew govend girot.

Wan de newroz bi kêf û eşq amê fîraz kerdiş

Wan- Hak-Par şubeyî Wan 20 Adar de bi torbiyayişî yew qirseyo girda ewroz fîraz kerd.

Na şenayiyê Newroz bi deyiranî koma Delal dest cikerd û cuwa pey serekî Hak-Par şubê Wan Mehmet Baydar mehnayî Newroz ser qisêkerd.

Bacê cagirotê serekî Hak-Par Fehmî Demir mehnayî Newroz, kar û xebatê Partî, politîkaya YE, halî kurdistana Başûr ser vînayê Partî ardî ziwan.

Şenayiya Newroza Wan bi konsera hozan Kemalê Amed ê rumit.

www.arsiv.de

Adar, aşmê şehîdanî Kurdistan

Çend ser verî PDKÎ aşmê Adar sey aşmê şehîdanî Kurdistan îlan kerd. No peşniyarî PDKÎ miyanî Kurdan de amê qebul kerdiş û nika aşmê adar sey aşmê şehîdanî Kurdistan yena qebulkerdiş

Semedî şarî dinya ya aşmê Adar qedyayişî Zimistan û dest ci kerdişî wisar o. La semedî şarî Kurdistan mehnayî aşmê Adar zaf muhîm a. Çimkî tarixî Kurdan de aşmê Adar de zaf çiye muhîm bîy. Wext ke nameyî Adar yeno vatiş zaf çî yeno Kurdan vîri.

Heta seserrê 19. de semedî Kurdana hîrê mehnê aşmê Adar bîy. Nê hîrê çîyî muhîm ameyişî seranewî, Newroz û detpêkerdişî wisar bi. Seserrê 20. de aşmê Adar de semedî Kurdana zaf çîyanî muhîman ri da.

14î aşmê Adar 1903 de sereko pîl ê miletê Kurd, Egît û camiyerdo bi qîmet Mala Mistefa Barzanî ûme dinya. Hancî 1î Adar 1979 de no merdimo pîl hend qehr, cefa û xebata pey 76 serre, nêweşiyê kanser ra şi rehmet.

Serekdewleta Kurd ê yewin Qazî Mihemed pa di wzîranî Dewleta Kurd a aşmê Adar 1947 de bajarî Mahabat meydanî çarçira de ûmê aliqnayiş.

11ê Adar 1970 de bênatê PDK û partiya BAAS de piyaameyiş viraziya. Bi no piyamaeyişa ke tarix de sey pîyaameişî 11 Adar yeno name kerdiş, Kurdan heqî otonomî girot. Goreyî no piyeameyişî ganî Kurdistana Başûr de Kurdan bi îdarê otonomî xo îdare bikerdiyen. Kurdan 1961 ra nat 9 serrî bin serektiyê Mistefa Barzanî de bi diruşma „Demokrasî ji bo Îraq, otonomî ji bo Kurdistan" şer



kerdib. La Saddam Huseyîn sozî xo ser nêvindert, no piyeameyiş ca nêard, Kurdistanbiyayişî Kerkûk qebul nêkerd û xo veri otonomiyeka karton îlan kerd. Nê ser hêna aşmê Adar 1974 de bênatê Kurdan û hukmatî Iraq de şer dest ci kerd. Yew ser cuwa pey 6î Adar 1975 de bênatê Iraq û Îran de piyeameyişî Cezayir ûme îmza kerdiş. No piyeameyiş bi sebebî vilabiyayişî şoreşî Kurdistana Başûr.

16î Adar 1988 de Hukmatî Iraq bi çekanî kîmyeviya eriş berd bajarî Kurdistan helepçe ser. Îta de cînî, qicî, kokimî hendê 7 henzar Kurd şehîd bîy. Qetlîamî helepçeya pey erişî Enfal dest ci kerd. Bi no erişî Hukmatî Iraq 182 henzar Kurd Sehraya Erebî de gûnî-gûnî kerdî mezel.

5î Adar 1991 de serewedartişî şarî Kurdistan dest ci kerd û piyerê bajarî Kurdistan xelisiyay. No wext de 112 henzar leşkeranî Iraq xo teslimî Kurdan kerd, bi seyan top, tifing û hawafirî ordiyî Iraq kotî destî Kurdan. Raya vêrîn Kerkûk ûmê xelisnayiş û kot destî Kurdan.

Hancî penî Adar de leşkeranî Iraq bi hawafirokan û çekanî kîmyevîya eşt Kurdan ser, 4 mîlyon Kurd hetî sinorî Îran û Tirkiye ya şîy. Kurd bîy koçerî serî koyan, serd û puk de, bin keran de ca da xo. Zafî qîcî serd ra û vêşûnê ra merdî. Kurdan qîcî xo binî keran de kerdî mezel. Na felaket verî çimanî dinya de bîy. 3-4 rojî piyerê televîzyonanî dinya de xebera verîn na trajediya Kurdan bîy. Kurdî piyerê dinya wirîştî lingan ser. Yewbiyayê Miletan(YM) hin nêşka zaf bêveng bimûno. YE semedî Kurdana cuarî parelela 36 de yew cayî emniyet îlan kerd. Kurdî koyan ûmê war û no parçeyî Kurdistan de ca da xo. Cuwa pey 1992 de semedî parlementoyî Kurdistana vîcnayiş viraşt. Payizî 1992 de Kurdan hukmatî Kurdistan na rue parlementoyî Kurdistan Dewleta Federala Kurdistan îlan kerd.

19î Adar 2003 de hêzanî piyepeyman (Amerîka û mutefîkî Amerîka) şemedî orte ra wedartişî rejimî BAAS eriş berd Iraq ser. Aşmê Nîsan de rejimî BAAS bi vila.

12ê Adar 2004 de yew kayî Futbal de terefdaranî BAAS bajarî Qamişlo de eriş berd Kurdan ser. Înan bi ardimî polesanî Suriye îta de xelyek Kurd kiştî. Nê ser Kurdanî Kurdistanarojawan bajaranî Qamişlo, Hesike, Amûde, Serekanî, Kobanî û ê bînan de seredaritwe. Rejimî BAASî Suriye nê bajaran de qetlîam viraşt, se ra zaf Kurdî kiştî û hendê henzar ten tepişt eşt hepisxanê. Nê Kurdan hama yew qisim, tayê înan zi qicî, hê hepisxaneyanî Suriye de mehkum î.

Yew hususiyetî aşmê Adar zi aya ke rojî cînîyanî Dinya ha na aw de a. 8ê Adar rojê cîniyanî kedkaran a. Na roj zi piyerê dinya de yena fîraz kerdiş. Kurdistan de zi rojê 8ê Adar sey rojê cînîyan yena fîraz kerdiş. Nê seranî peyinan de Kurdistana Başûr de semedî cîniyan zaf yasayî rind veciyayî. Na zi serfîraziyê Kurdan a.

Çend ser verî PDKÎ aşmê Adar sey aşmê şehîdanî Kurdistan îlan kerd. No peşniyarî PDKÎ miyanî Kurdan de amê qebul kerdiş û nika aşmê adar sey aşmê şehîdanî Kurdistan yena qebulkerdiş.

Dersimi jî Munzur ser Barajan nêwazenî



Îstanbul- Komela kultur û alaqdariya Dersim ê Istanbul 27î Adar de verî liseyî galatasaray de amê piyehet û derheqî cigerayişî sîyanur û barajan de yew eşkirakerdişî çapamenî viraşt.

Endamî koma rîyeraberdoxî Komel Mansur Bektaş, bi nameyî komela wezirî Daristan û derûdor Osman Pepe re yew waştişname şawit.

Dersimij nêwazenî ke Çemî Munzur ser baraj biyerî viraştiş û şîrketî Dersim de bigerî Zero siyanurin.

Hancî na komel UNESCO re zi waştişname şawit ke ziwar bidî hukmatî AKP ke nê projeyan caverdo.

Kurd namê dewanî xo ê Kurdî wazenî

Ebukat Hamza Yilmaz bi namê dewijanî dewê Keban Nîskûşaxi(Arslankaşî) sere da wezîrtiye karanî zerî re ke namê dewê xo ê Kurdî bigirî. Namê dewê Nîskûşaxi 45 ser cuwa ver amebi bedilnayiş, bibi Arslankaşi. Gorî agahdariyanî Hamza Yilmaz nameyî 21 dewê Keban amewo bedilyayiş. Tenê namê 9 dewan nêamo bedilnayiş çimkî namê înan bi Tirkî yo.

Serrê 1960 de, Navçeyî Navendî ê Xarpiyet de 22, Pali de 12, Meden de 22, Keban de 21 û Hazar de 12, piyer piya namê 89 dew amebi bedilnayiş.

Dersim de Poles ziwar nûno esnafan ser

Dersim- Walîtiyê Dêrsim 25î Adar de saziyanî Dêrsim re yew nuşte şawit û waşt ke ê "Şiyayişî Alê" de ca bigirî. Walîtiye memûr û wendoxan kena mecbûr ke no şiyayiş de ca bigirî. Per bîn ra poles ziwar nûno esnafan ser ke alê Tirkan dikanan xo de dardkirî.

Nuşteyî "Bijî Kurdistan" xof fist zerrê polesanî Tirkan



Gorî agahdariya pelkeyê ê Mynet şandî 26î Adar de Yalova de, mexlayî Mîmar Sînan dîwaranî 20 apartimanan ser "Bijî Kurdistan" amê nuştiş.

No nuşte bi destî kam amewo nuştiş hama beli nêbû.

Na biyaye ters û xof fist zerrê polêsanî Tirk. Nê ser polês kotî nê kesan dima ke no nuşte nuşto. Faşîstî Tirkan zi bî har ke diwaran ser bijî Kurdistan amewo nuştiş.

درێژەی رژێمی سوریا بەرەوە.....

دوورهاوێژەکان، یان یارمەتیدانی کارپێکردنی دامەزراوی ئەتۆمی لە سوریا.

• بڕگەی ١٠٢:

ریزکردنی سزا هەنووکەییەکان

سزا ویاساکانی ئەمریکای پەیوەند بە سوریا بەردەوام دەبن، هەروەها دژی ئەو کەسانەی یارمەتی حکومەتی سوریاش دەدەن. دوای دەرچوونی ئەم یاسایە، سەرۆک کۆمار بە لیژنەکانی کۆنگرێس رادەگەیەنێ:

١ـ کە حکومەتی سوریا:

أ ـ هەموو پشتگیری و لایەنگیرییەکی تیرۆر بوەستێنێت.

ب ـ بەتەواوی هەموو بەرنامەکانی چەکەکانی بایلۆجی و کیمیایی و ئەتۆمی لەناوبردبێت، دەبێت پابەندی دژایەتیکردنی بڵاوبوونەوەی ئەم چەکانە بێت.

ج ـ لە لوبنان و سوریا بکشێتەوە و رێز لە سنوور و سەروەری وڵاتانی دراوسێ بگرێت.

د ـ مافەکانی مرۆڤ بپارێزێ و رێزیان لێبگرێ.

٢ـ سەروەری بگەڕێتەوە بۆ لوبنان، حکومەتێکی دیموکراتی و دانپیانراوی نێودەوڵەتی و هەڵبژێردراو بە هەڵبژاردنێکی ئازادانە دابمەزرێت.

• بڕگەی ١٠٣:

سزا بۆ کەسانێکی دیاریکراو

١ـ سزاکانی هاتووی ناو ئەم بڕگەیە بەسەر ئەو کەسانەدا دەسەپێنرێت کە بە زانین، کەل و پەل بگوێزێتەوە یان بەشداری دەسکەوتنی سوریا بۆ تەکنیک یا پەرەپێدانی چەند وجۆری لە چەکی ئاسایی پێشکەوتوو، یان بۆ دەستکەوتن یان پەرەپێدان و کۆکردنەوەی چەکی بایلۆجی و کیمیایی و ئەتۆمی و مووشەکی بالیستی دوورڕەو.

٢ـ سزاکان ئەمانەن:

أ ـ حکومەتی وڵاتەیەکگرتووەکانی ئەمریکا شتومەک لە هیچ کەسێکی سزادراو ناکڕێت.

ب ـ حکومەتی وڵاتە یەکگرتووەکانی ئەمریکا مۆڵەتی ناردن و هێنان بە هیچ کەس و لایەنێکی سزادراو نادات.

ج ـ سەرۆک کۆمار مۆڵەتی هێنان بە هیچ کەسێکی سزادراو نادات.

• بڕگەی ١٠٤:

سزاکان لەسەر دەوڵەتە بیانییەکان

١ ـ سزایەک یان دوو سزا لە سزاکانی هاتوو لە بڕگەی ٢دەسەپێدنرێت، سزاکانی هاتوو لە بڕگەی ٣دەسەپێدنرێت. ئەگەر سەرۆک کۆمار بڕیاری دا کە هەر دەوڵەتێکی بیانی کەلوپەل و تەکنیکی بگوێزێتەوە یان یارمەتی سوریا بدات بۆ بەدەستهێنان و پەرەپێدانی چەند و جۆری هەڕەشەکەر لە چەکی ئاسایی پێشکەوتوو، یان بۆ بەرهەمهێنان و پەرەپێدان و عەمبارکردنی چەکەکانی بایلۆجی و کیمیایی و ئەتۆمی یان مووشەکی بالیستی دوورڕەو.

٢ـ سزاکان ئەمانەن:

أ ـ حکومەتی وڵاتە یەکگرتووەکان، یارمەتییەکانی خۆی بۆ وڵاتە سزادراوەکان رابگرێت.

ب ـ حکومەتی وڵاتە یەکگرتووەکان مۆڵەتی ناردن و هێنان بە هیچ دەوڵەتێکی سزادراو نادات.

ج ـ سەرۆک کۆمار رێ لە هێنانی بەرهەمەکانی دەوڵەتی سزادراو دەگرێت.

د ـ وەزیری گەنجینەی ئەمریکا داوا لە بەڕێوەبەری ئەمریکی بۆ جێبەجێکردن دەکات کە لە هەموو رێکخراوە دارایی یە نێودەوڵەتییەکاندا، یارمەتی دارایی و تەکنیکی بۆ دەوڵەتی سزادراو رەت بکاتەوە یان دژی درێژکردنەوەی بوەستێت.

ە ـ وڵاتە یەکگرتووەکانی ئەمریکا پابەندی خۆی بۆ پەرەپێدانی هەر مادەیەک لە لیستی چەکەکانی وڵاتە یەکگرتووەکانی ئەمریکا لەگەڵ دەوڵەتانی سزادراو رادەگرێت.

و ـ وڵاتە یەکگرتووەکانی ئەمریکا هەر پەیمانێکی سەربازی بۆ ئاڵوگۆڕی تەکنیکی هاوبەش لەگەڵ دەوڵەتی سزادراو رادەگرێت.

• بڕگەی ١٠٥:

هەوڵە دیپلۆماسییەکان

١ ـ کۆنگرێس وایدەبینێ کە لەسەر وەزیری دەرەوەی ئەمریکا پێویستە کە ئەوە مسۆگەر بکات کە دیپلۆماسییەکانی ئەمریکا لە پەیوەندییەکانیاندا لەگەڵ بەرپرسانی بیانی، هۆی سزاکانی ئەمریکا بۆ سەر سوریا روون بکەنەوە و داوایان لێبکەن کە هاوکاری کاریگەرانەیان لەگەڵ وڵاتە یەکگرتووەکان هەبێت.

٢ ـ سەرۆک کۆمار، نوێنەری وڵاتە یەکگرتووەکان لە نەتەوە یەکگرتووەکان و رێکخراو و ناوەندەکانی نەتەوە یەکگرتووەکان و رێکخراوەکانی تری پەیوەند بە نەتەوە یەکگرتووەکان ئاراستە بکات، بە بەردەوامی بەکارهێنانی دەنگی وڵاتە یەکگرتووەکان بۆ دژایەتیکردنی بە ئەندامبوونی یان داواکردنی ئەندامێتی سوریا بۆ هەر پلەیەکی سەرکردایەتی لەم دەزگایانەدا یان بۆ دەستکەوتنی هەر پاڵپشتێکی نێودەوڵەتی.

٣ ـ سەرۆک کۆمار هەنگاوی گونجاو دەنێت بۆ دەرکردنی بڕیارێک لە لیژنەی مافەکانی مرۆڤی سەر بە نەتەوە یەکگرتووەکان بۆ بە بەرپرس زانینی سوریا لە پێشێکردنی مافەکانی مرۆڤ بە بەردەوامی بۆ هاوڵاتیانی سوری و لوبنانی، نوێنەرێکی تایبەتی نەتەوە یەکگرتووەکانیش دابنرێت بۆ لێکۆڵینەوە لەو پێشێلکاریانە.

٤ ـ سەرۆک کۆمار بەڕێوەبەرانی جێبەجێکردن لە رێکخراوە داراییە نێودەوڵەتی یەکان بەو جۆرە ئاڕاستە دەکات کە دەنگی وڵاتە یەکگرتووەکان لە دژی هەر قەرزێک یان یارمەتییەک یان ئەندامێتی سوریا لەم رێکخراوانە بەکاربێنێت.

• بڕگەی ١٠٦:

یارمەتی سوریا و بازرگانیکردن لەگەڵیدا

١ ـ لەدوای ئەو ماوەیەی کە لە ٩٠ رۆژ زیاتر نابێت دوای دەرچوونی ئەم بڕیارە، سەرۆ کۆمار هەموو ساڵێک راپۆرتێک دەداتە لیژنەی دیاریکراوی کۆنگرێس کە دەربارەی بازرگانیکردن و یارمەتیدانی سوریا و هەر دەوڵەتێکی دیکەی بیانی بێت لە ساڵی رابردوودا.

٢ ـ راپۆتەکە ئەم روون دەکاتەوە:

أ ـ باسی هەموو یارمەتییەکان لە هەر دەوڵەتێکەوە بۆ سوری کە یارمەتی مرۆڤایەتیش دەگرێتەوە.

ب ـ وەسفکردنی بازرگانیتی سوریا لەگەڵ هەر دەوڵەتێکی بیانی کە لەنایدا ناوی ئەو دەوڵەتانەش دێن و جۆری بازرگانیکردنیشیان.

ج ـ ناوبردنی وەبەرهێنانە هاوبەشە مۆرکراوەکان، یان کە وتووێژ لەسەر مۆرکردنیان دەکرێت و پەیوەندی بە دامەزراوە سوری یەکانەوە هەیە و وێنەی دامەزراوەکان و ناوی لایەنە دیریکراوەکان.

د ـ دیاریکردنی قەبارەی قەرزی هەر دەوڵەتێک لەسەر سوریا، هەتا ئەو قەرزانەشی تێدابن کە لێیخۆشبوون یان کەمکراونەتەوە و، وەبەرهێنان لەناو سوریا کە پەیوەندییان بە کەسانی بیانی یەوە هەیە یان ئەوانەی قەرز بۆ بەرژەوەندی حکومەتی سوریا دەکەن یان هاوڵاتیانی سوری.

ە ـ وەسفی ئەو هەنگاوانەی کە رێگە لە هاتنی کەرەستەی خاو و کەلوپەلی ئامادەکراو و نیمچە ئامادە لە دامەزراوەکانی سوریاوە بۆ بازاڕی وڵاتە یەکگرتووەکان بگرێت، جا چ راستەوخۆ بن یان ناڕاستەوخۆ یان لە رێگەی دەوڵەت یان لایەنی سێهەمەوە بێت.

و ـ دیاریکردنی ئەو دەوڵەتانەی کە چەک و کەرەستەی سەربازی یان داوە بە سوریا یان رێککەوتننامەی شێوەسەربازییان لەگەڵ سوریا مۆرکردبێت.

بەشی دووەم:

یارمەتی یەکانی پشتگیریکردنی دیموکراتی لە سوریا و پشتگیری دیموکراتی و سەروەری لە لوبنان:

. بڕگەی ٢٠١:

١ ـ راگەیاندنی سیاسەتەکە

أ ـ سوریا ـ پشتگیرکردنی هێزە سەربەخۆکان و لایەنگرانی مافی مرۆڤ و دیموکراتی لە سوریا بە ئامانجی هاتنەسەرکاری حکومەتێک کە ئەمانە بکات:

أ ـ تیرۆر پرۆتستۆ بکات و شەڕی تیرۆریش بکات.

ب ـ چەکە بایلۆجی و کیمیایی و ئەتۆمی یەکان نەهێڵێ و پابەند بێت بە نەهێشتنی بڵاوبوونەوەیان.

ج ـ رێز لە سنوور و سەروەری دەوڵەتانی دراوسێ بگرێت و لەگەڵ دەوڵەتانی ناوچەکەبە ئاشتی و ئارامی بژێت.

د ـ مافی مرۆڤ جێبەجێ بکات و بەرگری لە مافی مرۆڤ و مافە مەدەنییەکان بکات.

٢ ـ لوبنان: دەسپێشخەر بۆ گێڕانەوەی سەروەری بۆ لوبنان بکات، ئەویش بکشانەوەی دەسبەجێ، بەبێ مەرج، هەموو سوری یەکان لە لوبنان بکشێنەوە، پشتگیری کۆمەڵگای مەدەنی و هێزە دیموکراتخوازەکان بکات بە ئامانجی سەرلەنوێ دامەزراندنەوەی حکومەتێکی دیموکراتی هەڵبژێردراو بە هەڵبژاردنێکی ئازاد و دانپیانراوی نێودەوڵەتی، لە سوریا و بۆ گێراونەوەی دیموکراتی و سەروەری لوبنان.

٣ ـ ئەو یارمەتییانەی پێشکەش دەکرێن بۆ ئەمانە بەکاردێن:

أ ـ هەوڵەکانی دامەزراندنی کۆمەڵگایەکی مەدەنی لە سوریا و لوبنان، لەوەشدا یارمەتی ئەو رێکخراوانەی کە سەرۆک کۆمار گەواهی دیموکراتییان بدات و سەبەخۆبن، یارمەتیدانی قوربانیانی چەوساندنەوەی سیاسی و خێزانەکانیان و زیندانیانی بیر و خێزانەکانیان.

ب ـ پەخشکردنی رادیۆ و تەلەفزین بۆ سوریا و لوبنان بۆ پشتگیری هەوڵەکانی بنیاتنانی کۆمەڵگەی مەدەنی و دیموکراتی لەو دوو وڵاتەدا.

٤ ـ پشتگیری دارایی: بڕیاری دارایی دەردەچێت کە؛ رێ بە سەرۆک کۆمار بدات ئەم بەشە لە بودجەی ساڵی ٢٠٠٥ جێبەجێبکات و هەر ساڵێکی تریش کە بەدوایدا دێت.■■■■

درێژەی پێشمەرگە .....

پێشمەرگە سەرتاسەر یەک پوشاک بوو. بەرگی خاکی بە شێوەی رانک و جۆغە، یان شەڕواڵ و مورادخانی، یان کورتەک و شەڕواڵ، هێلەگێکی گیرفاندار، لە سەرەوە تاکو ناوقەد بەسەر ئەو پوشاکانەدا دەپۆشرا. هەڵبژاردنی ئەم رەنگەش سەلیقەیەکی جیهانییە لە رووی خۆگونجاندن، لەگەڵ زۆرینەی رەنگی سروشتدا، هۆکارەکانیشی سەربازی و جەنگین. پێشمەرگە بێ لە کڵاو و جامەدانە و شەدە و مشکی، کلێتەی سەر و پۆەوانەی پوز و پشتوێنی قەد بەست و توندکردنی کەمەر و دەستەوانەی چنراوی خۆماڵی دەست خانمان و ناسکە کیژانی کوردانیان دەپۆشی. زۆربەی ئەو کاتانەی، وەرز و کەشێکی خۆش و بێ باران و تۆف و سەرما سەرمادەبوو، کڵاشی جۆر بە جۆری دەست چنی خۆماڵیان لە پێ هەڵدەکێشا. ئەو دەزوو و خوریانەی لە چنینی کڵاشەکاندا بەکارهێنرابوون، یارمەتی فێنک راگرتنی پێ و ئارەق نەکردنی دەدان و، بۆ رێ و بان کردنیش سوکەڵەبوو. هەروەها لە وەرزی سارد و سەرماشدا، زێتر پاتەی لاستیک و گۆرەوی ئەستووری چێنراوی دەستی و ماشینیان دەپۆشی. **درێژەی هەیە**

درێژەی گرووپی موزیکی گەڕیان .....

٨ـ مەحمود محەمەد ـ دەنگبێژ

٩ـ جەمال حەسەن ـ دەنگبێژ

کارەکانیشمان بەشێوەیەکی گشتی بریتین لە :

ـ دوو کۆنسێرت لە سلێمانی

ـ یەک کۆنسێرت لە ئەمریکا "لەگەڵ تیپی سەمفۆنی عێراقی بانگهێشت کرابووین بۆ نمایشکردنی چەند بەرهەمێکی هاوبەش".

ـ تۆمارکردنی سێ **CD**.

ـ تۆمارکردنی **CD**.یەک بۆ هونەرمەند بەهجەت یەحیا (کاری موزیکی تەواوبووە و لە مۆنتاژکردندایە)، فێجگە لە چەندین بەرهەمی تر.

پ: ئامادەکردن و دابەشکردنی موزیکی بەرهەمەکان کێ دەیکات؟

و: ئەم کارانە من دەیکەم، ئەویش لەبەر ئەوەیە لە کاتی ژەنیندا یەکگرتوویی لە گرووپەکەدا هەبێت، هەروەک چۆن کامکارەکانیش هەر وا دەکەن.

پاشان رومان کردە نیاز محەمەد ی ناسراو بە "نیازی سەنتور" و چەند پرسیارێکمان لێکرد:

پ: بۆچی بەدەر لە تیپە موزیکییەکانی سلێمانی ئێوە هەڵبژێردران؟ ئایا لەبەر ئەوە بوو کە تیپە گەورەکان وەک جاران چالاکییان نەماوە، یان ڤیستیڤاڵەکە تەنها بۆ کاری فۆلکلۆری بوو؟

و: نزیکەی چوار ساڵ لەمەوبەر پسپۆڕێکی موزیکی کورد بە ناوی کاک "بەرزان یاسین" کە لەو دەزگایەدا کاردەکات بانگهێشتیان کردین، هاتەوە کوردستان و بەرهەمی زۆر لە تیپ و گرووپەکانی کۆکردەوە، دیار بوو ئەم کارەشیان لە سێ پارچەکەی تری کوردستان و هەندەرانیش کردبوو، پاش گوێگرتن و هەڵسەنگاندنی بەرهەمەکان، ماوەیەک لەمەوبەر هەستان بە بانگهێشتکردنی ئەو تیپانە کە ئێمە یەکێک بووین لەوان.

پ: هونەرمەندانی سلەیمانی و هەولێر پێکەوە هاتوون، بانگهێشتکردنتان پەیوەندیکردنی راستەوخۆ بووبە خۆتانەوە یان لە رێگای دام ودەزگا هونەرییەکانی هەردوو ئیدارەی سلێمانی و هەولێرەوە بوو؟

و: بێگومان هەر تیپێک پەیوەندی یەکی راستەوخۆ یان ناراستەوخۆی بە دەزگا حکومییەکانی ئیدارەکانی کوردستانەوە هەیە و لە رێگەی ئەوانەوە پێمان راگەیەندراو کاری سەفەرکردن و ئاسانکارییەکانی بە ئەنجام گەیشت، بۆ نموونە تا دوا سەعات لە زاخۆ چاوەڕێی "ڤیزە"ی پەڕینەوەمان دەکرد بۆ تورکیا بەڵام بەرەی تورکمانی کارەکەی رانەدەپەڕاند، ناچار بڕیارمان دا بگەڕێینەوە، بەڵام لە رێگەی هەوڵ و پەیوەندیکردنی خاتوو "هێرۆ ئیبراهیم ئەحمەد"ەوە بە لایەنە بەرپرسەکانەوە کارەکانمان بە پەلە بۆ جێبەجێکرا و توانیمان سەفەرەکەمان بکەین.

پاشان هەر دەربارەی چۆنییەتی کارەکانی ئەم گرووپە و هەڵسەنگاندنی پرسیارێکمان ئاراستەی هونەرمەند بەهجەت یەحیا کرد:

پ: کاک بەهجەت وەک ئاشکرایە، بەرهەمەکانت شێوازێکی دەروێشیانەی هەیە، لە رووی مۆرکی هونەرییەوە نزیکی لە گرووپی گەڕیان بە تایبەتی ماوەیەک لەمەوبەر " CD یان بۆ ئامادە کردووین، ئەم گرووپە چۆن دەبینین؟

و: هەست دەکەم هیوا و حەزێکی گەورەم هاتۆتە دی، دەمێک بوو خەونم بەوەوە ئەدی کە لە باشووری کوردستانیش گرووپێک درووست بێت بەم شێوە ترادیتسیۆنە کاری موزیک و گۆرانی بکات، لەبەر ئەوەی ئەم جۆرە موزیکە مێژووی هەیە لەگەڵ هەست و رۆحماندا، ئەتوانیت بە شێوەیەکی زۆر راستەوخۆ لەگەڵماندا بدوێت و گوزارشت لە ناخمان بکات، ئەم جۆرە موزیکە پێی دەوترێت "موزیکی ترادیتسیۆن" واتە "سوننەتیی" کە شێوازێکە لە موزیکی رەسەنی ئێمە و ئاوێنەی واقیعی هەموو رەگ و ریشە مێژووییەکانی میللەتەکەمانە. تیپی موزیکی گەڕیان کۆمەڵێک دەروێشی عاشقن کە رەسەنایەتییەکی زۆر بە بەرهەمەکانیانەوە دیارە و لەگەڵ ئەوەشدا هەوڵیانداوە بە تەکنیکی نوێ و سەلیقەیەکی زۆرەوە کارەکانیان ئەنجام بدەن، لە ناخی دڵمەوە هیوای سەرکەوتنیان بۆ دەخوازم. ■■■■



کەلووەکانی هەفتە



کاوڕ ٣.٢١ تا ٤.٢٠

رووبەڕووی هەندێک دڵەراوکێ و ناڕەحەتی دەبیت لە رووی خێزانی یان کۆمەڵایەتییەوە، بەتایبەتی ئەگەر لە لەدایکبووانی بەشی سێیەمی ئەم کەلوەبن. بەئاگابن.



گا ٤.٢١ تا ٥.٢٠

لە قۆناغێکی نزیکدا، ئارام و وشیارتر دەبیتەوە و نەخشە دادەڕێژیت بۆ پرۆژەی بنیاتنەرەوە، ئەم حاڵەتەت تا کۆتایی مانگی داهاتوو بەردەوام دەبێت.



دوانە(جمک) ٥.٢١ تا ٦.٢١

بیر و بۆچوونەکانت بەهێزتر و کاراتر دەبن و لۆجیک و توانات هەیە لەسەر چاودێری بەردەوام و هەڵسەنگاندنی کارەکان، ئەمەش بۆ ئەم رۆژانەت یەکجار باشە.



قڕژاڵ ٦.٢٢ تا ٧.٢٢

ئەم ماوەیە بە هیچ جۆریک باش و لەبار نییە بۆ هێچ جۆرە بڕیارێک، باشتریش وایە لەم ماوەیەدا ململانێت لەگەڵ کەسدا نەبێت، جونکە بەسوودی تۆ ناشکێتەوە.



شێر ٧.٢٣ تا ٨.٢٢

ئەو رووداوانەی کە لەم ماوەدا لە دەوروبەرت روودەدەن، هەموو سەرئەنجام بە سوودی تۆ دەشکێنەوە و بەروبوومەکەیشیت دەستەبەر دەکەیت.



فەریک ٨.٢٣ تا ٩.٢٢

لەم ماوەدا هیچ لە ئارادا نییە و ژیانت سادە و ساکارە و گۆڕانکارییەکیش لە ئارادا نییە.



تەرازو ٩.٢٣ تا ١٠.٢٢

خێرا و چالاکانە بەرەو پێش دەڕۆیت و ئەگەری ئەوە هەیە کە بە هەندێک ئاوات و ئارەزووت بگەیت.



دوو پشک ١٠.٢٣ تا ١١.٢١

زۆر بە ئاگابە لەم مانگەدا چونکە مەترسی رووداوی نەگونجاو لە ئارادا هەیە، هەوڵ بدە هەموو کارێکت بە وردی و ژیرانە و هێمنانە ئەنجام بدەیت.



کەوان ١١.٢٢ تا ١٢.٢١

چارەسەری هەندێ کێشەی کۆنت دێتە بەردەست و دەست دەکەیت بە ژیانێکی سادە بە دڵی خۆت و کۆنت هێدی هێدی لەبیر دەچێتەوە.



گیسک ١٢.٢٢ تا ١.١٩

کارەکانت سەقامگیر و پەرەدەسێنن و پەیوەندییەکانیشت بەرەو باشتر دەڕۆن، ئەوەندە بیر لە داهاتوو مەکەرەوە و بیر لە ئیستات بکەرەوە.



سەتڵ ١.٢٠ تا ٢.١٨

کەلوەکان کاریگەرییەکی یەکجار خراپ لە ژیان و بار و دۆختدا دەکەن، بەڵام بەوە دەچێت کار لە بواری سۆزداریت نەکەن.



نەهەنگ ٢.١٩ تا ٣.٢٠

ئەم ماوەیە تا دەتوانیت ئاگات لە تەندروستیت هەبێت، چونکە نەخۆش کەویت زۆر بە سەختی چاک دەبیتەوە.

پێشمەرگە

کەمال رەئوف هەنجیرە ـ ئەڵمانیا

بابەتێکی لێکۆڵینەوەیە بەشی یەکەم

پیرۆزی وشەی پێشمەرگە و ئەرکەکانی، لە ئاستێکی هێندە پیرۆز و سەختدایە، پێویستی بە جۆرەها باس و لێکۆڵینەوەی فرە لایەن و سەردەمی تایبەت هەیە. منیش وەکو مرۆیەکی کورد و خۆشەویستیم بۆ ئەم وشە پیرۆزە، هاتمە سەر نووسینی ئەم بابەتە. کاتێک دەوترێت مەلا، کرێکار، جوتیار، قەشە، مامۆستا.. هتد، هەر یەکێک لەو ناوەندە پیشە و کارانە، خاوەنی کەرەسەی کار و داهات و جۆری رەنج و ئەندازەی هەوڵ و تەقەلا و، بەکارهێنانی ئەندازەیەک لە هۆش و ئەقڵی تێدا دەخەملێنرێت. بەڵام بە بیستنی وشەی پێشمەرگە، تووشی هەڵوێستەیەک دەبین و پاش ساتە وەختێک بێدەنگی، بە هوشیارییەکی تەواوەوە، گوێڕایەڵی ئەنجامی کارەکانیان دەبین. ناوەندی کار و رەنجی پێشمەرگە، ناوەندێکی پیشەیی نییە. ناوەندێکی رەنج تێکەڵ بە هۆش و بیر و هێزی ماسولکەیی و تاودان و خاوبوونەوە و، پەنا دانەبەر بەرمبەربوونەوە و بەگژداچوونەوە و، دوورکەوتنەوە لە بەدیهێنانی دەست کەوت و، داهاتی تاک. ئامانجەکانی، ئامانجێکی کۆمەڵگاییە و، سەچاوەکەشی سیاسەت و هەنگاوە دژوارەکانی دوژمنکارانی گەل و نیشتمانەکەیەتی. بەر لە هەموو باسێک، پێویستیمان بە پێناسەیەکی گشتی ئەم وشە پیرۆزە هەیە:(پێشمەرگە بەو کەسە خاوەن هەڵوێستە شۆڕشگێڕییە دەگوترێت، لە ئاکامی سیاسەت و پەلاماردانە وێرانکارییەکانی دوژمنانی گەل و نیشتمانەکەی، ناچار دەبێت پەنا بەرێتە بەر جۆرەها شێوەی بەرگری و، بەرەنگاربوونەوە، بە گوێرەی هەل و مەرجی گونجاو. ترۆپکی بڕوای خەباتی دەگاتە پلەی گیان بەخشین لە پێناو ئامانجەکانیدا). شێوەی سنووری جوگرافیای کوردستان، لە چەند چمکەوە، بگرە لە هەر چوار دەورەیەوە، تێکەڵ بە چەندین وڵاتی تری خاوەن دەوڵەتی دەسەڵات دراو، بیری بەرفراوانی ئیمبراتۆرییەت و بەرنامەی داگیرکردن و، بوونی چەندین مێتۆلۆژیای جیاواز لەو ناوچانەدا، بەر لە چەندین سەدەوە بەرامبەر بەو هێرشە کاولکاری و خۆسەپاندنەوە، رۆڵەکانی ناچارکراون گیانی بەرگری لە پێکهاتە کۆمەڵایەتییە سەردەمییەکان بڕوێنن و، بە شێوەی خێڵ و تیرە و، لەشکر و هێزی میللی و پێکهاتەی رێکخراوەیی سیاسی و کۆمەڵە و دەستەگەری پێک بهێنن و، بچنەوە بە گژ نەیارانیاندا. بەرەنگاربوونەوە، توانا و تەمەنی چەندی خایاندبێت و، تاکو چ رادەیەکیش بە ئامانجەکانی گەیشتبێت، ئەوە بابەتێکی ترە، لێرە تەنها هێما بەوە دەدەم، گیانی بەرەنگاربوونەوە بە هەموو دەسەڵاتێکییەوە، دووپاتی بوون و هەرمانی رەسەنایەتی نەتەوایەتی کوردیان کردۆتەوە. هیچ یەکێک لەو دەوڵەتە دەسەڵاتدار و ئیمبراتۆرییەتە گەورە و زلهێزانەی وەک هێزی داگیرکەر هاتوونەتە سەر کوردستان، بەو هەموو شێوازە ناجۆرە جینۆساید و قات و قڕی و کاولکارییەوە کە لە بەرنامەکانیاندا بووە، نەیانتوانیوە بۆ سەر بەئاکامی مەرامە گڵاوەکانیان بگەن. لە نێو کورداندا ئەو کەس و کەسایەتییانەی، بە جۆرێک لە جۆرەکانی خەبات و بەگژداچوونەوە، بەرامبەر بە هێزی دوژمنی داگیرکەر جەنگاوە، بەر لە داهێنانی وشەی (پێشمەرگە)، چەندین ناو و نازناوی تریان بۆ جوداکردنەوەیان لە کەسایەتییە ئاساییەکانی نێو کۆمەڵ بۆ داناوە. لەوانەش"چەکدار" ، "چەتە"،"جەنگاوەر"، "لەشکری"، "دەستە"، "سوارچاک"، "سوارە"، "یاخی"، "موجاهید"، "حزبی"، "چریک"،...هتد. شەرەفی داهێنان و بەکارهێنانی ئەم وشە پیرۆزە(پێشمەرگە) لە بری هەر یەکێک لەو ناوانەی سەرەوە ناومان هێنان، دەگەڕێتەوە بۆ رۆژانی دوای دامەزراندنی (کۆمەڵەی ژیانەوەی کورد). واتە(ژ. ک) لە کوردستانی رۆژهەڵات. بە گوێرەی چیرۆکی(پێشمەرگە)کەی نووسەری کورد دکتۆر" محەمەد عەبدولڕەحمان قازی". پاش درکاندنی ئەم وشە پیرۆزە، بۆ ئەو کەسایەتییە خەباتگێڕە کوردیانەی، وەک ئەندامێکی(ژ. ک) لە شێوازی خەباتیاندا پەنا دەبەنە بەر چەکی بەرەنگاربوونەوە. بە تێکڕای دەنگ و بە سنگێکی فراوانەوە ئەم داهێنانەیان پەسەندکرد و، سەروەرییەکەشی دەگەڕێتەوە بۆ ئەو جوتیارە کوردە ئاساییە. دوا بە دوای ئەو مێژووە، ئەم وشەیە بە بێ لێکۆڵینەوە و، قسە لەسەر کردنی، لەهەر کوێیەکی کوردستانی گەورەدا، هێز و پارت و رێکخراوی شۆڕشگێڕ هاتبێتە ئاراوە، دەست بەجێ وشەی پێشمەرگەیان بە سەربەرزییەوە، بە یەکە یەکەی خەباتگێڕەکانی رەوا بینیوە. بۆ جوداکردنەوەی ئەو کەسە خۆفرۆش و نەفس نزم و، هەلپەرستانەی لە پێناوی بەرژەوەندییەکی تایبەتی خۆیاندا، بە هەمان روخسار و شێوەی پێشمەرگەیەکی کورد، بەڵام لەتەک چەکدارەکانی دوژمنی گەلەکەیاندا، بەرامبەر بە هێزی خەباتگێڕی نەتەوەکەیان دەجەنگان، ناوێکی تریان بۆ دۆزینەوە، ئەویش بریتی بوو لە وشەی(جاش)..(خۆفرۆش). شۆڕشە کوردییە پیرۆزەکان، پاش هۆنینەوەی بەرنامە شۆڕشگێڕییەکەیان، هەمیشە لە هەوڵی پەروەردەکردنی کەسایەتی پێشمەرگەدابوون، بەتایبەت لە رووی بەرزکردنەوەی ئاستی هوشیاری و فیکری و رێمایی تەکنیکی کار و باری جەنگ و شارەزابوونیان لە جۆرەکانی بەرەنگاربوونەوەیان و، پۆشتە و پەرداخکردنی پێشمەرگەش ئەرکێکی تری سەرەکی بوو. بە حوکمی بەرفراوانی و درێژخایەنی شۆڕشی ئەیلول و، تێکەڵبوونی سەرجەم توێژ و چینەکانی کۆمەڵگای کوردی، لە ناوەندی ئەم شۆڕشە مەزنەدا، دەسەڵاتی سەرکردایەتی پارتایەتی، پارتی دیموکراتی کوردستان، شێوازی خەبات و، کەسایەتی پێشمەرگەی تێدا چووە قۆناغێکی تری سەروەری. بۆیە زۆر بە وردی کەوتنە رێکخستنی ئەو هێزە خەباتگێڕە بەرفراوانە بە شێوەیەکی سەربازییانەی رێک و پێک. ئەم رێکخستنەش بووە هۆی ئەوەی پێشمەرگەش وەک تاک و دەستە، بگرە تاک و هێز ئەرک و دەسەڵات و کار و فەرمانەکانی خۆی بزانێت. لەتەک ئەم پێکهاتە نوێیانەی لە رێکخستنی هێزی پێشمەرگەدا هاتە ئاراوە، کار و باری شۆڕش گەلێک ئاسان کاری تری بۆ هاتە کایەوە و، دەرفەتی ئەوەش رەخسا، کە پێشمەرگە ناسنامەی تەواوی خۆی وەک کەسی یەکەمی بەرەی شۆڕش پێبدرێت. بۆ دووپاتکردنەوەی ئەم مەبەستە، هێزی **بۆ لاپەڕەی ٧**

پەیڤ...



نووسینی : ڤینۆس فایەق

ساڵی ٢٠٠١ پەرلەمانی هۆڵەندی سەرقاڵی تاووتوێ کردنی مەسەلەی ژنهێنانی ڤلیم ئەلیکساندەری کوری پیاتریکسی شاژنی هۆڵەندا بوون. ئەو کاتە لەیەکەم دانیشتنیدا پەرلەمانی هۆڵەندی بە زۆرینەی دەنگ دژی ژنهێنانەکە دەنگیاندا، چونکە ئەوان باوەڕیان وابوو گوایا ماکسیمای کچی زاگاریفی وەزیری کشتوکاڵی پێشوو لە حکومەتی ئەرجەنتیندا شایستەی ڤلیمی کوڕی پیاتریکس نیە، ئەوەبوو دوای سووربوونی هەردوو لە ڤلیم و ماکسیما لەسەر خۆشەویستیەکەیان و لەسەر ئەوەی ئەبێت ژیانی هاوسەری پێکەوە بنێن، دوای چەند دانیشتنێکی تر پەرلەمان نەگەیشتە بڕیاری کۆتایی، ئەوەبوو مەسەلەکە خرایە دەستی گەلەوە لە رێی ریفراندۆم و دەنگدانەوە بڕیاری لەسەر بدەن. ئیدی ئەو کاتە رۆژانە چەندین بەرنامەی جۆراوجۆر لەسەر تەلەفزیۆن و لە رادیۆکانی هۆڵەندا پەخش دەکران و باس لەو مەسەلەیە دەکران و چاوپێکەتنی بەردەوام لەگەڵ کەسایەتی و خەڵکی سادە دەکرا و رایان وەردەگیرا لەو بارەیەوە. تەنانەت لەسەر تۆڕەکانی ئینتەرنێت بەردەوام بابەتی سەیر و سەمەرەت دەبینی و هەڵمەتەکانی ئیمزاکۆکردنەوە و پشتگیری و راپرسی دەربارەی ئەو ژنهێنانە. ئیدی ئەوەبوو بڕیاردرا بە زۆرینەی دەنگ ژنهێنانەکە سەربگرێ بەڵام ئەوەبوو کۆشکی پادشایەتی هۆڵەندی و پەرلەمانی هۆڵەندی و هەموو گەلی هۆڵەندی لەگەڵیاندا رایان وابوو کەنابێت زاگاریفی باوکی ماکسیما ئامادەی ئاهەنگی شووکردنی کچەکەی بێت. ئەوان پێکەوە ئەو مەرجەیان هەبوو بۆ قایلبوون بەو ژن و ژنخوازیە، بەهانەشیان ئەوەبوو کەوا هۆڵەندایەکی ناسراو بە دیموکراتی و ئاشتی و رێزگرتن لە گوروە و پچووکی مافەکانی مرۆڤ، نابێت کەسێکی پاشەڵ پیسی وەک زاگاریف پێی تێخات ئەگەر بۆ ئاهەنگی ماکسیمای کچیشی بێت .. زاگاریف لە ماوەی دەسەڵاتیدا وەک وەزیر ناسراوە بەوەی زۆر لە یاساکانی مافی مرۆڤی پێشێل کردووە وەک ئەوەی بەندیخانەی تایبەت بە خۆی هەبووە و بەدەستی خۆی ئەشکەنجەی بەندەکانی داوە و هەر بە دەستی خۆشی هەزارەها کەسی کوشتووە لەو بەندیخانەیەدا.

ئەوەبوو ٢٠٠٢/٢/٢ ژنهێنانەکەی ڤلیم سەریگرت و ماکسیما شووی کرد. بەڵام نەهێڵرا زاگاریف پێبکات بە هۆڵەندادا .. ئەوەی مەبەستمە لەم چیرۆکە ئەوەیە ئەو وڵاتە و حکومەتەی هێند دیموکراسین تا ئەو رادەیەی تەنانەت مەسەلەیەکی وا پریڤێش دەخەنە دەستی گەلەوە بڕیاری تیا بدات ، ئەوەش لە باوەڕی چەسپاویانەوە بەوەی کەوا ئەوان بەو شێوەیە هەموو بنەماکانی دیموکراسیەت جێبەجێ دەکەن و وڵاتەکەیان ئەپارێزن، بەمەرجێ خۆ خانەوادەی پادشایەتی لە هۆڵەندا بەپێی یاسا هیچ دەسەڵاتێکی سیاسییان نیە بەڵکوو هەمووی لە دەستی پەرلەمان و حکومەتدایە. ئەوان باوەڕی تەواویان بە حوکمی میللەت هەیە چونکە میللەت باوەڕی تەواوی بەخشیوەتە ئەوان و حکومەتی هۆڵەندا ، و هیچ دەرگایەکی داخراو نیە لەنێوان میللەت و دەسەڵاتی سەرەوەی وڵات..

تۆبڵێی کەی رۆژێک دێت ئەزمونێکی لەو جۆرە لە دەڤەری رۆژهەڵات پیادە بکرێت و میللەتەکانمان لەو دەڤەرە بۆیان هەبێت دەنگ بدەن لەسەر مەسەلەیەکی وەک بۆنمونە ژنهێنانێک ؟ نەوەڵڵا لەسەر مەسەلەیەکی چارەنووسسازی سیاسی و ئابووری؟؟

بەباوەڕی من نەبوونی متمانە لە نێوان دەسەڵاتی سەرەوە و خەڵکی خوارەوە ئەو مەودایە قووڵتر و بەرینتر دەکات کە دەکەوێتە نێوان دەسەڵات و میللەتەوە و ئەو کاتە دەسەڵات بەلایەکدا پاپۆڕی وڵات رائەکێشێت و میللەت بەلایەکی دیکەدا ، ئەوکاتە دەسەڵات لە دونیایەکدا دەبێت و میللەت لە هەسارەیەکی تردا و تەنها بیردۆز بەیەکیانەوە ببەستێتەوە توندوتیژی و حاکم و مەحکوم و خاوەن دەسەڵات و بێدەسەڵات ، دەسەڵاتێک هەموو هێزەکانی لە دەستی خۆیدا چڕکردۆتەوە و میللەتێک هیچ جۆرە هێزێکی پێنەماوە ، تەنانەت هیچ کات کات میللەت ئەو هەستەی نابێت ئەو دەسەڵاتە میللیە و لەناو خۆیانەوە هەڵقوڵاوە ..

تۆبڵێی ئەو دەسەڵاتەی لە عیراقدا بەرێوەیە دروست بێت سوودی تەواوی لە وانەکانی پێش خۆی وەرگرتنبێت ؟ تۆبڵێی لە هەموو لێکدانەوە و پێناسەکانی دیموکراتیەت و جیاوازیەکان لەگەڵ دیکتاتۆریەتدا تێگەیشتبێت ؟ تۆبڵێی جارێکی تر کورد نەکەوێتەوە داوی دەست تێکەڵ کردنێکی تر کە باجەکەی بە قورسی بداتەوە؟؟ ■■■■

دکتۆر ئەکرەم نەسان

بەهرەیەک و خێرخوازێکی کورد لە پێناو کاری مرۆڤایەتی لە کوردستان و جیهاندا



دکتۆر ئەکرەم نەسان کێیە ؟

دکتۆر ئەکرەم لە شاری "عفرین" ی خۆرئاوای کوردستان لەدایک بووە و ماوەی ٣٠ ساڵە لە ئەڵمانیا دەژیت هەر لە ئەڵمانیاش خوێندنی پزیشکی بەشی (خاوکردنەوە)ی خوێندوە و خوێندنی باڵای لەم بەشەدا تەواو کردوە. لە زۆربەی نەخۆشخانەکانی ئەڵمانیا وبەلجیکا کاری پسپۆڕی خۆی ئەنجام داوە. لە ساڵی ٢٠٠٣وە سەرۆکی بەشی (پزیشکانی کارەساتە سرووشتیەکانە) لە ویلایەتی Lun.wssی ئەڵمانیا، لەم بوارەشدا خزمەتێکی بەرچاوی هەبووە لە هاوکاری کردنی ئەو وڵاتانەی دووچاری کارەسات هاتوون. لەوانەش:کوردستان، بەلکان، ئەنگولا، تورکیا، ئەمریکای لاتین، سریلانکا و زۆریتر. ئەندامی ژووری پزیشکانی بەلجیکایە و ئەندامی پەیوەندیەکانە لەگەڵ رێکخراوە خێرخوازەکانی هاوپەیمانانی **Nato Office** بەشی چارەسەرکردنی مین و خاوەنی چەندین وتار و وانە گووتنەوەیە لە بەردەم لیژنە پزیشکییەکانی رێکخراوە مرۆڤایەتییەکانی ئەڵمان. لەسەرەتای دیدارەکەمان لەگەڵ دکتۆر ئەکرەم بەو بەرنامە خزمەتگوزارییانەی کە لە کوردستان ئەنجامی داون دەستمان پێکرد. لە وەڵامدا گووتی: حەز دەکەم لە دەسپێکی قسەکانمدا ئەوە بڵێم کە کورد یەک نەتەوەیە هەر ئازارێک لەهەر بەشێکیدا ئازارە بۆ هەمووبەشەکانیتر. بۆیە منیش هەر لەم روانگەیەوە هەوڵەکانم بەردەوام بووە. لە دوای راپەڕینەمەزنەکەی گەلەکەمان لە باشووری کوردستان لەساڵی ١٩٩١ لە کاتی کۆچرەوەکەدا، من وەک پسپۆڕێکی کورد، بۆ ئەرکێکی نەتەوایەتی زووبەزوو کەوتمە خەمی ئەوەی دەبێت کارێکی بەپەلە و فریا گووزاری ئەنجام بدەم. بۆ ئەم مەبەستەش پەیوەندیم کرد بە رێکخراوێکی زۆر لە ئەوروپا بۆ فریاکەووتنی گەلەکمان. بەڕاستی زۆربەی ئەو رێکخراوانە بەدەنگ داواکاریەکەمەوە هاتن لە سەرووی هەموویانەوەش بەرێز وەزیری تەندرووستی فیدراڵی براندنبۆرگ زۆر مەردانە هاوکاری کردین و یەکەمین کەس بوو لە ساڵی ١٩٩١دا داوای لە ئێمە کرد کە تیمێکی بەپەلە ئامادەبکەین و بەرەو کوردستان بچین بۆ فریاگووزاری کوردە ئاوارەکان. ئەوەبوو تیمێکی بەپەلەمان رێکخست لە پێنج دکتۆر لە هەموو بەشە پسپۆڕییە جیاجیاکان. لەماوەیەکی کوورت گەیشتینە شارۆچکەی دیانە. لەوێ دەست بەکار بووین. لە نێوان ساڵی ١٩٩١ هەتا ساڵی ١٩٩٥ توانیم ٧٢ دکتۆر لە ئەوروپاوە بەرم بۆ کوردستان وخزمەتێکی زۆری گەلەکەمان بکەن لە هەموو بوارەکاند. سەرەتای کارەکانمان لە شارۆچکەی چۆمان و رەواندوز دەستپێکرد. دواجار شارۆچکەی" دیانە" بووە بنکەی سەرەکی کارەکانمان. لەم ماوەیەشدا ویڕای پشکنین و چارەسەری، توانیمان دەرمانێکی زۆر بگەیێنینە کوردستان کە ئەوسات کوردستان لە قەیرانێکی بێداودەرمانیدا دەژیا.

پرسیار: رێژەی نەخۆشەکانتان هەفتانە دەگەیشتە چەند و ئەوەی بەلای ئێوە گرنگ بووە چی بوو؟

وەڵام: بەراستی رێژەی نەخۆشەکان زۆر زۆر بوو. بەڵام ئەوەی بەلای ئێمەوە گرنگ بوو، چارەسەرکردنی قوربانیانی" مین"بوون چونکە ئەوان هەفتانە رێژەیەکی زۆر لە ٧٠ تا ٧٥ کەس بوون لەوانەی قاچ ودەستیان لەدەست دابوو و پێوستیان بە چارەسەر کردنی بە پەلە هەبوو.

پرسیار: ناوی رێکخراوەکی ئێوە چی بوو؟

وەڵام : ناوی رێکخراوی ئێمە w.r.d لە رێگەی ئەم رێکخراوەشدا توانیمان ٥٢ ماشێن بە قورسایی ١٣٠ تون لەخواردن و شەکر بگەنینە کوردستان و دابەش بکەین بەسەر خەڵکی کوردستاندا. وێڕای ئەوەش توانیمان ئامێرێکی "تخدیر" بۆ نەخۆشخانەی قەڵادزێ دابین بکەین. و دواجار بەرێز وەزیری تەندروستی براندنبۆرگ ١٤٠ هەزار مارکی ئەڵمانی تەرخان کرد بۆ ئەو کارە فریاگوزاریەی. ئێمە لەکوردستان توانیمان بەوپارەیە بنکەیەکی سەرەکی وەک نەخۆشخانەیەک لە شارۆچکەی "دیانە" دابمەزرێنین و بایەخی سەرەکیشمان لەو نەخۆشخانەیە بۆ کەم ئەندامان بوو، ئەوانەی بە هۆی کارەساتی" مین"ەوە ئەندامەکانی لەشیان لەدەست داوە. لەم بارەیەشەوە توانیمان دەزگایەکی تایبەت بهێنینە کوردستان و قاچ و دەستی دروست کراو بۆ کەم ئەندامان دابێن بکەین بە هەمان شێوە بەشێکی بچوکیش لە نەخۆشخانەی کۆماری لە هەولێر بکەینەوە و خەڵکێکی زۆر سوودی لێوەربگرن. دەتوانم بڵێم ئەوکات ئەو نەخۆشخانەی کە لە شارۆچکەی "دیانە"کردمانەوە یەکەمین نەخۆشخانەبوو لە رۆژهەڵاتی ناوەڕاست. لەو نەخۆشخانەیەش پسپۆڕی تایبەتمان دەهێنا بۆ مەشق پێکردنی کادیری پزیشکی لەسەر هێندێک لەو کارانەی کە پێویست بوو لەوکاتەدا. ئەو پزیشکانەی کە لەدەرەوە دەهاتن ماوەی سێ مانگ دەمانەوە بۆ راهێنانی پسپۆڕانی کوردستان، ئەوپسپۆڕانەش وێڕای کاری راهێنان، کاری خزمەت گوزاریشان لە بوارە جیاجیاکانیان پێشکەش بە کۆمەڵگای کوردەواری دەکرد. لە ماوەی کاردنمان بۆ کەم ئەندامان، نزیکەی ٥٠٠٠ کەس سوودیان لەو نەخۆشخانەیە وەرگرتووە. دیارە کارکردنمان لە کوردستان و نەخۆشخانەی" دیانە" دەسپێک بوو بۆ ئێمە کە ئەو نەخۆشخانەیە بکەینە نموونەیەک لە زۆر شوێنی دیکە کاری بۆبکەین. بۆ نموونە لە بۆسنیا ولە زۆر شوێنی تر. بەڵام" دیانە" هەر بە پلەی یەکەم دەمێنێتەوە لەلای ئێمە، چونکە یەکەمین تاقیکردنەوەمان بوو بە سەرکەووتووی بەئەنجام گەیشت . لەکۆتایی ئەم دیمانیەماندا ئەوەما بیڵێین کە دکتۆر ئەکرەم جگە لەکاری پزیشکی لەدەرەوەی کوردستان رۆڵێکی بەرچاوی هەیە لە ئاستی بەرزدا لەبەشداری کردن لەکۆڕو سیمیناری سیاسی جۆراو جۆر سەبارەت بە بەرگریکردن لەمافی نەتەوایەتی کورد و دوا سیمیناریشی ئەو مێزگردەبوو کە حزبی **CDU** لەشاری" بۆن" سازیدا و دکتۆر ئەکرەم لە بەرامبەر کۆنسۆلی تورک بەڕاشکاوی لەبەردەم ئامادەبوانێکی زۆری ئەڵمان رەخنەی لەسیاسەتی حکوومەتی تورک گرت کە دەرهەق بە گەلی کوردستان لە تورکیا ئەنجامی دەدات. ■■■■

ئامادەکردنی لوقمان بەرزنجی

مانای هونەر

بەشی چوارەم — **وەرگێڕانی لە فارسییەوە سەربەست خەسرەو عارف**

١١ـ ناوچەی زێڕینی

دابەشکردنی زێڕینی "Golden Section" لەسەرەتای رۆژگاری فەلسەفەی یۆنانەوە، یۆنانییەکان هەوڵیانداوە لە هونەردا یاسایەکی ئەندازەیی بەدیبێنن، تاکو هونەرو جوانی بە یەکەوە پەیوەست بکەن و بیگونجێنن، "هارمۆنی" بە پەیڕەوکردنی هاوگونجاندن **Prototype** بەدیدێت، بەمەش دەتوانین ئەمە بسەپێنین کە ئەم هاوگونجاندنانە نەگۆڕن و لۆژیکی دەردەکەون. هاوگونجاندنی ئەندازەیی ناسراو بە "دابەشی زێڕینی" چەندەها بە ناونیشانی هاوشێوەیەک، کلیلی نهێنییەکانی هونەرە و بەکاربردنی نەک تەنها لە هونەردا بەڵکو لە سرووشتیشدا هەمان سوودی هەیە، بە جۆرێکی وەها کە هەندێ جار رێزێکی باوەڕداری دەخەنە پاڵ. لە سەدەی شازدەهەم دا گرووپێ لە نووسەران سێ بەشی ناوچەی زێڕینیان پەیوەست دەکرد بە سێ بەشی حەزرەتی مەسیحەوە.

دابەشی زێڕینی لە دوو بابەتی ـ ئیقلیدس دا، بەیان کراوە: کتێبی دووەم بابەتی " دابەشکردنی هێڵێکی راست، بە جۆرێ کە لاکێشەکانی بەدیهاتووە لە درێژبوونەوەی هەمان هێڵدا یەکێ لە بەشە یەکسانەکانی چوارلایەک بێت کە لەگەڵ بەشێکی تردا درووست دەبێت". کتێبی شەشەم، بابەتی ٣١ " دابەشکردنی هێڵ بە رێژەی خودی ناوەند و هەردوو لا". دەستووری کارکردنی ئەم باسە ئەمەیە کە هێڵێک " هێڵێکی سنووردار" بەجۆرێ دابەش بکەین کە رێژەی پارچەی کورتتری لەگەڵ پارچەی لێکچووی درێژتر لەودا هاوشێوەبن بە هەمان هێڵ، ئەو پارچانەی کە بەدیدێت بە روویەکی هاوشێوە ٥ بە ٨ دەبێت " یان ٨ بە ١٣ و ١٣ بە ٢١ و بەم جۆرە"، بەڵام ئەم رێژەیە هەرگیز دیاریکراو نییە بەڵکو هەمان شتە کە لە ریازییاتدا بە ژمارەی گەنگ یا لاڵ ناسراوە... لەم بارەیەوە باسی زۆر نووسراوە و لە ناوەندی سەدەی رابردوودا لێکۆڵەران بە سووربوونێکی زۆرەوە لەو بارەیەوە توێژیویانەتەوە. نووسەرێکی ئەڵمانی بەناوی تسایسینگ **Zeising** هەوڵی دا تا ئەوە بسەلمێنێ کە دابەشی زێڕینی کلیلی نهێنی ئەندام ناسی‌یە **Morphology** لە سرووشت و لە هونەردا. هەروەها گوستاف تیۆدۆر فیشنەر **Gustaf Theodor Fechner** بنیاتنەری جوانناسی ئەزموونی‌یە، بەرهەمەکانی لە ساڵەکانی حەفتاکانی سەدەی رابردوودا بڵاوکرایەوە؛ لە هەمان مەسەلەی دابەشکردنی زێڕینی کۆڵیوەتەوە. لەو کاتەوە، گشت ئەو بەرهەمانەی کە دەربارەی جوانناسی نوسراون هەمان بابەتیان لەبەرچاو گرتووە. زایسینگ لەڕووی زیادەڕۆییەوە وای بۆچووە کە لە بەرهەمی هونەریدا دابەشی زێڕینی لەگشت



ئافرەتی پاڵدەرەوە، لە بەردی سەوزی هۆرنتۆن، شاکاری هونەری مۆر، ١٩٣٠ گالەری میللی کەنەدا، ئۆتاوا

لایەکدا دادوەر و زاڵە، بەڵام بەدیهێنانی تیۆریستانی دوای ئەم، دان بە رایەکانیدا نانێن، هەروەها دەتوانین ئەوە بسەپێنین کە لەسەر هونەرمەند پێویستە، ئەو دابەشە زێڕینییە ژیرانە لە داڕشتنەکانی‌دا رێنمایی بکات، یان بە یاریدەی هەستی لێکچواندنی خۆیەوە، واتە غەریزە ، بەڕوویەکی نادیار و ناتەواو پێی بگات. لە پێوانەکردنی درێژی و پانی پەنجەرە و دەرگا و لاپەڕە و چێوەی کتێب و رۆژنامەدا زۆر جار سوود لە دابەشی زێڕینی دەبینین، گوایە گشت پارچە و گۆنیا و تەراز و ویان شاوڵ لەسەر هەمان بنەمان؛ هەرەمەکانی میسریش لەسەر هەمان بناغە دارێژراون... کەنیسەی سەردەمی گوتیک بە هەمان رێژە واتە درێژی باڵای کەنیسە و تەلار و ستوون و تاق و منارە و بورج...هتد بەهەمان بۆچوون داهێنراون. ئەو هاوگونجاندن و رێژەگەرییە لە هونەری فۆتۆگرافیشدا بەکاردێت: رێژەی بۆشایی سەرەوەی هێڵی ئاسۆ لەگەڵ فەزای ژێری هەمان هێڵدا و بۆشایی پێش لەگەڵ بۆشایی پاشکۆ، هەروەها دابەشکردنی ستوونی تابلۆ سەر بەهەمان دابەشکردنی زێڕینی، وێنەکانی پیرودیلا فرانسیسکا **Piero della Francesca** نموونەی بەهێزن بۆ نیشاندانی ئەندازەنواندن و دابەشی زێڕینی

١١ـ هارمۆنی هونەری

نەک تەنها دابەشی زێڕینی، بەڵکو رێژە ئەندازەییەکانی دیکەش وەک چوارلا لەناو هەر لاکێشەیەکدا کە لاکانی یەکسان بێت بە درێژایی هەمان لاکێشە، تا رادەیەک بەدەستهێنانی هارمۆنیی تەواو ناکۆکی دەخوڵقێنێ، هەمان ناکۆتایی رێژەی ئەم پێکهاتانەیە کە میکانیزمی هارمۆنیی تەواوی بەرهەمێکی هونەری ناشیاو دەکات؛ چونکە خاڵە بڕەرەکان لەو یارییەدا نەگۆڕ و دیارن، بەکاربردنیان بۆ بەدیهێنانی ئەنجامی باش پێویستی بە غەریزە و دیدی سرووشتی‌یە. حەز دەکەم بۆچوونێک کە پەیوەستی پێوانەی شیعری بخەمە روو، دەزانم کە کێشو وەزن **Rhythm** لە شیعردا یەکلایە و ناتوانێت بەرگە بگرێت، بەو ئاراستەیە شیعر بوار بەخۆی دەدات کە بلکێ بە کێشەکانییەوە و مامەڵەیان پێ بکات. لە ئەنجامدا شیعر گەلێک رازاوەتر دەبێت؛ بە هەمان هاوسەنگی لە هونەری پلاستیکیدا هەندێک هاورێژەی ئەندازەیی شاراوەبوونی هەیە لە پێکهاتی جیهاندا و دەشێ بە پێوانەکاری بەردەوامبن کە هونەر بە روویەکی تەواو لێیان دوورەپەرێزە ـ رادە و سنووری ئەم دوورەپەرێزییەش وەک لادانی شاعیرە لەکێشی شیعر و خۆی پابەندی بنەما نەکات، بەڵکو پابەندی دەربڕێنی غەریزی و هەستیارانەی هونەرمەندانەی خۆی بێت. هەست دەکەم شیکردنەوەی جای هامبیج **Jay Hambidge** دەربارەی گوڵدانی یۆنانی ئەنجامی هێناوە، پڕ سەرنجترین و سەرکەوتووترین شاکاری ئەندازەیی بەرهەمێکی هونەری‌یە، وەک بزانم گوڵدانی یۆنانی لەسەر بنەمای دەستووری ئەندازەیی درووستکراوە بە هەمان بەڵگە کەماڵ و تەواوی ئەو گوڵدانانە سارد وبێ گیانن. لە گۆزەیەکی دەستکردی بابایەکی دێهاتی سادەدا زۆرجار جوانی و شکۆی زیاتر بژێو بەدی دەکرێت، لە راستی‌دا یابانییەکان چەرخی گۆزەکانیان بە ویستی خۆیان خراپ دەکەن، چونکە باوەڕییان وایە کە جوانی راستەقینە تا ئەو رادەیە رێکوپێک نییە.

درێژەی هەیە

گرووپی موزیکی گەڕیان بناسین



ئاراس محەمەد صابرـ گرووپی موزیکی گەڕیان لەو تیپە چالاکانەیە کە لە ڤیستیڤاڵی گۆرانی و موزیکی کوردی بەشداری کردووە، بەرهەمەکانی بە شێوەیەکی هونەری و سەرکەوتووانە نماییش کردووە. بۆ زیزتر ئاشنابوون بەم گرووپە هونەری‌یە، پەیامی کورد لە نزیکەوە لەگەڵ چەند ئەندامێکیان دوا و چەند پرسیارێکی ئاراستەکردن:

پ: دەتوانن خۆتان بە خوێنەرانی رۆژنامەکەمان بناسێنن؟

و: ناوم "کارزان مەحمود" تارژەن و لێپرسراوی گرووپەکەم.

پ: گرووپی گەڕیان، کەی وچۆن درووست بوو،تا ئێستا کارەکانتان چین؟

و: ئەم گرووپە لە ساڵی ٢٠٠٠ دا پێکهات بە سەرپەرشتی مامۆستای موزیکژەن "دلێر حسێن" و سەر بە دەزگای چاپ و راگەیاندنی خاکە، پاشان مامۆستا دلێر لە گرووپەکەدا نەما و ئێستاش ئەم گرووپە لەم بەڕێزانە پێکهاتووە:

١ـ کارزان مەحمود ـ تار ژەن
٢ـ خەلیل عەبدوڵڵا ـ عود
٣ـ ئیبراهیم نەجمەدین ـ زەرب
٤ـ سەروەر قادر ـ دەف
٥ـ کاروان محەمەد حەمە ـ باڵەبان
٦ـ نەورۆز مەولود ـ دەهۆڵ
٧ـ نیاز محەمەد ـ سەنتور

بۆ لاپەڕەی ٧

دیداری هەڵکەوت زاهیر لەگەڵ:

هونەرمەند بەهجەت یەحیا



چەند جوانە دەنگێ بە عەشقەوەبێ و هەناسەی دڵێکی رەنگاوڕەنگ بێت، دەنگێ تەنها بە رۆحەوە بڵێ و لە ئارامیدا بیبیسترێ.. ئەوە ئەو ئاوازەیە کە بەهجەت یەحیا هەموومان دەبات بۆ دنیای رۆحانییەت و وامان لێدەکات هەستبکەین کە لە جیهانێکی فراوان و پڕ لە هەست و سۆز و خۆشەویستیدا بژین.

هەڵکەوت: گۆرانی لای تۆ چی‌یە؟

وەڵام: گۆرانی هاوارەکانی ناخمە

هەڵکەوت: بۆچی گۆرانی بۆ عەشق دەڵێیت؟

وەڵام: عەشق گیانی خۆبەخشینە، فەنابوونە، لە راستیدا نەمرییە، مرۆڤ هەتا دوا هەناسەکانی وێڵە بەدوای خۆدۆزینەوەدا. عەشق ئەو جیهانەیە کە رۆحی کۆچەریمان تیا نیشتەجێ دەبێ و هەست بە ئاسوودەیی دەکەین، بەرانبەر بەو هەموو کارەسات و پێشێلکاری و ئازار و رەشبینی و خوار و خێچییەی کە هەیە،جارێکی تر عەشق ژیان جوان ئەکاتەوە و ئەبێتە گڕێکی مەعنەوی و وامان لێدەکات بەردەوامبین و کۆڵنەدەین، بگەڕێین، جوانییەکان بدۆزینەوە.

هەڵکەوت: تاراوگە بۆ بەهجەت یەحیا بووەتە دابڕان یان ئەزموون و داهێنان؟

وەڵام: تاراوگە سزای ژیانە بەسەر تاراوگەنشیندا، پەرتبوونی مرۆڤە لەبەر ئەوەی جەستە لە جێگایەک ئامادەیە و رۆح لە جێگایەکی تر، بەڵام لەگەڵ ئەوەشدا ئەزموونێکی گەورەیە و تێڕوانینمان بۆ ژیان ، بۆ جیهان فراوانتر دەکات و بێگومان رەنگدانەوەی هەیە بۆ سەر بەرهەمە هونەرییەکانمان.

هەڵکەوت: بۆچی ستایل لە گۆرانی و موزیکی کوردیدا جیا نەکراوەتەوە، دەنگی تۆ چ ستایلێکی لەخۆگرتووە؟

وەڵام: چۆن جیا نەکراوەتەوە، گۆرانی و مۆسیقا پێش ئەوەی هەرشتێک بێت ستایلە. تۆ تەماشای ئەم هەرا و هوریایە مەکە کە ئێستا بەهۆی جیهانگیرییەوە هاتۆتە ئاراوە، نەک هەر موزیکی کوردی بەڵکو هەموو جیهانیشی گرتۆتەوە. ئەو هونەرمەندانەی کە کارەکانیان بە نەمری لە مێژووی مۆسیقا و گۆرانی کوردیدا سەقامگیر بووە، هەر یەکە بۆ خۆیان قوتابخانەیەکن، بۆ نموونە سەمفۆنیاکانی مامۆستا "قادر دیلان" و شاکارە جوانەکانی ئەرسەلان کامکار و پەنجە زێڕینەکانی مجتەبای میرزادە، ئەی ئەوانە ستایل نین، چین؟، یان مەقام بێژە مەزنەکانمان هەر کەسە دەستوورێکی تایبەت بەخۆی هەبووە بۆ نموونە "تایەر تۆفیق"، مامە سێوە، سەید عەلی ئەسغەر، ساڵح دیلان، ئایا هەریەک لەمانە جیهانێکی تایبەتی نین بۆخۆیان؟ ئەی ئەمانە ستیایل نین،چین؟. بەگشتی "موزیکی ترادیتسیۆن" سوننەتیمان هەیە، موزیکی ئۆرکسترامان هەیە کە ئێستا هونەرمەند "عەبدوڵڵا جەمال" کاری بۆ ئەکات، گۆرانی هەڵپەڕکێمان هەیە کە ئەویش بوارێکی تایبەتییە بۆ خۆی، هەندێ تیپی رۆژئاواییش هەن کە موزیکی پۆپ و جاز بەکاردەهێنن. ئەگەر ئەمانە ستایل نەبن!!! ئەی ئەبێت ستایل چی بێت؟. من رێچکەیەکی تایبەت بەخۆمم هەیە، ئەو هۆنراوانەی کە هەڵیانئەبژێرم ئەبێت بە رۆحم ئاشنابن، پاشان ئاوازییان لەسەر دادەنێم، زیاتر حەز ئەکەم ئامێرە میلییەکان بەکاربهێنم هەرچەندە بە دوو ستایل کارم کردووە مۆسیقای ترادیتسیۆن و مۆسیقای ئۆرکستی کەمانچە.

هەڵکەوت: زۆربوونی ژمارەیەکی زۆر گۆرانیبێژ چۆن دەبینیت؟ ئایا دەتوانرێ بە هەموویان بگوترێ هونەرمەند؟

وەڵام: هەموو کەسێک ئەتوانێت گۆرانی بڵێت بەڵام هەموو گۆرانییەک ناچێتە مێژووەوە.

هەڵکەوت: هەواڵی هونەرییتان چییە؟

وەڵام: بەرهەمێکی نوێ‌یە، ئەمساڵ بڵاودەبێتەوە

هەڵکەوت: موزیک و گۆرانی ئەمڕۆ چۆن دەبینیت؟

وەڵام: کە ئەڵێین ئەمڕۆ مانای سەردەم، کە ئەشڵێین سەردەم مانای نابێت ئەگەر جیهانگیریمان لەیاد بچێت، چونکە هەر سەردەمە و بەرووبوومی خۆی هەیە. ئێستا جۆرێک لە گۆرانی خێرا لە ریتم و سادە لە وشە و میلۆدی کە زیاتر بایەخ ئەدرێت بە رووکەش هاتۆتە ئاراوە، ئەوەش بێگومان رەنگدانەوەی ئەم تێکەڵاوبوون و بە یەکاچوونەی جیهانە و بە چەند دێڕێک ناتوانین لەسەری بدوێین.

هەڵکەوت: چی نەکراوە بۆ هونەری کوردی و چی بە پێویست دەزانیت بۆ پڕکردنەوەی ئەو بۆشاییانە؟

وەڵام: هونەرمەندی کورد یەک دنیا زەحمەت دەکێشێت هەتا بەرهەمەکەی لەدایک ئەبێت بەڵام هەر ئەوەندەی کە تەواو بوو ئیتر بەرهەمەکەی لێ ئەبێت بە بەڵاو نازانێت چۆن بڵاوی بکاتەوە. هەرچۆنێک ئەکۆشێت هەر بێ سوودە هەموو جارێک تووشی دەردەسەری دێت. ئەوەی پێویستە هەبێت دەزگای فەرهەنگییە کە ئەو جۆرە کارانە لە ئەستۆ بگرێت، بۆ نموونە کۆمپانیای چوارچرا هەنگاوێکی باشە هیوادارم نموونەی تریشمان هەبێت.

هەڵکەوت: دوا وتەت بۆ پەیامی کورد چی‌یە؟

وەڵام: ئەنجامدانی هەر کارێک گرنگە بەڵام بەردەوامبوونی گرنگترە. هیوای بەردەوامیتان بۆ دەخوازم.■■■■

بەشی دووهەم

خێزان لە دەنگە نوێیەکانی هاوچەرخی جیهانیدا

دانا رەئوف . سوید

شانۆنامەی: منداڵە سارد و سڕەکە
نووسینی: ماریۆس ڤۆن ماینبۆرگ(١)
Marius Von Mayenburg
وەرگێڕانی: ئۆلف پێتەر هەڵبێری
Uif Peter Hallberg
ریژی : ستاڤان ڤاڵدەمێر هۆڵم
Staffan Valdemar Holm
شانۆی: شانۆی پادشایەتی"دراماتن"
Dramaten – Lilla scenen

منداڵە سارد وسڕەکە

"ماریۆس ڤۆن ماینبۆری" سەرلەنوێ لە شانۆنامەی "منداڵە سارد و سڕەکە" دا دەگەڕێتەوە سەر گیروگرفت و مەسەلە گەوهەرییەکانی خێزان. بەڵام لەم بەرهەمەیدا بە شێوەیەکی گشتگر زیاتر قووڵ دەبێتەوە و کارەکتەرەکانی بە تەواوەتی رووت دەکاتەوە و خێزانیش دەبێتە کێڵگەیەکی پڕ لە ئاماژە و سیمبۆل. کەسایەتییەکانی "منداڵە سارد وسڕەکە" بە رێکەوت لە قاوەخانەی "پۆلیگەم" کۆدەبنەوە: دایک،باوک و هەردوو کچە گەورەکەشیان، پیاوێک، ژن و مێردێکی گەنج و منداڵەکانیان کە هەمیشە لەرزی لێهاتووە و سەرمایەتی، هەروەها هاوڕێیەکی ئەم خێزانە گەنجە کە تازە وازی لە خۆشەویستەکەی هێناوە. رووداوەکان لە درووستکردنەوەی پەیوەندی بە ئافرەتێکی ترەوە، رووبەڕووبوونەوەیەکی چاوەڕوانکراو، هەڵوێستەی رەش، کۆمیدیایەکی دڵتەزێن و جیاوازدا بەرجەستە دەبێت. کارەکتەرەکان سەرلەنوێ لە بەگژداچوون، پێکدادان، زەماوەند و پرسەدا رووبەڕووی یەکتر دەبنەوە. لەم شانۆنامەیەدا هەموو کارەکتەرەکان بەشێوەیەکی بەردەوام لەسەر شانۆن. کات و شوێن بە تەواوەتی تێکشکێنراوە، رووداوەکان لە پێکداچوونێکی بەردەوامدایە و هەموو کارەکتەریش بۆچوونێکی تایبەت و جیاوازی هەیە سەبارەت بە رووداوەکان هەروەها بینەرانیش بەردەوام هەموو ئەم کارەکتەرانە لەسەر شانۆ دەبینێ. لەم گێژاوی رووبەڕووبوونەوە و رووداوە یەک لەدوای یەکدا، چیرۆکێک بە ئاشکرا دەردەکەوێت، پیاویک یارمەتی ئافرەتێک ئەدات تا لە گرفتێکی ئاڵۆزی خێزانی رزگاری بێت. لە یەکێک لە دیالۆگەکاندا ئەو پیاوە رزگارکەرە دەڵێت" من کابرایەکی توندوتیژم، بەڵام هەندێ هەڵوێستەی وا هەیە کە مرۆڤ ناچار دەکات پەنابەرێتە بەر توندوتیژی." ئەم ئافرەتە دوای رزگاربوونی لەو گرفتە ئاڵۆز و کارەساتە هێندە لەم پیاوە نزیک دەبێتەوە تا لە ئەنجامدا دەبنە خێزانی یەکتری؛ بەڵام هەر زوو درک بەوە دەکات کە ئەم پیاوەش سەرلەنوێ کارەسات و گرفتێکی گەورەترە بۆ ئەو، هەروەک خێزانەکەی لەوەوبەری خۆی. بازنەیەکی دووبارەبوونەوەی کێشە و گیروگرفتەکان. لە ئەنجامدا ئەم ئافرەتە ناچار دەبێت خۆی لەم پیاوەش رزگاربکات."

ماریۆس ڤۆن ماینبۆری" سەبارەت بە چۆنییەتی نووسینی ئەم پیەسە دەڵێت: "یەکجار لە ئوسترالیا بیرم لەم چیرۆکە کردەوە، یەکەم جاریشم بوو بچمە ئەم وڵاتەوە. دوای بیست و چوار کاتژمێر بەر لەوەی بگەینە ئوسترالیا لە "سێنگاپورە" لاماندا، هۆڵی فڕۆکەخانەکە لە باخچەیەک ، یان ژوورێکی دانیشتن دەچوو، زۆر بە پاکی راگیرابوو، زەوی ودیوار و پەنجەرەکان ئەبریسکانەوە. گەرما بەتینەکەی دەرەوە لەو ژوورەدا بەرگری بۆ نەدەکرا، لەوێوە بەڕێکەوتین بۆ دوورگەیەکی زۆر بچووک لە دەرەوەی سنوورەکانی وڵاتی ئوسترالیا لەو دورگەیە لەپڕ لە کەناری یەکێک لەو رووبارانەدا بیرم لەو چیرۆکانە دەکردەوە کە بە منداڵی دەمگێڕانەوە. من هەمیشە لەگەڵ برا بچووکەکەمدا شانۆی بووکە شووشەمان پێشکەش دەکرد. نەمایشەکانمان لە رۆژی لەدایکبوون و رۆژانی جەژنی سەری ساڵدا پێشکەش دەکرد، لەگوێ رووبارەکە بیرم لەوە دەکردەوە کە هەمیشە چیرۆکەکانمان باسی رزگارکردنی کەسێکی دەکرد، هەمیشە کەسێک لە بارێکی گرانی خەتەرناکدا خۆی دەبینێتەوە و کەسێکی تر دێت رزگاری دەکات. کۆمەڵێ دز و پیاوخراپ شازادەیەک دەفڕێنێ، دوای ئەوە شاسوارێک پەیدادەبێت و شازادەکە رزگار دەکات. چەند ئێمە دەچووینە تەمەنەوە و گەورەدەبووین، هێندەش چیرۆکەکانمان ئاڵۆزتر دەبوو. دوا نەمایشی بووکە شووشەییەکەمان باسی وەستایەکی "پیتزا" درووستکدنی دەکرد، کە پیاوخۆرێک زیاتر حەزی دەکرد ئەو وەستایە لەبری پیتزاکە بخوات. بەڵام چیرۆکەکانی هەمیشە کۆتاییەکی دڵخۆشانەی هەبوو، بۆ نموونە زەماوەند کۆتاییەکی لۆژیکی زۆربەی ئەو نەمایشانەمان بوو. ئا لەو کاتەدا کە لەو کەناری رووبارەوە و لەوسەری گۆی زەویدا بە تەنها دانیشتبووم بیرم لەوە دەکردەوە کە هیچ گەرەنتییەک نیە کە ئەو شاسوارانەی پەریزادەکان رزگار دەکەن، خۆیان لێ رزگار دەکات. ئەم مەسەلەیە منی جوڵان، ئەمەش مەسەلەیەکە کە دەمەوێت لەسەری بنووسم."(٢)

لە شانۆنامەی "منداڵە سارد وسڕەکە"دا " ماریۆس ڤۆن ماینبۆری " تەکنیکێکی جیاواز لە پیەسەکانی تری بەکاردەهێنێ. بۆ نموونە لە دیمەنە مۆنۆلۆژەکاندا دەگەڕێتەوە بۆ رابردوو، بەڵ ام خودی یادگارەکانی کەسایەتییەکان لە تەقەلای گەڕانەوەدا نین بۆ رابردوو؛ بەڵکو بیرەوەرییەکان وەک کۆمەڵێ یادگاری هەستپێکراو دەبێتە جێگای سەرلەنوێ زیندووبوونەوەی رووداوەکانی رابردوو، سەرلەنوێ رابردووش دەبێتە رووداوێکی بزۆز لە ئێستەدا، نووسەر خۆی ئەم تەکنیکەی ناوناوە "دراماتۆرگی بیرەوەرییەکان"، ئەوەی لەم تەکنیکەدا گرنگە ئاماژەی بۆ بکرێت ئەوە رابردوو، ئێستە و ئایندە لە جووڵانەوەیەکی بەردەوامی دیالیکتیدایە. رابردوو لە رووداوەکانی



ئێستەدا کاردەکات، یادگارەکانیش کۆمەڵێ بیرەوەری زیندوو پێکدەهێنێ، ئەو بیرەوەریانەش وەک کردارێکی بزاو دەبێتە زەمینەیەکی لەباری درووستکردنی کۆمەڵێ پەیوەندی لە ئێستەو لە ئایندەشدا. ئەم تەکنیکە هەر چەندە نزیکە لە تەوژمی رۆمان نووسە نوێخوازەکانی ئەدەبی فەرەنسی، لێکنزیکبوونەوەیەکی راستەوخۆی تەکنیکی سینەماشە. دیمەنەکان بە سەربەستییەکی تەواوەتی لە نێوان شوێن و کاتدا گەمەدەکەن، ئەمڕۆ و دوێنێ لە یەکەیەکی هونەری یەکگرتوودا دەکاتە هاوکێشەیەکی هەمەلایەن و کەسایەتییەکان گەورەدەبن، پەرەدەسێنن و لە پێشکەوتنێکی بەردەوامدا دەبن.

گەمەیەکی توندوتیژ :

ئەمە یەکەم جارە شانۆی نەتەوایەتی لە ستۆکهۆڵم "شانۆی پادشایەتی" شانۆنامەیەکی ئەم نووسەرە گەنجە پێشکەش بکات. شانۆی پادشایەتی دوای چاودێرییەکی ورد و ئاگادارییەکی تەواوەتی بزووتنەوەی شانۆ لە ئەوروپا و دەرکەوتنی پەیام و دەنگی ئەم نووسەرە گەنجە، دەرگاکانی شانۆکەی بۆ ئەم رەنگە بە بەهایەی ئەمڕۆی شانۆی هاوچەرخی ئەوروپی دەکاتەوە.(٣)

شانۆنامەی "منداڵە سارد و سڕەکە"، درێژەپێدانێکی تراژیدیای خێزانە لە دیدێکی قووڵی زیندەوەرزانییەوە و لەم رووەوە هەموو سنوورە کۆمەڵایەتییەکان دەبەزێنێ. هەستە ئاژەڵییەکان دەبێتە سیمایەکی ترسناک و دڕندەی خێزان. قاوەخانەی "پۆلیگەم" دەبێتە پلاتفۆرمێکی ئەو گەمەیە و کارەکتەر و رووداوەکان لەو شوێنەدا یەکتری تەواودەکەن و لەوێشدا هێڵە توندوتیژ و بێبەزەییەکانی کەسایەتییەکان لە نێو شانەکانی خێزانیدا بەرجەستە دەبێت. ئەو کارەکتەرانە بە رێکەوت، هەر وەک سەرەرێگایەک، لەو قاوەخانەیەدا کۆدەبنەوە و رووداوەکان بەرە و چارەنووسێکی نادیاریان دەبات. دیمەنەکان لە شێوەی کۆمەڵێ تابلۆی زۆر کورتدا تێدەپەڕێت، شتێک لەدوای خۆیەوە بەجێدەهێڵێت، بۆشاییەک، یان تارماییەکی ترسناک. بینەرانیش لەدوای هەر تابلۆیەک هەست بە سەرسوڕمان و ناڕەحەتییەکی ئاشکرا دەکەن. دایک بە کچەکەیەوە، برا بە خوشکەکەیەوە، باوک بە کچەکەیەوە، ژن بە مێرد و مێرد بە کوڕەکەیەوە پرۆسێسێکی تەمومژاوی، سترکتووری کات و شوێن دیاری دەکات. لە ناو ئەو کارەکتەرانەشدا "پیاوێکی تەنها" قوت دەبێتەوە و گەرەکییەتی راوە ئافرەت بکات. بەبێ سڵەمینەوە دەچێتە تەوالێتی ئافرەتان و بەوپەڕی خۆشحاڵییەوە گوێ لە خوشەی میزی ئافرەتەکان دەگرێت. ئەم مشتەرییە لە دەرەوەی سنووری ئەو خێزانەدایە کە لەو قاوەخانەیەدا کۆبوونەتەوە؛ بەڵام پاش ماوەیەک دەتوانێ یەکێک لە "کچەکانی" ئەو خێزانە لەخشتەببات و بەلای خۆیدا رایکێشیت. سینۆگرافیای نەمایشەکەش لە بەشی یەکەمی شانۆنامەکەدا رووبەری قاوەخانەکەیە، بەڵام لە بەشی دووەمدا وێنەی پشت مێزی بارمەندەکەیە. لەبری هەشت کارەکتەریش شانزە کارەکتەر بەردەوام لەسەر شانۆکەن. ریژیسۆری نەمایشەکە لە گەمەیەکی زۆر بە سەلیقە و دیدێکی شانۆیی فراوانەوە ئەو هەشت کەسایەتییەی کردۆتە شانزە. هەموو کارەکتەرێک کۆپییەکی لە شێوەی بووکە شووشە و بە بارستەی خودی ئەکتەرەکەیە. هەندێ جار کارەکتەرەکان رووبەڕووی بووکە شووشەیەک دەبنەوە، یان رووبەڕووی خودی خۆیان. هەندێ جار ئەم دابەشکردنە حاڵەتێکی کۆمیدی دروست دەکات، کەچی لەولاوە هەمان ئەو پیاوە و بە هەمان جلوبەرگەوە دەبینین خۆی داوە بەسەر مێزی بارەکەدا و پشتی لە بینەرانە. ئەم دابەشکردنە لێکچووەش دووپاتکردنەوەیەکی ونبوونی هەموو جۆرە پەیوەندییە مرۆڤایەتییەکانە. هەروەها پێشێلکردنی خودی مرۆڤە وەک بوونەوەرێکی "تاک"، هەموومان لە بونیادێکی لێکچووی دەستکرددا بەندکراوین و مەوداکانی جووڵە، پەیوەندی و سنوورەکانی سەربەستیمان زۆر دیاریکراوە. پێناسەی کەسایەتی خۆمان لێ زەوتکراوە و هەموو یەکێک لە ئێمە بینەرێکی بێجووڵە و خەولێکەوتووی رووداوەکانی ژیانی خۆمان و دەوروبەرەکەمانین. کۆپیکردنی کارەکتەرەکان و بەم شێوازە کردەییە لە خاڵە گرنگ و بەبەهاکانی نەمایشەکە و دیدی ریژی یەکاڵای پرۆسە شانۆییەکە کردۆتەوە. بەمەش پیەسەکە و چۆنییەتی نەمایشەکە " وەک پرۆسەیەکی هونەری و کردەیی" لە دوو هێڵی تەریبیدا درێژدەبنەوە و یەکتری تەواو دەکەن.

سەرچاوەکان:

١- ماریۆس ڤۆن لە ساڵی ١٩٧٢ لە دایک بووە و لە شاری میونشن گەورەبووە، دوای خوێندن، جارێکی تر رێزمانی ئەڵمانی دەخوێنێ ودواتر دەبێتە پسپۆڕ لە بواری ئەدەبی سەرزارەکی و فەلسەفە لە چاخەکانی ناوەڕاستدا. لە تەمەنی بیست ساڵیدا لەشاری مینشنەوە دەگوێزێتەوە بۆبەرلین تا هونەری پیەسی شانۆیی بخوێنێ، لەم بوارەدا هەلێکی گرنگی بۆ هەڵدەکەوێت و لەساڵی ١٩٩٩ دەبێتە هاوکارێکی راستەو خۆی رژسێۆری ناسراوی ئەڵمانی تۆماس ئێوستەرماییەر **Thoms Ostermeir** لە شانۆی **Schaubühne Amlehniner** ئەم نوسەرە پیەسە شانۆییەکانی شانۆ نوسی ئینگلیزی سارا کینی **Sarah Kane** زۆر کاری تێدەکات و هەر لەژێر ئەم کاریگەرییەدا شانۆنامەکانی سارا کینی وەردەگێڕێتە سەر زمانی ئەڵمانی . ماریۆس ڤۆن بە شانۆنامەی (سیمای ئاگرین) ناوبانگ دەردەکات و ئێستە شانۆنامەکانی لەسەر شانۆ گەورەکانی ئینگلستان ، ئیتالیا، یۆنان، پۆڵۆنیا، بولگاریا، فەرەنسا، ئیسپانیا، نەرویژ، دانیمارک و سوید پێشکەش دەکرێت .

٢- پرۆگرامی شانۆییەکە: شانۆی پادشاییەتی ، دراماتن، لەستۆکهۆڵم .

٣- ئەم نمایشەی شانۆی پادشایەتی لە ستۆکهۆڵم (منداڵە ساردو سڕەکە) هەڵبژێردراوە بۆ بەشداریکردنی چوارەم ڤیستیڤاڵی شانۆیی شانۆ نوسە گەنجەکان کە لەسەر شانۆکانی شانۆی شاوبینە ئەم لێنینە پلاتز لە شاری بەرلین پێشکەشدەکرێت.■■■■

درامانووسانی جیهان

مەهدی مجید جاف

٢٥- ئەنتوان چێخۆف
Anton Tchekhov



ئەنتوان پاڤلۆڤیچ چێخۆف لە هەڤدەی مانگی ژانیوەری١٨٦٠دا، لە شاری تاگانورگی روسیا لەدایکبووە. باپیری موڵکداری زەوی و زارێکی زۆر و باوکی ئەنتوان دوکاندار دەبێت، کاتێ ئەنتوان سەرگەرمی خوێندنی سەرەتایی دەبێت، باوکی لە کاسبیدا هەرەس دێنێت و هەژاری رێیان پێدەگرێت. لە ساڵی ١٨٧٩دا، لە زانکۆی مۆسکۆ، لە بەشی پزیشکی درێژە بە خوێندن دەدات. لە هەمان ساڵدا دەست بە نووسین و بڵاوکردنەوەی بەرهەمەکانی دەکات و ساڵی ١٨٨٤،خوێندنی کۆتایی پیدەهێنێت و وەک دکتۆرێک کار دەکات، لە بواری ئەدەبییاتیشدا ناوبانگ دەردەکات. یەکەمین شانۆنامەی بە ناوی (لە شارێکادا)لە ساڵی١٨٨٥دا دەنووسێت و لە ساڵی ١٨٨٦دا، کورتە چیرۆکەکانی لە دووتێی کتێبێکدا بڵاودەکاتەوە، لە زستانی ساڵی دواتردا تووشی نەخۆشی سیل دەبێت. سالی١٨٨٧، گەشتێک بۆ باشووری روسیا دەکات و بەرهەمی ئەم سەفەرەش چیر ۆکەکانی (ڤالۆدیا)و(کاتی سەفەر) و شانۆنامەی(ئیڤانۆڤ) دەبێت. شانۆنامەی(ورچ) لە هەمان ساڵدا دەنووسێت. لە ساڵی١٨٨٨دا، لەلایەن ئەکادیمی زانستی ئیمپراتۆرییەوە، خەڵاتی ئەدەبی پۆشکینی پێدەبەخشرێت و دوای ساڵێک دەکرێت بە ئەندامی یەکێتی نووسەرانی روسیا. لەو رۆژانەدا شانۆنامەی(روحی جەنگەڵ) و (داخوازیکەر) دەنووسێت. ئەوەی شایەنی باسە کە چێخۆفی مەزن لە ساڵی١٨٩٠دا، لە رێی سیبریاوە بۆ دوورگەی ساخالین سەفەرێک دەکات. لەو رۆژگارەدا رژێمی پاشایەتی روسیا حوکمدراوانی سیاسی بۆ دوورگەی ساخالین دووردەخستەوە. چێخۆف لە نزیکەوە چاوی بەو حاڵەتە ترسناکە دەکەوێت و کتێبێک بە ناوی(دوورگەی ساخالین)دەنووسێت و لە ساڵی١٨٩١دا، بڵاوی دەکاتەوە. پاش گەڕانەوەی لە سیبریا، سەفەرێک بۆ وڵاتانی هیند و سینگاپور و سیلان دەکات. لە ساڵی ١٨٩١دا، لە گوندی(میلیخۆڤە) پارچە زەوییەک دەکڕێت و لە تەک دایک و باوکیدا لەوێ دەژین، هەر لەوێدا قوتابخانەیەک بە پارەی خۆی دەکاتەوە. لە هەمان ساڵدا بۆ ئەوروپای رۆژاوا سەفەرێک دەکات و لە ساڵی ١٨٩٥دا، شانۆنامەی (مری دەریایی) دەنووسێت و لە شاری پێتەربۆری دەخرێتە سەر شانۆ، بە هۆی تێنەگەیشتن لە ناوەرۆکی دراماکە و خراپ نیشاندانی لەلایەن ئەکتەرەکانەوە، سەرکەوتن بەدەست ناهێنێت و چێخۆف بڕیار دەدات چیتر شانۆنامە نەنووسێت. هەر لەو رۆژانەدا بە گرووپی شانۆی مۆسکۆ ئاشنا دەبێت و لەگەڵ هونەرمەندانی وەک کونستانتین ستانسلاڤسکی و نیمیرۆڤیچ دانیچینکۆ و ماکسیم گۆرکی ئاشنا دەبێت و هێز و تینێکی بە گوڕتری بۆ دراما نووسین پەیدا دەبێت. لە ساڵی ١٨٩٨دا، شانۆنامەی (مری دەریایی) لەلایەن گرووپی هونەری شانۆی مۆسکۆوە دەخرێتە سەر تەختەی شانۆ و سەرکەوتنێکی مەزن بەدەست دێنێت. لە ساڵی ١٩٠٠دا، بە ئەندامی کۆمەڵەی کولتوور و زانست لە شاری پێتەربۆری هەڵدەبژێردرێت. لە هەمان ساڵدا شانۆنامەی(خاڵ ڤانیا) دەنووسێت و ئۆلگا،ل،کنیپر کە ئەکتەرێکی لێوەشاوی هونەری شانۆی مۆسکۆ دەبێت، دەخوازێت و رۆژ لە دوای رۆژ تەندروستی خراپتر و نەخۆشییەکەی زۆری بۆ دەهێنێت. لە ساڵانی کۆتایی ژیانیدا شانۆنامەی(سێ خوشک) و (باخچەی گیلاس) دەنووسێت. لە ساڵی ١٩٠٤دا، لەگەڵ ئۆڵگای ژنیدا بۆ چارەسەرکردنی نەخۆشییەکەی بۆ ئەڵمانیا سەفەردەکەن و لە مانگی(یولی) ١٩٠٤دا، چێخۆفی دکتۆر و نووسەر، دڵە پڕ میهرەکەی لە لێدان دەکەوێت و ماڵئاوایی لە ژیاندەکات.■■■■

له ساڵیادی لەسێدارەدانی پێشەوای کورد قازی محەمەد

سڵاو له هەڵوێستی جوامێرانەت ئەی پێشەوا



کاتێک که باڵای مرۆڤ له ئاستی لوتکەی چیاکان تێدەپەڕێت و دەبێت مانگێکی چواردە و هەمیشە درەوشەدار، ئەو کاتە دەبێت بڵێین سڵاو له پێشەوای کوردی شەهید. کاتێک که پاک و بێگەردی هەست و خواستی مرۆڤ بۆ گەلەکەی له جوانترین ناسکترین پەڕەی گوڵی نزارەکانی کوردستان دڵڕفینتر بێت، ئەوا پێویستە بڵێین سڵاو له گیانی پاک و ئارامت ئەی سەرکۆماره شەهیدەکەی نەتەوەی کورد. کاتێک که مندااڵێکی کورد ئاڵای کۆماری کوردستان رادەشەکێنێت و بزەی خۆشی هەموو گیانی دەگرێتەوە، ئەوا ئەرکی سەرشانمانە بڵێین سڵاو له هەڵکەر و شەهیدی راستگۆی ئەو ئاڵایە. کاتێک که هەستی نەتەوایەتی هەموو کوردێک له سەرانسەری جیهاندا به ئاوازی دڵفڕێنی سەربەخۆیی کوردستان دەهەژێت، ئەوا کاتی ئەوەشە که یادی مەزنترین شەهیدی رێگەی سەربەخۆیی کوردستان بکەینەوە. کاتێک که پێشمەرگەی کورد له رێگەی پیرۆزی سەربەخۆیی و سەرفرازی کوردستاندا، گیانی پاکی دەکاته قوربانی و مژدەی هاتنی گزنگی سەرکەوتن به نەوەکانی کورد دەبەخشێت، ئەو کاته قوربانییە گەورەکەی تۆی پێشەوا و رابەری هەمیشە زیندو و بەرزتر رادەگرین. کاتێک که هەواڵە دڵخۆشکەرەکانی کوردستان به گەرمانەوەی کەرکوکی دڵی کوردستان بۆ نیشتمان و نەتەوەکەی خۆی و ئاڵای خوێناوی کۆماری کوردستانی شەهیدی تێدا هەڵدەکەن، ئەوا دەبێت بڵێین سوپاس بۆ مامۆستا و رێنماکاری رێبازی عەشقی خاک و نەتەوە. کاتێک که دوژمنانی نەتەوەی کورد رۆژ له دوای رۆژ هێرشی شۆڤینی رەشیان توندتر دەکەن بۆ سەر نەتەوەکەمان و دەخوازن نائومێد و رەشبینمان بکەن له خەبات و تێکۆشان له پێناو سەربەخۆیی کوردستاندا، ئەوا هەر به یادکردنەوەی هەڵوێستی کەم وێنە و جوامێرانەتان تین و گورپێکی بەکجار بەهێز به ورەی هەموو کوردێک دەبەخشن. کاتێک که بەرەبەیانان روو دەکەینە دەرگای یەزدانی مەزن و نوێژ و نزا دەکەین، ئەوا دەڕوانینە ئاسۆ دوورەکانی کوردستانی گەورەی پارچە پارچە کراو و له هەموو پارچەیەکدا رووخساری شیرینتان وەکو مانگی چواردە بەسەر چیا و دۆڵ و دەشتەکانی کوردستانی تینووی سەربەخۆییدا دەگەشێتەوە. کاتێک، کام کات هەموو کاتێک هەر لەیاد و هزری نەتەوەکەتدای و له وانەی قوربانی کردنی گیانی پیرۆزت بۆ خاکی کوردستان دەیان واتا و پەند وەردەگرن و له هەموو کاتێکیشدا که کوردێک له پێناو کورد و کوردستاندا پەتی سێدارە بکرێتە گەردنی، ئەوا پەتی سێدارەکەی ماچ دەکات و پێشوازی له مەرگێک دەکات که دەیخاتە ریزی شەهیدی مەزنی رێگەی سەربەخۆیی کوردستان، پێشەوا قازی محەمەد.

کامە عێراق ؟؟

غازی حەسەن ـ ئەمریکا



بێگومان که دەمانەوێت باسی عێراق بکەین مەبەستمانە باسکردن له دۆزی کورد و دوارۆژی ئەم نەتەوەیە که چەندین سەدەیە دوچاری چەوسانەوە و جینۆسایدو و لەناو بردن کراوەتەوە. راستە کورد هەر بەتەنێ له چوارچێوەی عێراقدا نەچەوسێنراوەتەوە، بەڵام هەلومەرجی سیاسی و کۆمەڵایەتی ئەم بەشەی کوردستان کاراتر و بە رچاو تر له رۆژانی هەنوکەدا دێتە بەرچاو.

کورد ساڵانێکی درێژە کار بۆ بە دیهێنانی دیموکراسیەت بۆ عێراق دەکات، راستە کورد ناتوانێت هیچ چەشنە ئایدۆلۆژیایەکی دیاریکراو بەسەر نەتەوەی عەرەبدا بچەسپێنێت، بەڵام بڕوای وایە دیموکراتی بوون رێگەی سەرەکی دەربازبوون و کۆتایی پێهێنانی کێشەکانە. پێمان وایە ئەم مەسەلەیە پەیوندی پتەوی بە سەرجەم ژیانی خەڵکی عێراقیشەوە هەیە.

له راستیدا سەرکردایەتی سیاسی کورد ئەگەر له ژێر کاریگەری رووداوەکانی دەرەوەش بووبێت هەمیشە کاری بۆ چەسپاندنی دروشمی دیموکراسی کردووە، راستە هەندێک لایەنی توندرۆ، دیموکراسیەت به دەستکردی رۆژئاوا ناوزەد دەکەن و وای پیشان دەدەن دیموکراتی بوون دورکەوتنەوەیە له سەرچاوە سەرەکییەکانی ئیسلام و بەمەش کۆمەڵگا دوچاری بەرەڵایی و چاولێکەری رۆژئاوایانە دەبێت. لێرەوە ئەم لایەنانە کورد به ئیسرائیل و نۆکەری دوژمن ناودەبەن، هەروەسا هەڵگرانی بیری شۆڤینی و بەرچاوتەنگی نەتەوەیی عەرەبی دیموکراسی بوون به دابەشبوونی عێراق دەچوێنن و له رێگەی سەپاندنی بیرۆکەی پاراستنی یەکێتی خاکی عێراق پێشێلی مافی نەتەوەیی کورد و نەتەوە و دینەکانی تر دەکەن.

کورد له کاتی هەنوکەدا پێگەی سیاسی و جەماوەری له سەرجەم لایەن و نەتەوە و گروپەکانی تر بەهێزترە. کورد بۆتە لایەنی سەرەکی هاوکێشە و مللانێکان، له راستیدا کورد جاری یەکەمە به پێداگرتنەوە داوای دەسەڵاتی سیادی و دیاریکردنی سنوری جوگرافی کوردستان و دەسەڵاتی فیدرالی بۆ هەرێمی کوردستان دەکات. به واتای ئەوەی کورد بڕیار له بەشێکی گرینگی چارەنووسی سیاسی خۆی دەدات. له تەک ئەوانەشدا کورد دەکارێت راپرسی بۆ دیاریکردنی چارەنووسی خۆی سازبدات، بەشێوەیەک که دەنگی بگاتە نێوەندە نێودەوڵەتییەکان.

لێرە دەپرسین کورد چ عێراقێکی دەوێت، ئایا عێراقێکی بەهێز و توانادار، خزمەتی دوارۆژی کورد دەکات؟ ئایا له حاڵەتی کۆنترۆلکردنی دەسەڵات له لایەن گرۆپ و لایەنێکەوە هەمان رووداوەکانی رابردوو دووبارە نابنەوە؟ ئایا دەوڵەتەکانی دراوسێی عێراق ئامادەنە مامەڵە لەگەڵ عێراقێکی لاوازی دیموکراتی، دەسەڵات تێدا دابەشکراو بەسەر پێکهاتە سەرەکییەکانیدا بکات؟ یانۆی چتۆ دەڕوانینە عێراقێکی بەهێز که دەبێتەوە سەرچاوەی هەڕەشە و نائارامی بۆیان؟ ئایا کورد دەتوانێت له سایەی عێراقێکی لاوازی هەمیشە هەڕەشە لێکراو، ئەم دەسکەوتانە بپارێزێت که هەنوکە به دەستیان دەهێنێت؟ له بیرمان نەچێت هەندێک لایەنی وەکی تورکیا ئەگە ر بۆی بچێتەسەر دەیەوێت لاوازی عێراق بۆ لێدانی کورد و سنوردانان بۆ هەنگاوەکانی بقۆزێتەوە.

من لام وایە کورد له نێوان دوو جەمسەری هەمیشە مەترسیدار دەمێنێتەوە، وەلێ کاری سەرەکی کورد چەسپاندنی بنەماکانی دیموکراتییەتە که کورد و شیعە به پلەی سەرەکی ئارەزووی بەکارهێنانیان له قۆناغی هەنوکەدا لا گرینگە. من وای دەبینم کورد پێویستە کار بۆ دروستکرنی عێراقێکی بەهێزی دیکتاتۆر و ملهوڕ نەکات. واتە کورد به راشکاوی خۆی نەخاتە ژێر بەرپرسیتی پێکهێنانی دەسەڵاتێکی دیکتاتۆری تاکڕەوانە له ئایندەدا، وەکو له ساڵانی رابردوودا لایەنی خۆسەپێنی عەرەبی به مەبەستی پتەوکردنی دەسەڵاتیان بۆ ماوەیەک مەراییان لەگەڵ کورد دەکرد و دوای پەیداکردنی هێزیش پەلاماری کورد و لایەنە دیموکراتییەکانیان داوە.

کورد له قۆناغی هەنوکەدا تەنیا پرسی پێناکرێت بەڵکە رۆڵی سەرەکی و راستەوخۆش له پێکهێنان ودارشتنەوەی دەستور و عێراقێکی نوێ دەگێڕێت.

من لام وایە عێراقی دیموکراتی لیبرال و فیدرال له کاتی ئێستادا چاکترین شتە بۆ بەیەکەوە ژیان، دیموکراتی بوون مانای خۆبەدەستەوەدان و وازلێهێنانی مافە سەرەکییەکان ناگەێنێت، به پێچەوانە دەبێت بکرێتە بنەمای لێکگەیشتن و کارکردن بۆ زەمینە خۆشکردن بۆ داننان بەیەکتر و یەکتر قبوڵکردن. وای دەبینم کورد نابێت کار بۆ بەهێزکردنەوەی عێراق بۆ دروستکرنەوەی خۆسەپێنی لایەنێک یاخود تەنیا گرووپێک بکات، بەڵکە دەبێت هە ردەم کاربۆ بە هێزکردنی لایەنی دیموکراتی بکات. کورد دەبێت له ئایندەدا هەر بە تەنیا دیموکراتیەت له بەشی عێراقی عەرەبی بەهێز و دەسەڵاتدار نەکات، بەڵکە له کوردستانیشدا بنەمایەکی نوێ بۆ پەرەپێدانی دیموکراسیەت بدۆزێتەوە. کورد دروشمی دیمکراتییەکی بەهێز و چەسپاو بکاتە ئامانجی کارەکانی، دەسەڵاتێکی دەستوری و یاسایی بکاتە ئامانجی خۆی له پێکهێنانەوەی عێراقدا، نەک عێراقێکی بەهێز و دیکتاتۆر که دەبێتە مایەی هەڕەشە بۆ ناوەخۆ و دەر و دراوسێش.

بەڵام له بیرمان نەچێت هەندێک لایەنی عەرەبی و ئیسلامی بە شێوەیەکی سەرەکی له دیموکراتی بوونی عێراقیش دەترسێن، ئەوەتەلەکۆبوونەوەی لوتکەی وڵاتانی عەرەبی له جەزائیر ناچار بوونە بۆ رەواندنەوە و دڵنیاکردنەوەی ئەم لایەنانە بڵێن عێراق دیموکراسیەتی خۆی رەوانەی هیچ وڵاتێکی دەرو دراوسێ ناکات و عێراق نابێتە سەرچاوەی هەناردنە دەرەوەی گۆڕانکاری و ئامانجەکانی. به بۆچوونی من بەمەش کورد دەبێت وەکو هەمیشە به وریایی کار بۆ چەسپاندنی دیموکراتیەت بکات، چونکە له کردەوەدا تەنیا کوردە داوای به دیهێنانی دیموکراتیەتێکی راستەقینە و بەکردەوە دەکات، کە هەر تەنێ کوردە له کاتی بەرێوەچوونی دیموکراسیەتێکی بەهێز له عێراقدا رووبەڕووی وەڵام دەبێتەوە بەتایبەتی کە هەندێک هەنگاوەکانی عێراق بەرەو دیموکراتی بوون به سەرچاوەی گۆڕانکاری ناوەخۆیی له هەندێک وڵاتی عەرەبی و ئیسلامی حیساب دەکەن. دیسان دەپرسین کورد دەبێت چتۆ عێراقێکی بوێت و چتۆ کارێک بۆ بە هێزکردنی دیموکراسیەت بکات؟. لەلایەک بەهێزکردنەوەی عێراق دەبێتە سەرچاوەی هەڕەشە بۆ دروستکردنەوەی دیکتاتۆریەت و خۆسەپێنی یەکلایەنە و له لایەکی تریشدا هەیانە دیموکراتیەتێکی پتەو به کردەوە له ئایندەدا به سەرچاوەی هەڕەشە دەزانن و ترسەکانیشیان له هەڵایسانی دیموکراسیەت ناشارنەوە. کە بڕوای من هەندێک لایەنی دیکتاتۆر و خۆسەپێن و وابەستە به ئیسلامی. توندرۆ دیموکراسیەت زۆر له بوونی دیکتاتۆر و دەسەڵاتێکی عەسکەرتاری وەکو سەدام حوسێن به مەترسیدارتر دەبین. ■■■■

تورکیا له ڕوانگەی زیاتر له پێنج سەد هەزار ئیتالی

هەژار خۆشناو ـ ئیتالیا



یەکێتی ئەورووپا بەخێراییەکی ئەوتۆ روو له گەشەسەندن دایە له هەموو رووێکەوە به تایبەتی له بارێ ئابووری و سیاسی، لەگەڵ مۆر کردنی پەیماننامەی سااڵی رابردوو، ژمارەی ئەندامانی له یانزەوە بوو به بیست و پێنج وڵات، لەگەڵ ئەمەشدا ژمارەی دانیشتووان و رووبەری جوگرافی ئێجگار زیادی کرد، ئەمەش دەبێتە هۆی ئانەوەی چەندین تەگرە له هەموو رووێکەوە، به تایبەتیش کلتوری کەچی دیارە پێشبینی ئەمانە هەمووی کرا بوو. بەڵام ئەوەی بۆتە گرفت لەبەردەم یەکێتی ئەورووپا بوونی تورکیایە به ئەندام لەو یەکێتیە، وەک هەموومان ئاگاداری ئەم گفتوگۆیانەین له نێوان یەکێتیەکە و سەرانی تورک، بەڵام ئەگەر بڕانین کاردانەوەی چۆنە بەسەر تاکێکی ئەورووپی؟، له وەڵام دا پارتی "لیگە نۆرد" ی ئیتالیا هەڵساوە به ئەنجام دانی ڕیفڕیندۆمێک دژ بە هاتنە ناوەوەی تورکیا بۆ یەکێتی ئەورووپا کە له خوارە هۆکانی دەدرکێنین، راستە لەم وڵاتانەی EU دەسەڵات لەدەست گەل دایە، بەڵام هەندێ جار بەرژەوەندییە سیاسی و ئابوورییە بەهێزەکان وا له گەورەکان دەکا مکیاجی مامەڵەکە بکەن و بەڵای خۆیان کێشی کەنەوە، ئیتالیا یەکێکیە له وڵاتە گەورە و بەهێزەکانی جیهان و بوونی هەبووە له زۆرێک رووداودا، ئێستاش پردێکە له نێوان ئەمەریکا و ئەورووپا، هەروەها تاکە وڵاتە له دوای بەریتانیا بەهێزترین هاوپەیمانی بوشە له جەنگی عێراق، ئەمانە هەموو با بڵێین چەند زانیارییەکی سەرەتایین، بەڵام گەورەترین بوسنسی چەک و پێداویستی بەرگری ئیتالیا و تورکیا مێژووی خۆی هەیە و ئابوری بەهێزی ئیتالیایە، بەڵام لەگەڵ ئەوەشدا: با بزانین داواکانی پارت "لیگە نۆرد" چین؟ لەو فۆرمەیاندا کە واژوی بۆ کۆ دەکەنەوە کە ئێستا له پێنج سەد هەزار کەس زیاتر واژوی کردوە: دە هۆ له خۆ دەگرێ کە بۆ نەهاتنە ناوەوەی تورکیا بۆ یەکێتی ئەورووپا، لەوانە "تەوبوونی ئازادی بە پێی راپۆرتێک تورکیا لە یەک سااڵی رابردوو زیاتر لە ٥٥٠.٠٠٠ لێپچینەوەی سیاسی کردوە و خەڵکی سیاسی گرتووە و هتد..." "ڕێز لە بنەکانی مافی مرۆڤ نانێ" "تورکیا بارێ ئابووری زۆر خراپە و ئەمەش بۆ ئەورووپا شۆکە و هەروەها دەبێتە بەرزبوونەوەی رادەی بێکاری بە شێوەیەکی توند" "تورکیا هاوسنووری ئێران و سوریا و عێراق و هتد... کە ئەمەش مەترسیە بۆ سنووری یەکێتیەکە" "تورکیا دەستوری لە شەرعیە وەرگرتووە..." چەندین خاڵی گرینگتریش بۆ تاکی ئەورووپی، بەڵام لە دوای ئەم خاڵانەش نووسراوە " دەتواندرێ پەیوەندیەکان لەگەڵ تورکیا بەهێز بکرێت و لە رووی ئابووری و هتد..." ئەندامانی ئەم پارتە لە پەرلەمانی ئیتالیا هەریەکە و کارتێکیان بەرزکردبۆوە بە گەورەیی لێی نووسراببوو ستۆپ تورکیا، ووتەبێژیکیان لە پەرلەمان گووتی " تورکیا ئیسلامە و ئەورووپا کریستیانە، ئەگەر بڵێن ئیسلامی مۆدێرنیزم: ئەوا ئیسلام هەر ئیسلامە و مۆدێرنیزم بوونی نییە لە ئیسلام" جێگای ئامازە پێکردنە ئەم پارتە زۆر بە توندی دژی هاتنەناوەوەی تورکیایە بۆ EU، هەورەها هاوپەیمانی پارتی دەسەڵات داری ئیتالیا و پێشتیریش گەفی لە سەرۆک حوکمەت دەکرد هاوپەیمانیەکە دەشکێنێ لەسەر گرفتی هەڵبژاردنی یەکێتی ئەورووپا، چونکە بەچێهشتنی ئەم پارتە حوکمەت هەڵدەوەشێتەوە!، بەڵام زۆرێک لە پارتەکانی ئیتالیا هیوا خواست بوون بە دیالۆگ داواکانیان پێشکەش بە پەرلەمان بکەن نەک ستۆپ تورکیا و دەنگ بەرزکردنەوە، کە ئەمەش هەستیاری خۆی هەیە چونکە دژی رانەوەستانەوە بەڵکو داوایان ئەوەبوو کە بە نەرمی بێ. بێگومان تورکیا بەربەستێکی زۆری لەبەردەم دایە بۆ بوون بە ئەندام لە EU، بەڵام ئەوەی پرسیارە ئێمە بیکەین: ئایا تورکیا بۆ بوون بە ئەندام واز لە ئایینی ئیسلام دێنێ؟ کاتێ سەرۆک حوکمەتێکی ئیسلامیان هەڵبژاردوە!، ئایا واز لە لێپچینەوەی سیاسی دێنێ؟ ئایا ڕێز لە بنەکانی مرۆڤایەتی دەگرێ؟ ■■■■

بەهۆی قسەکردن بەزمانی کوردی ١٣ ئەندامی سەرکردایەتی حیزبێکی کوردی رووبەڕووی زیندان دەبنەوە

peyamner - ئاژانسی دەنگوباسی ئەنادۆڵی تورکی رایگەیاند کە ١٣ ئەندامی سەرکردایەتی ئێستای حیزبی ئازادیو ماف **HAK-PAR** بەسەرۆکایەتی عەبدولمەلیک فورات رووبەڕووی ٦مانگ زیندانیکردن بوونەتەوە، دوای داوا لەسەر تۆمارکرانیان لەلایەن دۆزگەری گشتی دادگای باڵای ئەنقەرەوە، بەهۆی قسەکردنیان بەزمانی کوردی لەکۆنگرەی حیزب لەساڵی رابردووداو هەڵنەواسینی ئاڵای تورکیاو وێنەی ئەتاتورک و نەگوتنەوەی سرودی نیشتمانی تورکیاو، وەرگرتنی بروسکەی سەرکردەی حیزبەکانی باشووری کوردستان و بەرزکردنەوەی لافیتەی نووسراو بەزمانی کوردی.

شایانی باسە قسەکردن بێجگە لەزمانی کوردی لەکۆبوونەوە گشتیە سیاسیەکاندا بەپێی یاسای تورکیا ٦ مانگ تا ٢٠ ساڵ زیندانی لەسەرە.

بێسەروشوێنکردنی بنەماڵەیەکی کورد و گرتنی ٤٠ لاوی کورد لەلایەن حکومەتی سوریا

Peyamner-میدیا- رۆژئاوای کوردستان/ هاوکات لەگەڵ لێدوانی باڵیۆزی سوریا لەئەمریکا سەبارەت بەوەی کەتا مانگی تەمووز هیچ زیندانییەکی سیاسی لەزیندانەکانی سوریادا ناهێڵن، گرتنی کەسانی سیاسی و هاوواڵتیانی کورد لەلایەن حکومەتی سوریا لەزیادبووندایە.

لێژنەی سوریی بۆ مافەکانی مرۆف رایگەیاند کەحکومەتی سوریا لەمانگی ئابی ساڵی رابردوودا شەش کەسی بنەماڵەیەکی کوردی ناوچەی دێرک (مالکیە)ی بە تۆمەتی شێواندنی پەیکەری حافز ئەسەد لەدێرک گرتووە و بێ سەروشوێنکردوون و کەسوکاریان هیچ زانیارییەک لەبارەی شوێنی گیران و بارودۆخیان نازانن .

لێژنەکە داوای کرد چارەنووسی ئیسماعیل ئەحمەدی ٦١ ساڵی و سێ کوڕ و دوو ئامۆزاکەی ئاشکرا بکرێ .

لەلایەکی دیکەوە بەهۆی ئەنجامدانی ڕێڕەوپشتنی هەڵگرتنی مۆم لەئێوارەی ڕۆژی ٢٠٠٥/٣/٢٠ لەشاری حەلەب بە بژنەی نەورۆزەوە، هێزەکانی سوریا ٤٠ لاوی کوردیان دەستگیرکرد کە ٧ لەو گیراوانە کچن . هەروەها حیزبی یەکێتی دیموکراتی کورد لەسوریا کە ساڵیکە ئەندامێکی سەرکردایەتیەکەی لەزینداندایە، گیرانی ئەندامێکی دیکەی سەرکردایەتی خۆیانی لەلایەن حکومەتی سوریاوە راگەیاند .

شایانی باسە کە ئەو هەڵمەتی گرتنە هاوکاتە لەگەڵ لێدوانی باڵیۆزی سوریا لەواشنتۆن کە رایگەیاند تاوەکو مانگی تەمووزی ئەمساڵ هەموو زیندانییە سیاسیەکان لەسوریا ئازاد دەکەین و هیچیان لەزیندانداندا ناهێڵین.

بەسەدان کەس لەدژی لەشکرکێشی سوپای تورکیا بوونە قەڵغانی زیندوو

Peyamner- لە گەڵ نزیکبوونەوەی وەرزی گەرما، سوپای تورکیا لە چیای جودی و گاباری باکوری کوردستان و بەمەبەستی پەلاماری سەربازی دەستی بە جموجۆڵێکی لەشکریی بەرفراوان کردووە.

ئاژانسی هەواڵی دیجلە لە باکوری کوردستانەوە رایگەیاند کە بۆ بەرگرتن بەو کردەوە لەشکرییەی سوپای تورکیا و سەقامگیرکەردنی ئاشتی لەناوچەکەدا، گروپێک بەناوی(مەرتالێن زیندی) واتا قەڵغانی زیندوو، کە لە ئەندامانی چەندین گروپ و ڕێکخراوی سیاسی و کۆمەڵایەتی ئاشتیخواز پێک دێن لە ئیستانبۆڵەوە بەرەو چیای جودی بەڕێکەوتوون.

هەر بە پێی هەواڵی ئاژانسەکە، ئەم گرووپە لەسەرەتادا لە ٢٧ کەس بوون و دواتر لە شاری (ئەلە) ٧٠ کەسی دیکەش پێوەندییان پێوەکردن و لەگەڵ ئەواندا کەوتنەڕێ.

هەروەها لە شارەکانی ئادانا، دیلۆک، هاتایش، گرووپێکی دیکە بۆ هەمان مەبەست بەرەو چیای جودی و گابار کەوتوونەتە ڕێ و، دوێنێ شەو لە سەربازگەیەکی ناوچەی ئۆپایلی کە کەتۆتە دووریی ٥٠ کیلۆمەتر لە (جزیرێ) ماونەتەوە.

چاوەڕێ دەکرێ لە شار و شارۆچکەکانی دیکەی باکوری کوردستانیشەوە خەڵکانێکی دیکە بەگەڵ ئەو گرووڵانە بکەون.

میدیای تورکی لە هەواڵەکانی خۆیاندا سەرسوڕمانی خۆیان لەو کردەوەیەی ئەم گرووپانە دەربڕیوە و تەنانەت هەندێک لەوانە بە توانجەوە نووسیویانە کە (باشوری ڕۆژهەڵاتی تورکیا!) بەغدا نییە تا لە پەلاماری ئەمریکا بپارێزرێت.

دادگای ئەوروپا تورکیا سزا دەدات

Peyamner – هەفتەنامەی میدیا - بەهۆی شاردنەوەی زانیارییەکانی ئۆپەراسیۆنێکی سوپایی دژی کوردان، دادگای ئەوروپا تورکیای سزادا.

دادگای مافی مرۆڤی ئەوروپا بەڕەسانی دەولەتی تورکیای بەشاردنەوەی زانیارییەکانی دەربارەی ئۆپەراسیۆنێکی سەربازی لە ساڵی ١٩٩٠دا لەباکووری کوردستان تاوانبار کرد و ئەو هاووڵاتییە کوردانەی کە لەساڵی ١٩٩٣ لەو دادگایە شکایەتیان لەتورکیا کردبوو بەهۆی کۆژرانی چەند کەسێکیان لەو ئۆپەراسیۆنەدا، بەمافدار دانا و سزای قەرەبووکردنەوەی دارایی بەبڕی ١٥٨٤٠٠ یۆرۆ بەسەر تورکیادا سەپاند .

شایانی باسە بەپێی پەیماننامەی مافی مرۆڤی ئەوروپا، ئەگەر لایەنی شکایەتلێکراو زانیاری و بەڵگەنامەی پێویست نەدات و بشارێتەوە، شکایەتکار بەمافدار دادەنرێت.

دوای کۆژرانی کوردێک لە بانە، شارەکە تووشی پشێوی بوو

Peyamner- دوای ئەوەی کوردێک بە دەستی چەکدارێکی هێزی ئینتزامیی ئێران کۆژرا خەڵکی بانە هێرشیان کردە سەر چەکدارە بکوژەکە و برینداریان کرد .

بە پێی هەواڵێک کە ئەمڕۆ لە ماڵپەڕی "بازتاب"ی ئێرانیدا بڵاو بۆتەوە: ئەوکەسەی چەکدارەکە تەقەی لێکردووە قاچاغچی کەلوپەل بووە و لە بازگەیەکی دەوروبەری شاری بانەدا تەقە لە ئۆتۆمبیلەکەی کراوە و کۆژراوە.

بە وتەی ماڵپەڕی "بازتاب" دووسەد کەس لە خزم و کەسوکاری کۆژراوەکە لە بەر دەرکی نەخۆشخانەی سەلاحەدینی بانە بە گڕ چەکدارە بکوژەکەدا چوونەتەوە و بریندارییان کردووە کە دواتر بردوویانەتە نەخۆشخانەی سەقز .

بە گوێرەی هەواڵی ماڵپەڕەکە: سەرەنجام لە لایەن مەئموورانەوە کۆتایی بە پشێوییەکە هێنراوە و کۆررەکە کۆژراوەکە پاشنیوەڕۆی هەمان ڕۆژ بە خاک سپێراوە و فایلی مەئموورەکەش بۆ لێکۆڵینەوە نێردراوەتە"دادسەرای نیزامی" .

ماڵپەڕەکە هەروەها هەواڵی دەستگیرکردنی چوار ئەندامی حزبە "جوداخوازە!"کانی کوردی لە سنووری سەردەشت راگەیاندووە بە بێ ئەوەی ئاماژە بە ناوەکانیان یا ناونیشانی حزبەکانیان بکات.

موقتەدا سەدر: دەبێ کورد دەست لە داواکردنی کەرکوک هەڵبگرن

peyamner- موقتەدا سەدر لە بەیاننامەیەکدا داوای لە کورد کردووە کە دەست لە داواکردنی کەرکووک هەڵبگرن، چونکە ئەگەر کورد لەسەر ئەو داوایە بەردەوام بن کە کەرکووک بخرێتە سەر کوردستان ئەوە یەکپارچەیی عێراق دەکەوێتە بەر مەترسی. بەگوێرەی ئەو بەیاننامەیە کە لە ڕادیۆیی عێراقی ئازادەوە باڵوکراوەتەوە موقتەدا سەدر ڕایگەیاندووە: ئەگەر کورد خۆیان بەعێراقی دەزانن چ پێویست دەکات داوای کەرکووک بکەن، ئەو داوایەی ئەوان زیان بە یەکپارچەیی عێراق و (یەکێتی نەتەوەیی!) عێراق دەگەیەنێت و ڕێگە بۆ پارچە پارچەکردنی عێراق خۆش دەکات.

هەروەها موقتەدا سەدر لە بەیاننامەکەیدا دەڵێ: داوا لە کورد دەکەم هەوڵ نەدەن کەرکووک بخەنە ژێر دەسەلاتی خۆیان و هەوڵبستی خۆیان بگۆڕن، چونکە پارچە پارچەکردنی عێراق بەر لە هەموو لایەک زیان بە کورد دەگەیەنێ و کاردانەوە خراپەکانی بۆ کورد دەگەڕێتەوە. جێی وەبیر هێنانەوەیە هەفتەی ڕابردوو موقتەدا سەدر بە نوێنەرایەتیی خۆی شاندێکی نارد لای سەرکردایەتیی کورد و داوای لە کورد کرد پشتگیریی لە گروپەکەی ئەو بکەن تا چیتر لەلایەن ئیئتیلافی شیعەوە پشتگوێ نەخرێت، هەروەها گەیی ئەوەی کردبوو کە لەئیئتیلافی شیعەدا تەنها ئەنجوومەنی باڵای شۆڕشی ئیسلامی و حزبی دەعوە خاوەن بڕیارن و حساب بۆ لایەنەکانی دیکە ناکەن، بۆ ئەوەش داوایان کردبوو سەرکردایەتی کورد میانگیریی بکەن و دەرفەتی بەشداربوون بۆ گروپی سەدر بڕەخسێنن، لەبەرامبەر ئەوەشدا گروپی سەدر پشتیوانی لە جێبەجێ کردنی تەواوی مادەی ٥٨ دەکەن، بڕیە ئەو هەڵوێستەی ئێستای موقتەدا سەدر و هۆشداری دان بە کورد کە دەست لە کەرکووک هەڵبگرێ پارچەکردنی عێراق بەر لە هەموو لایەک بادانەوەیەکی سەیری دیکەی موقتەدایە.

کۆمپانیایەکی ئەمریکی بەنیازی کردنەوەی ناوەندێکی ڕاهێنان و مەشقپێکردنی کادری وەزارەتەکانە لەکوردستاندا

PUKmedia- ڕاگەیاندنی ئەنجومەنی وەزیران

بەڕێز عومەر فەتاح سەرۆکی حکومەتی هەرێمی کوردستان, بەئامادەبوونی بەڕێزان د.محەمەد خۆشناو وەزیری تەندروستی و دکتۆرە ئەختەر نەجمەدین وەزیری خوێندنی باڵا, پێشوازیکرد لەبەڕێز مارک فریمان ڕاوێژکاری کۆمپانیای ئایفن هوی ئەمریکی و وەزارەتی دەرەوەی ئەمریکا. مەبەستی سەردانەکەی مارک فریمان بۆ کوردستان, دامەزراندنی ناوەندێکی گەورەی ڕاهێنان و مەشقپێکردنە لەکوردستاندا, بەناوی (ناشنال ترینت سێنتەر). ئەم ناوەندە, تایبەتە بەگشت وەزارەتە پەیوەندیدارەکان بۆ پێگەیاندنی کادیرو خەڵکی شارەزا لەبوارە جیاجیاکاندا لەسەر ئاستێکی نوێتر شێوازی زانستییانە.

سەرۆکی حکومەت, خۆشحاڵیی خۆی دەربڕی بۆ ئەم ناوەندە گرنگەو بەپێتی هەموو هاوکاری و پشتیوانییەکی پێدان و داواشی لێکردن هەرچی زووە تەنسیق بکەن لەگەڵ سەرجەم وەزارەتەکانی حکومەتی هەرێمی کوردستان, بۆ دانانی بەرنامەو پلانی گونجاو بەدیاریکردنی نوێنەر بۆ هەریەکەیان. لەبەرامبەردا, وەفدی میوان سوپاس وخۆشحاڵیی خۆیان دەربڕی بەرامبەر سەقامگیرکردنی ئەمن و ئاسایش, کە لەکوردستاندا بەرقەرارە.

دەیلی ستار: کورد و تورکیا پێویستیان بەیەکتری هەیە

Peyamner – ڕۆژنامەی دەیلی ستار لە ڕاپۆرتێکیدا لە نووسینی هیوا مەحمود عوسمان پەیوەندییەکانی تورکیا و کوردستان و سەرۆکایەتی بەڕێز تالەبانی لە عێراق هەڵەدەسەنگێنێت. لە ڕاپۆرتەکەدا هاتووە کە تورکیا لە کاتی پێکهێنانی حکومەتی نوێی عێراقی هەواڵ خۆش و ناخۆشی پێدەگات؛ هەواڵی خۆش ئەوەیە کە جەلال تالەبانی کە دۆستێکی دێرینی تورکیایە و ئاگاداری گرنگیی تورکیایە لە ڕۆژهەڵاتی ناوەڕاستدا, دەبێتە سەرۆک کۆماری عێراق و, هەواڵە ناخۆشەکەش ئەوەیە کە تالەبانی وەکو کوردێک ناتوانێت بەرامبەر بە پێوەندییە گشتیەکانی کورد و تورک و عێراق کارێکی گرنگ ئەنجام بدات.

لە ڕاپۆرتەکەدا باس لە هەڵوێستی تورکیا کراوە و هاتووە کە لەم دواییەدا, حکومەتی ئانکارا ڕایگەیاند کورد بەردەوامن لە سەرکوتکردنی تورکمان و بەکوردکردنی ئەو شارە و, ئەوەش لەکاتێکدایە کە کورد نکولی لەوە دەکەن و کە هەڵمەتێکی وایان ئەنجام دابێت. ئەمە بەنسبەت ئانکارا مەترسییەکی گەورەیە.

ئینجا دێتە سەر دەرخستنی هەڵوێستی کورد و دەڵێ:" بۆ کوردی عێراق کەرکوک شارێکی کوردستانییەو تایبەتمەندیی کوردیی هەیە, ئەوەش بە مانای ئەوە نیە کە کەرکوک تەنها شارێکی کوردییە بەڵکو شارێکە لە پێکهاتەی کورد,تورکمان, عەرەب وئاشوری. کەرکوک شارێکە کە نمونەی وێرانی ,جیاوازی , دەرکردن و تەعریبە و ئێستاش ڕۆڵێکی گەورە لە پێکهێنانی حکومەتی نوێی عێراقدا دەبینێت.خەڵکی کەرکوک لەو هەڵبژاردنانەی ئەم دواییەدا ڕۆڵێکی گەورەیان بینی."

لە شوێنێکی دیکەی ڕاپۆرتەکەدا هاتووە کە دەبێ تورکیا دڵنیایی بدا بە کورد و حکومەتی داهاتووی عێراق کە دەست لە کاروباری نێوخۆیی عێراق وەرنەدات و هاوکار بێت بۆ بنیادنانی عێراقێکی دیموکرات وپارمەتیی ئاشتی وهێمنی وسەقامگیری لە عێراق بە تایبەتی لە سنورەکانی هاوبەشی بدات . لە جیاتی ئەوەی کە ئاژاوە بنێتەوە و لایەنگیری لە بەرەی تورکمانی بکات , هاوکاری حکومەتی هەرێمی کوردستان بکات بۆ چەسپاندنی یاسا ودەستوورێک کە بەرگری لە مافی مرۆڤ و بەرابەری و ئازادیەکانی ناوخۆیی ومەدەنییەکان بکات."

هەورەها لە ڕاپۆرتەکەدا هاتووە کە دانانی سەرۆک کۆمارێکی کورد و بەشداریی کورد لە پرۆسەی سیاسیی عێراق نابێ ببێتە مایەی نیگەرانیی تورکیا و بە پێچەوانەوە دەبێ تورکیا لەوە خۆشحاڵ بێت.

لە کۆتایشدا ئاماژە بەوە کراوە کە کورد دەبنە دراوسێیەکی باشی تورکیا لەو ڕووەوە کە کورد هێزێکی دژە تیرۆرن لە ناوچەکەدا.

فاینانشنال تایمز: پرۆسەی ئاوەدانکردنەوە لە عێراق سەرکەوتوو نەبووە

peyamner- ڕۆژنامەی فاینانشنال تایمز ڕایگەیاند کە ڕاوێژکارەکانی دەزگای هەواڵگریی ئەمریکا **CIA** خەریکی نەخشەکێشانن بۆ ئەو وڵاتانەی کە ئاژارمن و پێویستیان بەدەستێوەردانی ئەمریکا هەیە. لەڕاپۆرتەکەدا هاتووە کە بەرپرسانی **CIA** دەبێ هەرشەش مانگ جارێک پرۆسەکانی ئاوەدانکردنەوەی ئەو وڵاتانە بەسەر بکەنەوە. بەرپرسی نوێی ئۆفیسی بەدواداچونی پرۆسەکانی ئاوەدانکردنەوەی سەر بەوەزارەتی دەرەوە دانی بەوەداناوە کە پرۆسەی ئاوەدانکردنەوە لە عێراق سەرکەوتوو نەبووە، بۆیە پێویستیان بەدارشتنی ستراتیژیەتێکی ڕوون هەیە. ڕاوێژکارانی حکومەتی ئیستای ئەمریکا ڕوونیان کردۆتەوە کە گفتوگۆکانی ناو حکومەت بۆ ئەوە دەچن کە ڕێگەچارەی سەربازی بەرامبەر بەرنامەی چەکی ئەتۆمیی ئێران لا بدرێت و کار بۆ گۆڕینی ڕژێم لەناوەوەی ئێران بکرێت.

پرسەنامە

بەڕێزان کۆچی دوایی پێشمەرگەی دێرینی شۆڕشەکانی بارزان و کۆماری کوردستان و شۆڕشی ئەیلولی مەزن و شۆڕشی گوڵان شێخ محەمەد خالد بارزانی, هەفتەنامەی پەیامی کورد پرسە و سەرخۆشی لە بەڕێز مەسعود بارزانی دەکات و لە خوای گەورە داواکارە کە بە بەهەشتی بەرینی شاد بکاتەوە, إنا لله و إنا إليه لراجعون.

بەناوی ستافی هەفتەنامەی پەیامی کوردەوە پرسە وسەرخۆشی خۆمان ئاراستەی هاوکارمان برای بەڕێز کاک "کامەران ئەحمەد سلێمان" دەکەین, بەبۆنەی کۆچی دوایی خوالێخۆشبوو (فیان عەبدولڕەحمان)ای هاوسەرەیەوە, لەخوای گەورە داواکارین ئارامی و ئاسوودەیی بە کەسوکاری خوالێخۆشبوو و کاک کامەران ببەخشێن و خوالێخۆشبوو بەبەهەشتی بەرین شادبکات.

ستافی پەیامی کورد

سوپاس و پێزانین

بە ناوی کەسوکار و خانەوادەی خوالێخۆش بوو(خاتوزین عەبدولڕەحمان)ەوە سوپاس گوزاری خۆمان پێشکەش بەنوێنەرانی هەموو ئەو پارت و کۆمەڵە و ڕێکخراو و ستافی ڕۆژنامە کوردییەکان و ئەو خوشک و برا بەڕێزانە دەکەین, کە لە ناوەوە و دەرەوەی وڵات ئامادەی مەراسیمی پرسەی خوالێخۆشبوو بوون, یان بە نامە , ئیمەیل , فاکس و تەلەفۆن بەسەریان کردینەوە.

سوپاسی تێکڕای ئەو بەڕێزانە دەکەین کە, هاوبەشی ئەم کۆستە گرانەیان کردووین, خوا سەبووری هەموو لایەک بداتەوە, داواکارین لە خوای گەورە, لە ناخۆشی و مەینەتی ناوەخت بە دوور بن, هەر سەرفراز و سەرکەوتوو بن.

کامەران ئەحمەد سلێمان و فیان عەبدولڕەحمان

Impressum
خاوەنی ڕۆژنامە
Peyama Kurd Verlag
Peyama Kurd
Thomas–Mann–Str. 22
53111 Bonn / Germany
Fon: +49 (0228) 18 00 654
+49 (0228) 18 00 655
Fax: +49 (0228) 18 00 656
www.peyama–kurd.com
info@peyama–kurd.com
ژمارە تەلەفۆنی ئاپۆنە
+49 (0228) 41 02 801
دەستەی نووسەران
کرمانجی ژێدی:
دانا عەلی، فینوس فایەق، زەکەن عەزیز، نزار جاف، جوتیار دارفرۆش، مەنسور سیدقی
سۆرانی
کرمانجی ژوری:
فادل ئەرجیلیک، سیروان حاجی بەرکۆ، سلێمان ئالیخانی، ز. بیرکەمال
کرێی (ژاژاکی) :
سەیدخان کۆرۆ
پەیامی کورد بە مافی خۆی دەزانێ کە ئەو بابەتانەی بێی دەگات کورت بکاتەوە و لە بازی ڕێزمان ڕاستیان کاتەوە و بابەتی بڵاوکراوە لە شۆنێتر چاپ نەکات.
پەیامی کورد ئازادە ئەو بابەتانەی کە بڵاو و هێزشی نابەجێی تیدایە بڵاو نەکاتەوە.

پەیامی کورد

ژمارە ٣٠ (ساڵی یەکەم) | رۆژنامەیەکی هەفتانەی گشتییە | ٢٠٠٥/٤/١

لە ساڵیادی لەسێدارەدانی پێشەوای کورد قازی محەمەد

سڵاو لە هەڵوێستی جوامێرانەت ئەی پێشەوا

لاپەڕەی ٣

بە پێی یاسایەک لە کۆنگرێسی ئەمریکا

رژێمی سوریا بەرەوە رووخان دەچێت!

- سوریا هەڕەشە لە بەرژەوەندییەکانی ئاسایشی نەتەوەیی وڵاتەیەکگرتووەکانی ئەمریکا و ئاشتی جیهانی دەکات.
- سوریا دەبێت:

چەکە بایلۆجی و کیمیایی و ئەتۆمییەکان نەهێڵێ و پابەند بێت بە نەهێشتنی بڵاوبوونەوەیان.
مافی مرۆڤ جێبەجێ بکات و بەرگری لە مافی مرۆڤ و مافە مەدەنییەکان بکات.



هەفتەی رابردوو بەرپرسەکانی ئەمریکا لەگەڵ هەندێ لە نەیارانی رژێمی سوریا کۆبوونەوە، بۆ تاو وتوێکردنی چۆنییەتی ڕووخاندنی رژێمی سوریا و کاریگەرییەکانی ئەو ڕووخاندنە لەسەر خۆرهەڵاتی ناوەڕاست. لیژنەکانی کۆنگرێسی ئەمریکا ئێستا خەریکی لێکۆڵینەوە و دارشتنی یاسایەکن بەناوی "یاسای رزگارکردنی سوریا و لوبنان". ئەم یاسایە ڕەشنووسێکی هەموارکراوە لە یاسای رزگارکردنی عێراق. بە گوێرەی ڕۆژنامەی " الشرق الاوسط" کە لە لەندەن دەردەچێت، دەقی پڕۆژەکەی بە وەرگێڕدراوی لە ڕۆژی ٢٠٠٥/٣/٢٩ دا باڵاوکردۆتەوە. ئەم یاسایەش ڕێگە بە سەرۆکی وڵاتە یەکگرتووەکانی ئەمریکا دەدات کە یارمەتی ئەو کەس و ڕێکخراوە نا حکومییانە بدات بە ئامانجی گەشتن بە دیموکراتییەت و هەڵبژاردنی ئازاد و دانپیانراو لە لایەن کۆمەڵگای نێودەوڵەتی لە سوریا و گێڕانەوەی دیموکراتی و سەروەری بۆ لوبنان. ئەمەش وەرگێڕدراوی دەقی پڕۆژەکەیە کە قابیلی هەموارکردنە:

خولی یەکەمی کۆنگرێس ژمارە ١٠٩
ژمارەی یاسا: ١١٤١
ئەنجوومەنی نوێنەران
بەشی یەکەم:

بەهێزکردنی سزاکانی نێودەوڵەتی دژی سوریا

- بڕگەی ١٠١:

ڕاگەیاندنی سیاسەت "وەک سیاسەتی گۆڕانکاری"

کۆنگرێسی ئەمریکی ئەمە ڕادەگەیەنێ:

١- حکومەتی کۆماری عەرەبی سوری هەڕەشە لە بەرژەوەندییەکانی ئاسایشی نەتەوەیی وڵاتەیەکگرتووەکانی ئەمریکا و ئاشتی جیهانی دەکات بەم کردەوانەی وەک: لایەنگری تیرۆر، پەرەپێدانی موشەکی دوورهاوێژ و بەرنامە و تواناکانی چەکی کۆکوژ، بەردەوامبوونی لەسەر داگیرکردنی لوبنان کە ئەمەش دژایەتیکردنی پاپەندییە نێودەوڵەتییەکانە، یارمەتی و ئاسانکاری بۆ هەموو چالاکی یە تیرۆریستییەکانی ناو عێراق، پێشێلکردنێکی بەردەوام و نائاسایی مافی مرۆڤی هەردوو گەلی سوری و لوبنانی.

٢- سیاسەتی وڵاتەیەکگرتووەکانی ئەمریکا ئەوەیە نەهێڵێت سوریا ئەم کارانە بکات:

أ. یارمەتی دارایی و لەخۆگرتن و هەرجۆرە یارمەتییەکی ڕێکخراوە تیرۆریستییەکان.

ب - پەرەپێدانی چەکی بایلۆجی و کیمیای و ئەتۆمی و موشەکەکانی بالیستی دوورهاوێژ.

ج - بەردەوامبوونی داگیرکردنی لوبنان و دەستێوەردانی لە کاروباری حکومەتی لوبنان بە جۆرێ کە دژایەتی بریارەکانی ئەنجوومەنی ئاسایشی نێودەوڵەتی (٤٢٥ی سالی ١٩٧٨، ٤٢٦ی سالی ١٩٧٨، ٥٢٠ی سالی ١٩٨٢، ١٥٥٩ی سالی ٢٠٠٤)ە هەروەها پابەندییەکانی تری پەیوەندیدار.

د - بەردەوامی چەوساندنەوەی گەلی سوریا.

٣. پێویستە سەرۆک کۆمار داوا بکات هەروەها نوێنەری هەمیشەیی ئەمریکا لە نەتەوە یەکگرتووەکان ئاراستە بکات بۆ ئەوەی داوا لە ئەنجوومەنی ئاسایش بکات کە گەمارۆیەکی جیهانی بسەپێنرێت بەسەر حکومەتی سوریادا، بە گوێرەی برگەی ٤١ی بەڵێننامەکانی نەتەوە یەکگرتووەکان.

٤- یارمەتییەکانی وڵاتە یەکگرتووەکانی ئەمریکا دەبێت پەیوەندی بە یارمەتی خودی ئەو دەوڵەتەوە کە ئایا ڕاستەوخۆ یان ناڕاستەوخۆ، یارمەتی پەرەپێدانی تواناکانی سوریا دەدات بۆ چەکی بایلۆجی و کیمیایی و ئەتۆمی، هەروەها بەرنامەی موشەکە بالیستییە دوورهاوێژەکان، یان یارمەتیدانی کارپێکردنی دامەزراوی ئەتۆمی لە سوریا.

بۆ لاپەڕەی ٧

غازی حەسەن - ئەمریکا

کامە عێراق ؟؟

- سەرکردایەتی سیاسی کورد ئەگەر لە ژێر کاریگەری ڕووداوەکانی دەرەوەش بووبێت هەمیشە کاری بۆ چەسپاندنی دڕوشمی دیموکراسی کردووە

لاپەڕەی ٢

کەمال ڕەئوف هەنجیرە - ئەڵمانیا

پێشمەرگە

- پیرۆزی وشەی پێشمەرگە و ئەرکەکانی، لە ئاستێکی هێندە پیرۆز و سەختدایە، پێویستی بە جۆرەها باس و لێکۆڵینەوەی فرە لایەن و سەردەمی تایبەت هەیە

لاپەڕەی ٦

دکتۆر ئەکرەم نەسان

- بەهرەیەک و خێرخوازێکی کورد لە پێناو کاری مرۆڤایەتی لە کوردستان و جیهاندا

لاپەڕەی ٤

سەلاح عەبدوڵڵا ڕەمەزان

پاڵەوانێکی کورد لە چەند دێڕێکدا

لاپەڕەی ١٣

لە یادی چواردەساڵەی کۆڕەوە مەزنەکەدا

کۆڕەو هەرچەند کارەسات بوو بەڵام بەرزترین هەڵوێستی نەتەوەیی بەرجەستە کرد

بە درێژایی مێژوو نەتەوەی کورد هەردەم دووچاری هێرشی دڕندانەی داگیرکران بووە، جا چ ڕاستەوخۆ بۆ داگیرکردنی کوردستان یان لەکاتی تێپەڕبوونی لەشکرە گەورەکانی سەردەمە جیاوازەکاندا بووبێت، لە سەردەمی مەغۆل و تەتەرەوە بگرە تا دەگاتە فتووحاتی ئیسلامی و دواتریش شەڕەکانی نێوان هەردوو دەوڵەتی عوسمانی و سەفەوی. سەدەی بیستەمیش بۆ کورد سەدەی ڕاپەڕین و شۆڕش و هەوڵی خۆرزگارکردن بوو، هەندێک لەو شۆڕشانە بۆ ئامانجی نزیک و خێرا ڕاگەیاندنی دەوڵەت وەکو شۆڕشی شێخ مەحمودی نەمر و قازی پێشەوا، هەندێکی تریش بۆ گەیشتن بە کەمترین مافی نەتەوەیی شۆڕشیان درێژەپێدا، زۆرێش لە ڕۆژەکانی گەلی کورد و سەرکردەو ڕابەرانی بوونە قوربانی. دواترین ڕاپەڕینیش، ڕاپەڕینی گەلی کوردە بوو لە باشوور، کە دوای سووتماککردنی کوردستان و بێسەروشوێنکردنی دەیان هەزار کورد و پەستاندنی ئەوانەی کە مابوون لە ناو سێ پارێزگادا، ئەمە جگە لە چەوسانەوەی بەردەوام و گرتن و کوشتن و سووکایەتی پێکردن، بڕیە ڕق و کینەی ڕۆڵەکانی خەڵک ببووە گرکانێک و لە هەر ساتێکدا چاوەڕوانی تەقینەوەی لێدەکرا. لە سێ هەفتەی ڕاپەڕیندا تەواوی شار و شارۆچکەکانی کوردستان ئازادکران، خەڵکی هەوای ئازادییان هەڵمژی و جارێکی تر بەخۆیان و مێژووی پڕ کارەساتیاناداچوونەوە. مەخابن زۆری نەبرد بۆ ڕاگرتنی هاوسەنگی هەرێمی، هەڵوێستی هاوپەیمانان بە قازانج و مانەوەی رژێمی فاشستی عێراق شکایەوە. چاوپۆشی کرا لەوەی رژێم چۆن و بە چ شێوازێک باشووری گرتەوە و چی بەسەر خەڵکی باشوور هێنا، بڕیە گەلی کورد زوو هەستی بە مەترسییەکان کرد و نەیهێشت جارێکی تر ئەنفال سەربگرێت، بە کۆڕەوێکی چوارملیۆنی بەرەو سنوورە دەستکردەکان کەوتەڕێ، دڵنیابوو لەوەی کە برا و پشت و هاوخوێنەکانیان؛ لەگەڵیاندا سنوور دەشکێنن و بە هانایانەوە دێن، بێئەوەی چاوڕوان یان مەمنوونی هەڵوێستێک بن لە ئەنجوومەنی ئاسایش و کۆمەڵگای نێودەوڵەتی، لەو کۆڕەوە چەند ملیۆنییەدا هەزاران ژن و منداڵ و پیر و پەککەوتە لە ژێر ڕەهێڵەی باران و سەرمادا گیانیان لەدەستدا، چەندانی تریش کەوتنە کێڵگەی مینەوە کە ڕژێم زیاتر لە ٢٠ ملیۆنی چاندبوو. کۆڕەو ریفراندۆمێکی نەتەوەی کورد بوو، کە ڕژێمی بەعس و عێراقی داگیرکەری ڕەتکردەوە، کۆڕەو هەرچەند کارەسات بوو بەڵام بەرزترین هەڵوێستی نەتەوەیی بەرجەستە کرد، کۆڕەو هەستی مرۆڤایەتی جیهانی بزواند و حکومەتە وێژدان مردووەکانی پێشووی خستە ئەمری واقیع و ناچاربوون بۆ ئەوەی کێشەی کورد لەبەر چاوی جیهاندا زیاتر گەورە نەبێت، دەوڵەتە داگیکەرەکانی ناوچە نەخاتە مەترسییەوە، هەستان بە دامەزراندنی ناوچەی ئارام کە لە ڕاستیدا یەکەمجار نیازیان تەنها کردنەوەی چەند خێوەتگایەک بوو لەسەر سنوور، بەڵام هەر کە کورد زانی جیهانی دەرەوە چاودێری ڕەوشەکەی دەکات زیاتر چوونە پێش و دوای چەند زنجیرە ڕاپەڕینێکی تر، دوژمنیان لە کوردستاندا دەرپەڕاند. لەیادی چواردەساڵەی کۆڕەوی مەزن و پرکارەساتدا، سەری ڕێزو نەوازش بۆ شەهیدانی کۆڕەو و گشت سەهیدانی کوردستان دادەنەوێنین، بە ئومێدی ئەوەی لەمەودوا کۆڕەوی داگیرکەران ببینین.